# Rojbîna Ereb

Rojbîna Ereb

**Edîtor:** Azadê Ararat̂î

**Wergera ji tirkî:** Mihemedê Kemal

**Rûpelsaz**: Rênas Eshed

**Bergsaz**:Brahîm Eshed

**Redaksîyon:** Azadê Ararat̂î, Ameda Dilpak

**Çapa** 2023

weşanên komîteya lêkolîn û zanıstên cıvakî

weşanxaneya şilêr

Qamişlo

www.shiler.info

weshanashiler@gmail.com

civaka.dimokrat@gmail.com

**www.cıvakademokratık.com/kurd/**

# NAVEROK

Tevî Hemû Jîyanan Ev Jîyan Ya Herî Bedew E ....................... 7
Dîyalogên Bi Serokatîyê Ra ................................................ 21
Hûn Dê Bi Nakokîyan Bêtir Mezin Bibin ................................. 32
Nameya Fatma Ozen Ji Serokatîyê Ra ...................................... 39
Serokê Min ................................................................ 39
Serokê Min ................................................................ 39
Serokê Min ................................................................ 42
Serokê Min ................................................................ 43
Ji Bo Hêza YAJK û Ji Bo Tevahî Jinên Ji Bo Azadîya Wê Têdikoşin ................................................................ 45
Ji Tevahî Hevalên Mêr Ra ................................................ 48
Ji Tevahî Hevalên Min Yên Jin Ra ........................................ 49
Ji Hemû Endamên Artêşê Ra ............................................... 50
Ji Hemû Hevalên Partîyê Ra ............................................... 51
Xeta Şehîd Rojbîn Rastîya Jîyanî ya Hevrêtîya Bi Rêbertî Ra Ye ................................................................ 56
Qîrînek Azadîyê Ji Beyrûtê Ta Botanê; Rojbîn Ereb .............. 62
PKKê Bû Nasnameya Wê .................................................. 63
Meşa Wê Ber Bi Azadîyê Ve Ye .......................................... 65
Neketim Kurdîtîyê Ji Ber Ku Ez Kurd Im ............................... 66
Hûn Nikarin Roja Me Tarî Bikin ......................................... 68
Dikeve Nav Yên ku Ji Nû Ve Dîrokê Dinivîsînin ..................... 70
Rêberên Gelan Kulîlkên ku di Dilê Gelan da Şîn Dibin In ..... 72
Afirînerê Mirovatî, Şaristanî, Jîyan û Xwezayê ..................... 108

Dayîka Xaka Pîroz ................................................................. 108
Belê Dayîka Kevnar!.............................................................. 108
Dayîka Pîroz! ........................................................................ 109
Hevaltîya Rast Ya Bi Roja Azadîyê Ra ................................. 116

**Tevî Hemû Jîyanan Ev Jîyan Ya Herî Bedew E**

Em di bin barekî giran da ne. Ji bo ku hûn di bin vê barê hanê da nekevin divê hûn bi hemû hêza xwe li ser xwe rawestin. Esasê pevçûna me, bicih anîna vê hikmê dibe. Ne pêkane ku bi ne fehmkirinê, bi xwe xapandinê yan jî berevajî ketinê û bi nîyeta sûbjektîfê bimeşe. Li gel me  jîyan ji dîyaloga jîyanan pêk tê.  Hûn dizanin ku kesên ji netewên pêşketî kêm dipeyîvin, lê gelekî kar dikin. Lê li gel me gelekî diaxivin, lê karek nayê kirin. Ev yek dibe rastîya derewê. Ev li gel me gelekî bi bandor e. Dema firsendikê bi dest dixînin hema bi awayekî neyînî dixebitînin. Divîyabû ne bi vî rengî bûya. Diviyabû wekî şansekî ku nirxên wisa giranbiha hatune pêşkeş kirin. Divîyabû wisa nêzîk bibe bibêjî; tiştekî gelekî xweş e, em gelekî şanaz in ku em gihandin vê astê. Em karin biaxifin, xewna me bi cih hat, hêvîyek bû vaye kulîlk da.

Helbet, pêkanîna pêwîstîyên gotinê şerekî zor jê ra dibê. Jixwe min çîroka xwe ji we ra vegot. Dîyar e ku ev gelekî bi nirx e. Tê zanîn ku çîrokeka gelekî hêja ye ku nayê jibîrkirin. Lê ev wekî yasaya jîyana we ye ku hûn dê vê tenê wekî çîrokekê nebînin. Ev ji bo we ne çîrokek e, qanûna jîyana we ye. Ji ber ku hûn dikarin şensa mezinbûnan li gorî vê qanûnê bi rengekî serketî bixebitînin. Nebêjin ku em ronî nekirin. Çîrok bi

awayekî balkêş hat şirovekirin. Nebêjin ku çîrok nehat fêhmkirin. Encama ku hûn jê bigrin ew e ku çîrokê bikin jîyanî. Hêdî ev ji çîrokbûnê derdikeve û ji bo me dibe qanûna jîyanê.
Di vê xalê da divê ez xwe hîn zêdetir xwedî berpirsyartî bibînim? Na! Wisa dikarim bibînim: Çîrok biser ket. Ev çîrokek e, ber bi dawîya girtuneka serkeftî ve dihere. Lê ev ne tenê ji bo kesekî ye. Bê guman ev çîrok vediguhere çîrokeka netewî. Jixwe ji bo wê xebat tên meşandin. Ev çîrok vediguhere nivisîna dîroka partîyekê jî. Ev ji bo partî rast e, lê ji bo we ne rast e. Dema hûn bêjin `me jî ew çîrok jîyaye, lewra ji bo me jî derbasdar e` ew şaşî ye. We ev çîrok ne jîyand. Ew çîrok ji bo we ne derbasdar e. Çîroka ku we jîya, çîroka jîyanek cuda ye. Cudahî di navbera çîroka ku we jîya û vê çîrokê da heye. Divê ku hûn encamê jê derbixînin, lê mixabin hûn wê nakin.
Ger ku hûn dê wekî milîtanekî bimînin pêwîst e xwe bidin ber zehmetîyan. Hûn dê bêjin `Te çima ewqasî barekî giran li me barkir`. Ez vî barî li we bar nakim, ew encama biryara we ye ku hûn dixwazin têkevin dîroka mirovahîyê. Ez ji we ra hêsan dikim, bi rastî jî ji we ra rêbertîyê dikim. Divê hûn encama vê biryarê bidin çespandin. Ger dibêjin `an şer an şer` pêwîst e şerkirinê bizanibin. Ger dibêjin `ya serkeftin ya serkeftin` divê

bizanibin çawa serbikevin. Ger dibêjin `ya xweşik bibe ya xweşik bibe` divê zanibî wê çawa çêbibe. Wekî din ti şirove ji vê biryarê ra tune ye. Divê hûn vê yekê baş bizanibin.

Hêvîdarim ku hûn dahûrînên ku di dewrê da hatin kirin bikin bingeh. Ev e karê ku pêwîste were kirin. Çawa hat jîyîn û divê çawa were jîyandin? Pirsên girîng in. Bi vê kesayetê çi dikare were kirin? Di vê jîyanê da hûn hatin rewşeka wisa ku hêdî hûn nikarin wekî berê xwe bidin jîyandin. Ne tenê hûn, gel jî nikare xwe bide jîyankirin. Dijminê me jî nikare wekî berê xwe bide jîyankirin. Faşîzma tirk jî ketîye rewşeka ji me bêtir ku nikare xwe bijîne. Ev yek me çêkir. Noker di rewşeka hîn kembaxtir da ne, ew jî ketune rewşeka nikarin bijîn. Heta dikarin bibêjin ku em hinekî di rewşekê da ne ku hinek bi jîyanê ve girêdayî ne. Lê li ser çi bingehî? Li ser bingehê bibin desthilatdar, bi axaftunekê, li ser bingehê sûdwergirtuneka mezin, li vir gelek gotin hene.

Hûn nikarin bibêjin ku we rewşeka zêde takekesî û zêde awarte jîyaye. Ti kes wekî min awarte nebû. Mînaka vê yekê ji bo îro jî dibe ku ji bo paşerojê jî nabe. Li vir tevahî mirovahî qezenc dike. Di kesayeta netewekê da, di rastîya partîyekê da, mirovahî bi îdîa derdikeve holê. Ya girîng ew e ku bi qasî temsîlkirina mirovahîyê, awarteyîyê dike gelemperî. Wekî ku

çîrok bingehê min e, ne pêkane ku bixwazibim kesek jî nejî. Wê netewek bijî, dibe ku mirovahî bixwaze bijî. Yên di nav partîyê da dê wê gelekî bijîn. Lê ew bi xwe ra barekî giran dide ser milê we.
Gelo ji bo têgihiştinê, hûn dê gelekî zehmetîyê bikêşînin? Dibe ku hûn min dîn bibînin, dibe ku bixwazin min vala derbixînin jî. Dibe ku bixwazin min têxin nava komployekê jî. Dibe ku hûn bixwazin ji min zêdetir jî min bixin pratîkê û dibe ku bixwazin xwe deynin şûna fedaî û bijîn jî. Lê em, gelekî dervayê vê yekê ne. Lê we tevan nêzîkatîya seranser li xwe dît û we derbas kir. Rêbertî tevgera, bi qasî rojanekirina dîrokê, gihandina rojê ji bo dîrokê, rizgarkirina jîyanê ji seranserîyê, dewlemendkirina dil û mejî bi dewlemendîya jîyanê ye. Tê wateya vegotina gelek kesayetan e, nasnameyan e. Bi kurtasî hilweşandina bêwatebûnîyê, bêaqiltîyê û seransertîyê ye. Ger nikaribe qewimandinên di dîrokê da derxîne, bi awayekî rojane derfetên pêkanîna sereke yên jîyana siberojê derbas bike, serokatî nikare xwe pêk bîne û nikare çîrokê wisa bi encam bike.
Em di bin ferzkirina çîrokek weha da ne. Pêwîst e bibin dîrok, pêwîst e wekî nîşaneya siberojê derbikevin pêşberî me, pêwîst e bibin şervan, bibin xatîb, bibin rêxistingerek. Belê; çîrok

ewqasî berfireh e. Bi qasî derketina fermandarên navdar, tirsonek jî wê hebin. Bi qasî derketina welatparêzên qehreman, dê xayin jî derbikevin. Me derdor dewlemend kirîye. Ji ber wê jî dema dixwazin şensa xwe biceribînin, berî her tiştî fêhm bikin, daku şensê we baş be.

Her roj jîyana we bi gotina axxx derbas dibe. Ma ez îşkencekar im? Na! Îşkencekar polîs e. Ma ez sedema binkeftinê me? Na! Ez kesek im ku binkeftinê naynim ser lêvên xwe. Çima wisa dibe? Ev dîyalektîka jîyanê ye, pêdivîyên çîroka netewekê ye. Wekî min got pêşwazîkirina rojê bi awayekî xwe xapandinek herî teng, herî berhewa, herî bêcîddîyet e. Dixwazim we ji wê rizgar bikim. Lê niha di jîyana we da wekî ku hûn ji min ra dibêjin: Me xwe ji dîrokê û pêşerojê qut kir! Di me da li şoreşgertîyê meger, ger karibin rojê xelas bikin yên herî kêfxweşin em. Ev retorîka herî xerab e. Tê wê wateyê ku hêza me nahêle zêdetir bikin. Eger hêza we tune be, jîyana we dê zehmet bibe.

Bi teqezî dixwazin bijîn, tiştên baş dixwazin. Lê bi vê kesayetê, bi vê hewildanê, bi vê hêza têghîştinê, bi vê tengbûnê? Qet nabe! Bi vê tenê xwe dixapînin, hem jî bi navê aqilmendîyê, bi navê min yê herî baş kir … Ger hûn wisa bikin hûn li xwe dikin. Ez gelekî baldar im daku xwe nexapînim. Wekî ku mîna

zarokekî paqijim, dixwazim bibim wekî kalekî dîrokî û xwedî tecrûbe.
Ger nizanibim ku di rêvebirina tevgerek wisa mezin da, şaşîyek herî piçûk û kêmkurtîyek wê çi encamê bide ez wî karî nakim. Ev tişt ji bo we hîn derbasdartir e. Ji ber ku ez hinekî ketime vê deryayê û hinekî avjenîyê hîn bûme. Lê hûn wekî yên ku avjenîyê nizanibin û xwe avêtune nava golê. Em ji we ra carna parêzgên jîyanê diavêjin, ger karibin bigirin, hûn dikarin xwe rizgar bikin.  Ew çi ne? Di vir da ji bo bicihanîna pêdivîyên tiştên tên gotune, nîşandana wê hêzê ye. Derfetên rêxistinê ne, terzê jîyana şervantîyê ye, hêza sererastkirina kesayetî ye. Ew parêzgên jîyanê ne û ji bo we têne pêşkêş kirin. Ger bigirin hûn dê rizgar bibin, negirin hûn dê bifetisin. Bi ax û waxê ev kar nayê meşandin. Wekî we dît di dema borî da me hin grûp oxir kirin. Yên dimînin jî hene, yên direvin jî hene. Lê yên digihîjin axa pîroz jî wê hebin. Em hevrêyan dişînin ber bi hemû alîyan ve. Lê dîsa çavên me li pey wan dimîne. Gelo yên çûne wê serkeftî bin, wê di kû da şaşîyê bikin? Mirov ji fikarên ku wê di kûderê da kêmasîyan bikin xelas nabe. Ev tişt ji bo we hemûyan derbasdar e. Bi tu tiştî hûn ne di ewlehîyê da ne, hûn nikarin pişta xwe bidin tiştekî. Her tişt wekî ku xîyanetê dike dîyar dike, wekî ku her tişt ji dest diçe xuya dike. Lê her tişt

divêt bi xurtî were hemêzkirin emir dike. Ev bi xwe dîyalektîka jîyanê îfade dike. Divêt hûn vî tiştî fêhm bikin, ez dibêjim wekî din tu çareya we nîne. Rewşa we hin tiştên sosret tîne bîra min. Naxwazim bibêjim, dê şerm be. Di hin pirtûkan da pir derbas dibe. Qanûnên tên ferz kirin hene di demên dîrokê da, di hin klasîkan da. Gotinên wekî ku nebe nabê tên vegotin, şer tên destpêkirin, ruh têne veguherandin, sîstemên ramanê tên avakirin. Jixwe em di demek wisa ra derbas dibin. Hûn wekî dixwazin bi lîstikên hêsan xwe mijûl bikin, wisa bi vî karî pê nayê lîstin! Dibe ku ev kar yekî jêhatî wekî canbazî ku li ser benê navberê her du dîrekan ra dimeşe tê xwestin. Ger bi vî awahî nebe jî, di vê pêvajoyê da em dixwazin wisa bikin. Qanûna jîyanê wiha ji me dixwaze.

Ger hûn dixwazin desthilatdarîya dijmin hilweşînin, divê hûn dawî li bêkesayetîyê, zayîfî, gelekî binkeftî, her roj têkçûnê, her roj rewşên têkçûyîna dijîn biqedînin. Ger daxwaza we ji vê yekê ra xurt e -ti gumana me li ser nîyetên baş yên we nîne- wê demê tenê divêt hûn bêjin çawa bifikirim, çawa pêk bînim dimîne. Rastîya we heye, rêxistin ji we ra hin derfetan pêşkêş dike, divêt vê yekê wekî nirxekî mezin bibînin, di dawî da karê we ye. Ji pirsa çawa hîn bibim? Divêt bersîvek berbiçav were dayîn. Ji pirsên divê çawa bijîm, çawa şer bikim ra jî bersîvên

ez dê wisa bijîm, wisa şer bikim were dayîn. Rêxistinê hinek derfet pêşkêş kirin, yê din jî karê we ye. Hûn nikarin bêjin "Min dixwest pala xwe bidim malbeta xwe, xalê xwe, min bawerî ji selseleta xwe girti bû, an jî kêmasîyên kesayeta min li min ev dan kirin". Ev hemû gotinên vala ne! Tenê xwe xapandina we dide dîyar kirin.

Ger hûn baldar bin, em gelekî ji we hez dikin û qedir didin. Lê rastî gelekî dijwar in. Jixwe rêya hezkirina ji we ra di ferzkirina rastîyan ra derbas dibe. Berevajî wê, dê li gel me jî her tişt ber bêhezkirinê ve biçe. Bi sextekarîyê, bi derewan, bi zivronekîyê pîvanên hezkirinê nayên bi dest xistin. Ew hemû berhemên bêhezkirinîyê ne. Mirovên me gelekî dixwazin hez bikin, lê çima nikarin hezbikin? Gelekî dixwazin bi hûrmet tevbigerin, gotinên gelekî rêzdar dikin, lê tu hûrmet û rêzdarîya wan tune ye. Ji ber ku ew bê naverok in. Bersîveka we ya têkildarî çawanîyê tune ye. Girêdana bi tiştên pûç ra çêdibe. Dema ez li van girêdanên we dinêrim, dikim ji ser hişê xwe herim û bikevim. Hewildanên we ji zanistîyê dûr, ji navarokê dûr in, di pala wan da navarok tune ye! Hêza ku pê îfade bike jî tune ye! Ev hemû di şekil da ma ne, di gotinê da ma ne.

Ger hûn bala xwe bidinê, ez li hemberî wisa nasekinim. Ji mirovekî ra hezkirin, rêzdarî watedar e, ez bawerim dikarim bi

têkildarîyê, bi hevgirtîyê, bi kelecanîyê û bêyî ku bidim poşmankirin nîşan bidim. Çawa ku ez qala nîyeta we ya xerab nakim, kes nabêje ku nîyeta we ya baş nîne. Meseleyeka naverokê ye, meseleyeka xwe binavkirinê ye. Nexwe di nîyeta baş da hûn ji min çêtir in. Gelê me jî gelê herî bi nîyeta baş e, paqij e lê belê gelekî bê navarok e. Em dixwazin wê bişkînin, derbas bikin. Em dixwazin bikin xwedî navarok. Em dixwazin ew nîyeta we ya baş li ser bingehê kesayeteka saxlam deynin. Min ewqasî nekêrhatî, ewqasî vala, ewqasî binkeftî nebînin. Divê girîngîyê bidin vê xalê. Bi awayekî din mirovahî nikare qezenc bike. Olan xwestin vê yekê bi rêya hişyarkirinê bikin, felsefe û zanist di rêya îspatkirinê xwestin vê yekê bikin. Şoreş jî bi rêya xîtabê, bi şerkirinê dixwaze bide qezenckirin. Ez bi hemû hûnera xwe pêşkêş dikim. We dît di me da yên çûne. Ji vir û pê da jî ez dê bidim îspatkirin ku ez ne vala me. Lê divê hûn jî hêdî hêdî nîşan bidin ku hûn jî ne vala ne, xwedî navarok in. Ez wekî zarokekî, wekî we bi kelecan im. Bi we ra ji her lîstikê ra amade me yan jî ji her têkildarîyê ra, her nêzîkatîyê ra amade me, lê em nîqaş bikin. Hûn dizanin ku ez xwedîyê tecrûbeyek mezin im, mirovek xwedî qudret im lazim e li ber çavan wenda nekin. Me hemû alîyên xwe kirine yek. Wekî din

tu rêyên pêşketinê nîne. Madem hûn ji bo pêşketinê hatune, wê demê divêt hûn pêdivîyên wê pêk bînin.

Em ruhê xwe, mejîyê xwe pir vekirî bihêlin. Wekî ku dizanin bi min ra bi awayekî din lîstik çênabe. Ez lîstikvan im. Ger di lîstikê da her tim şaşîyan bikî tu dê wenda bikî. Di şer da jî yek bi ser dikeve yek jî wenda dike. Di rêxistinîyê da jî weha ye, an serbikeve yan wenda bike. Di vir da rêya navîn nîne, pir kêm lîstik bi hev ra wekhev diqedin. Li gel me şensa bi hev ra wekhev mayîn tune ye, em her mecbûrî serkeftinê ne. Lê çawa ser bikeve? Nêzîkatîyeka bêwestan nîşan bidin.

Bi zelalî dibêjim: Ji hemû karan ra baldar dimînim. Kirina vê yekê jî ji min ra ne meseleya serbilindîyê ye. Bûme xwedîyê dewlemendîya maddî û manewî ku karim pir mirovan girê bidim, hîn jî ez weha me. Lê bala xwe bidin, karên min kirine karên afirînerîyê ne, karên ku kêm dikeve rojeva we, bala we. Ez her ber bi karên serkeftinê li kû derê ye, nûbûnî li kû derê ye, tiştên ku li ser werin zêdekirin li kû derê ye dibezim. Gelek kar hene, lê karê ez dikim maka hemû karan e. Ev tê çi wateyê? Nirxandina jîyanê bi rengekî çarbiçar e.

Ger pirs bikim ji wan tevan ra amade ne, giş bi hev ra wê bêjin `belê`. Lê ez bêjim xwedî derketina li sozê bi rastî hûn hene? Hema hema herkes lal, bêziman dibe. Dema dibêje ez ji bo vê

lîstikê amade me û pêdivîyên wê pêk neanîn, tê wateya hîna zara yekem neavîtîye lîstik wenda kirine. Li beramberî zehmetîyan di zar avêtina yekem da dikevin û têne daqurtandin. Di gava pêşîn da wisa dûşeş çêdibe? Ev lîstekek zor e. Bangawazîya cîdîyetê dikim. Ez mezinîya lîstikê tînim bîra we, bang dikim ku hûn bibin lîstokvanekî rasteqîn.

Baldar bin, nebin şov. Lîstikvanekî bîst salî li beramberî me çiqasî lawaz bû derket holê. Nabêjim ku em gelekî pispor in, lê em bi tevahî di jîyana amator da bi cidîyet me çawa xwe da zorîyan. Ev, ji bo lîstikê pêwîst e.

Hûn lîstikê bi awayekî acemî dilîzin. Lîstik serhildêrîyê dixwaze, bêcidîyetîyê qebûl nake. Binêrin Ewropî wisa lîstikê naleyzin, Amerîkî jî wisa lîstikê naleyzin. Li futbolê binêre, li baskêtbolê binêre, di yekê Ewropa ya din Amerîka da … Li tirkan binêrin, ji ber ku lîstika wan jî wekî lîstika we ye, her tim wenda dikin. Ne çanda lîstikê heye, ne cidîyeta lîstikê heye, ne mantiqê lîstikê heye, lê belê awayê herî xerab ya lîstikvanîyê heye. Hem kêfxweşîya wan hem jî xemgînîya wan pir kembax e. Tabî ya we hîn kembaxtir e.

Hûn dibînin ku, sewirandina jîyanê gelekî zehmet e an jî şens jê ra divêt. Divêt hûn jîyanê wekî zarokekî ji nû ve bigirin dest. Bi mezinîya we bawer nakim, bawer nakim ku hûn mezin

bûne. Vê rewşa we naecîbînim. Pir navsal bû, pîr bû, min nepejirandin û min got mezinîya wisa qet nabe. Ji ber wê jî her tim rexneyî nêz bûm û têkoşîn derket holê. Ya rast jî ev bû. Wekî ku hûn xwe mezin dibînin, min jî bawer bikira, min nema pêdivîya mezinahîyek dîtir didît. Dîsa weke ku hûn mezinbûnê fêhm dikin min dîtiba, min nedikarî li ser pîyan bi zehmetî bimama. Weke darek sipîndarê ku gelekî dirêj e, lê di govdê wê da hêz nîne, anku bibama sipîndarek bê hêz. Ev, ne mezinbûna tê xwestin e. Tenê alîyekî we mezin dibe. Porê we sipî dibe, keçelîya we dîyar dibe, hestûyên we derdikevin. Her çiqasî nîşaneyên pîrbûnê nîşan bidin jî ev ne mezinbûne. Ev, tê wateya ku ji jîyanê tiştek fêhm nekirine. Divê em wê derbas bikin.

Ew hemû bi we çi dide hîs kirin? Ev kar karekî cîdî ye, ji nû ve dest pê kirina jîyanê bi dirûstî, peydakirina hêza wê, bi cih anîna pêdivîyên wê ye. Divê em gelekî bi îdîa bin, her li jîyanê weke ku destpêkirinek nû ye em nêz bibin. Ev, tenê bi pejirandina hevrêtîyek bi coş ra pêkan e. Li gorî rêgeza ku hevaltî ji her tiştî bilindtir e, ji xwe ra bingeh bigrin. Ev bi xwe jî di heman demê da, girêdana bi hevalên têkoşînê ra li ser bingehê partîbûyînî, rêxistinbûyînî û rojevkirina têkoşînê çê dibe. Bi gotina weke `min destê xwe danî ser Quranê her tişt

çareser bû` ez ketim nav PKKê qedîya, çê bû` nameşe. Ev, destpêkeka herî dogmatîk e, herî îdîalîst e. Bi teqezî encamê nade.  PKKyîbûna we hinekî tê vê wateyê. Weke dest danîna gel li ser kitabê hûn dest pê dikin. Wiha çê nabe. Mijara gotinê destpêkirina şerekî mezin e. Li gel sondxwarinek mezin, divêt her tiştên şer zanibe û têkeve rê. Dema dibêjin: "Ma min sond xwar, hîna çi ji min dixwazin" dişibe rewşa mûmînên misilman.  Dibêjin: "Min hemû şert û merc pêk anîn, ma min dinya û bihuşt garantî nekir". Li olan binêrin, di musewîtêyê da deh şert, di xiristîyanîyê da çend şert û di îslametîyê da pênc şertên ku derketin, bûn sedema serîhildanên herî mezin di dîrokê da, bûn hegerên geşedanê, îro tenê wekî şikil mane ew şert. A niha di misilmantîyê da wekî pêdivîyên bêwate, weke pêkanîna şertan mane. Ev rê li ber tu pêşketinê venakin. Wer xuya ye ku encama ku em jê derxin, em bi destpêkirina jîyaneka nû ra rû bi rû ne.

Ev pêdivîya mayîndekirina hundir û derveyî têkoşînê ye. Di vê têkoşînê da dê her tim qencî, bedewîbûn û rastî ser bikeve. Ev dê ji rêxistinekê ra kolektîvîzmek bilind bîne. Tu kes nikare xwe pir taybet, pir keyfî ferz bike. Qanûnek wisaye ku xwe bi xwe kontrol dike. Di encamê da ger bighîne sedema

destpêkirinê, bighîne armanca destpêkkirinê wê demê bi ser dikeve.

Careka din, dema ku em dest pê dikin, bi awayekî zelal, bi awayekî vekirî, ez girîngîya mezin a destpêkkirina bi vî awayî pênase dikim û destnîşan dikim. Û hûn dê bikaribin di qadên cuda yên mîsyona xwe da têkoşîna komên ku me ji vir şandine di serî da, dîsa bi destpêkeka weha kûr a pênaseyê, bi barê çi karî dibe bila bibe, geş bikin û hê bilindtir bi dest bixin. Bi hewildana bi israr, ger bê xwestin fikirandin li ser fikirandinê, rêbaz li ser rêbazê pêşxistin, dîyarde û têkilî li kû derê û çawa li beramber we derdikeve bila derkeve çi di rastîya dijmin da, çi di rastîya dostan da, çi di rêxistinîyê da be em dê çareser bikin. Piştra ji ber ku hêza vîna me heye em ferz bikin û di dawî da em dê vî karî bi ser bixin.

Bi vê wateyê em hewldana girêdana hinek ji we bi analîzên dewreya borî ku li vir çêbû bikin, hinek ji we jî wê derbasî nava xebatên cuda bibin. Bawer dikim em dê gotina biryardayînê bidin wan. Ger em nedin dibe ku teng bibin.

**Dîyalogên Bi Serokatîyê Ra**

Serok: Belê heval xwe bide nasîn.

Sewra: Navê min Sewra ye. Sala 1972, li Beyrûtê ji dayîk bûme.

Serok: Hûn çiqasî li Beyrûtê man?

Sewra: Malbata min demek dirêj lê ma, lê ez 4 salan lê mame.

Serok: Malbetek ereb e?

Sewra: Raste serokê min.

Serok: Malbeta we bi temamî ereb e?

Sewra: Belê serokê min.

Serok: Dema ku hûn çûn Îskenderûnê, tu bi erebî diaxifî?

Sewra: Belê serokê min. Piştra fêrî tirkî bûm.

Serok: Wekî me, di dibistanê da, fêrî tirkî bûyî, wisa ye?

Sewra: Raste serokê min.

Serok: Çima hûn çûn Îskenderûnê?

Sewra: Çend sedemên wê hene serokê min. Doza êlî hebû. Wekî din birayê min tevlî RRF bibû. Ji wan rev hebû.

Serok: Bi Îskenderûnê ra, ji berê ve tu têkilîya we tune bû?

Sewra: Na serokê min tune bû. Berê derbasî Mêrdînê bibûn.

Serok: Ji Beyrûtê derbasî Mêrdînê dibin wisa ye?

Sewra: Li wir 6 mehan mane.

Serok: Berîya çend salan çûne Mêrdînê?

Sewra: Li wir gelekî nemane, herî zêde li Beyrût û Surîyeyê mane.

Serok: Li wir çawa û kîjan dem mane?

Sewra: Nizanim serokê min, tenê dizanim li wir mane.

Serok: Xwîndarî hebû?

Sewra: Na serokê min. Herî zêde ji ber sedemên aborî êl di nav xwe da....

Serok: Çi êl e, hîna heye?

Sewra: Belê, lê hinekî jihev ketîye serokê min.

Serok: Bermahîyên wê li Mêrdînê hene?

Sewra: Na serokê min. Zêdetir li Beyrûtê ye.

Serok: Temam. Kengî tevlî PKK bûyî?

Sewra: Ji sala 1993ê, serokê min.

Serok: Çawa tevlê bûyî?

Sewra: Di dibistanê da welatparêzên min nas dikirin hebûn, ji wan bandor bûm. Anku tevlêbûnek hestîyarî dikarim bêjim.

Serok: Ha tevlêbûnek hestîyarî?

Sewar: Belê serokê min. Tu têkilîyê wê bi terzê mezinbûna min ra tune ye. Dikarim bêjim tevlêbûnek bi hestan bû.

Serok: Lê tevlêbûnek bi armanc bû, te digot ez diçim şoreşê?

Sewra: Belê serokê min.

Serok: Anku ne weke pêveka mêrekî tu tevlê bûyî?

Sewra: Na serokê min. Bi gelemperî hevalên min mêr bûn.

Serok: Anku tevlêbûna te îdeolojîk bû?

Sewra: Bi rastî min îdeolojî zêde nas nedikir. Li vir min hinekî fêm kir. Herî zêde li bingehekî hestîyarî, jîyana hevalên pêşeng yên PKKê, şehadetên çêbûne …

Serok: Ha tu dibêjî hestîyarîyek li ser wê bingehê. Yanê li ser girêdana bi kesekî ra. Anku nehatina li pey kesekî?

Sewra: Na serokê min.

Serok: Tu li çîya mayî?

Sewra: Erê serokê min, li Botanê.

Serok: Te tu berpirsyartî girtin?

Sewra: Fermandarîya komê (manga).

Serok: Tu tevlî kongreyê bûyî, pişt ra hatî li vir? Ji bo perwerdeyê bû?

Sewra: Belê serokê min. Dema dihatim vir herî zêde tiştên ku min jîyan kirine, wendakirinên min û qezencên min …

Serok: Lê Sewra herkes tiştên wekî wan dibêjin. Ji bo te tiştekî taybet ku bê gotin, rastîya erebî te çawa daye avakirin. Gelo te çawa daye avakirin?

Sewra: Piştî ku hatim vê qadê, bi awayekî min dît ku bi taybetî jî di xalên destavêtina jîyanê bi awayekî ciddî, lêkolîn û vekolîna jîyanê, kêmasîyên ciddî min di xwe da dîtin. Birastî dema mayîna min, di nava gerîlayan da, wekî tîpekê ku xwe baş dibîne û şirove dike bû. Di rewşekê da ku belê di nava PKKê da ye, lê ji PKKê xerîb ketîye. Min didît ku gelekî ji jîyanê dûr ketime. Li vir min naskirina derbarê felsefeya jîyana nû, bi lêkolîn têrkirina jîyanê dît. Di vir da şêwe, tempo û keda serokatîyê bandor kir.

Serok: Wekî din tu dikarî çi bibêjî?

Sewra: Serokê min, berî Rêbertî ji me ra dîyarkiri bû ku `Hûn nikarin bibin jêderka jîyanê, nikarin mafê jîyanê bistînin` ev gotina wî min di xwe da baş didît.  Min dît ku nebûme jêderka îlhamê.

Serok: Kesayetek vemirî, zêde îlhamê nade!

Sewra: Belê serokê min.

Serok: Wekî din dikarî çi bibêjî?

Sewra: Dema girêdana Rêbertîyê ya netewî û gerdûnî tînim berhev, dikarim bibêjim ku min jî hin gav avêtin.

Serok: Ji ber ku tu ji hawirdorek jêçûyî  hatî û wisa jîyana xwe domandîye.

Sewra: Raste Serokê min.

Serok: Tu ketîye rê ku wan derbas bikî?

Sewra: Ez ketime Serokê min. Dema min fêm kir gavên ku min dixwest biavêjim hebûn, lê nebûn gavên ku hev û du temam bikin. Ji hev qutkirî bûn. Bê bernamebûyînîyek mezin û bêplansazîyek hebû.

Serok: Dîyare ku te gelek hîsên jinên kole anîne vir.

Sewra: Raste Serokê min.

Serok: Hêla te ya analîzkirinê çiqasî xurt e?

Sewra: Dikarim bêjim di hawîra PKKê da û li vir bi awayekî zêde bipêş ket.

Serok: Nûbînî heye?

Sewra: Belê Serokê min. Di gelek xalan da nûbînî heye. Hêdî dizanim çi dixwazim bikim.

Serok: Di şêwedanîna ji jîyanê ra bi kelecan î?

Sewra: Erê Serokê min. Di vir da xalên ku herî zêde zehmetî ji min ra derxistin, dubarebûna di jîyana min da ye. Dema nikarim nûbînîyê çêbikim, dikevim tengahîyek mezin. Hin arasteyên min çêbûn.

Serok: Yanê azwerîya pêşketinê çêbû, lê dema dubarebûn derdiket tu tengav dibû.

Sewra: Erê Serokê min.

Serok: Wekî din xwe çawa hîs dikî? Tu dikarî vî barî hilgirî?

Sewra: Dikarim hilgirim Serokê min.

Serok: Lê nabe ku tu pes bikî. Ev bar ne gelekî giran e?

Sewra: Na Serokê min. Bar giran e, lê gelekî dixwazim hilgirim.

Serok: Tu bixwe bawerî di wan hemû mijaran da?

Sewra: Bi teqezî wê kêmasîyên min derkevin, Serokê min.

Serok: Hêz îdîa û arezûya te çawa ye?

Sewra: Serokê min, ez bi arezû me.

Serok: Reşbînî heye?

Sewra: Na serokê min.

Serok: Gelekî serkeftinê dixwazî?

Sewra: Erê Serokê min, gelekî dixwazim.

Serok: Nîşaneyên ji nû ve zayînê hene?

Sewra: Erê serokê min. Di vê mijarê da, dikarim bêjim ku bi zelalî min dît.

Serok: Em dikarin wekî bûyereka şoreşgerbûna keçeka ereb ji çanda civaka ereb hatîye li te binêrin?

Sewra: Di vê mijarê da ez zelal bûme. Her tim min wekî keçeka kurd dixwest xwe nîşan bidim. Min dixwest ez wisa bim. Ji ber wî jî li ser ereban min tu lêkolîn nekirin.

Serok: Temam, PKKyî bûyîn ne tiştekî xerab e. Lê belê neyê kaşkirin. Erebekî baş divê çawa be, ev pirs jî divê were pirsîn. Lê ya herî girîng pirsa çawa bibim mirovekî baş, divê were pirsîn. Ez ji bo xwe tu carî napirsim kurdekî baş çawa dibe, bi ya min APO tenê mirovekî baş e.

Sewra: Belê ew Rêberekî sosyalîst e jî.

Serok: Ev piştra tê. Ez neketim doza kurdîtîyê. Ji ber ku kurd bûm. Ji bo bibim mirovekî baş ketim vê dozê.

Sewra: Rast e Serokê min.

Serok: Ji bo te bûyîna erebeka baş, tiştekî ku divê tu li ser bifikirî, em lihev bikin hinekî jî bibe kurdeka baş, em bimeşin. Ji bo ku em di nav hev û du da ne. Madem tu dixwazî, di erkdayînê da ger tu herî qadekî ereban wê çawa be? Hem jî tu dê bi rastîya xwe ra rû bi rû bimînî. Hatayê dizanî, li wî alî em dikarin bikin.

Sewra: Berê jî Rêbertî gotibû.

Serok: Wekî qadekî pratîkî wê bifeyde be?

Sewra: Her erka ku partî bide min jê ra amade me Serokê min.

Serok: Tu dixwazî? Hem bibe miroveka baş, hem jî di nav girseya ereban da hinekî din xwe nas bike?

Sewra: Bawer dikim ku ez dê xwe di her qadê da bipêş bixim Serokê min. Xwendekar hene, yên diçin û tên hene …

Serok: Tabî divê bê ku tu bi wan ra têkilîyan dayne. Anku tu dê hinekî bi enîya me ra jî mijûl bibî, dê çawa be? Wekî qadekî erka taktîkî, ji bo te dê bi feyde be?

Sewra: Her cihê  partî lê hebe, ji bo min dibe Serokê min.

Serok: Heman kelecan, heman hest, heman daxwazên veguherînê ne, ne wisa?

Sewra: Erê, Serokê min.

Serok: Wekî din, têkildarî min çi dikarî bibêjî, di vê mijarê da yek du tiştan bibêje, ez mirovekî çawa me? Dîsa hûn dê bibêjin  naşibihe tu mêran!

Sewra: Raste Serokê min. Me hemûyan ew tişt got. Bi qasî ku Rêbertî neşibihe mêrên dîtir, divê hemû ziravîyên wê werin zanîn. Dema ew tişt bi zelalî û baş neyê dîyarkirin piştra …

Serok: Tu dizanî bi min ra lihevkirin pir girîng e.

Sewra: Bêguman serokê min.

Serok: Peymana bi min ra dîsa wisa ye.

Sewra: Pir jî giran e Serokê min.

Serok: Haya te ji vê heye?

Sewra: Erê, serokê min.

Serok: Ji ber ku bi mirovekî nû ra, bi civakek nû ra peyman danîne. Belê zehmetîyên wê hene, lê kelecanê dide, peywirên ku dide ferzkirin hene. Ji vê ra amade yî?

Sewra: Dikarim bibêjim ku ji Serokatîya Partî fêr bûm. Bi tu awahî têkçûnê napejirîne û vîna têkbirinê pir mezin e.

Serok: Bêguman têkçûnê napejirîne, binkeftinê napejirîne. Wekî ku têkçûnê napejirîne, hertim jî serkeftinê dixwaze. Nahêle ku nexweşî, paşdamayînî, hestîyarîbûnî û wekî din gelek lewazî, kêmasî û neyînî di balê ra derbas bibin.

Sewra: Ez dê vê ji xwe ra bikim armanc Serokê min.

Serok: Ji bo karibî wê hêzê nîşan bidî, tu dê rast nêzî xwe bibî, rast bixebitî?

Sewra: Şêwaza Serokatîyê ji xwe ra bikim bingeh û …

Serok: Her ku çû raman û hestên xwe bikî yek û enerjîya xwe baş bixebitînî, ne wisa?

Sewra. Erê, Serokê min.

Serok: Pir zehmet e, lê tu dibêjî ez dê bikim?

Sewra: Erê Serokê min, ne ku ne pêkan e.

Serok: Di heman demê da, tu xwedî azwerî û bi îdîa yî?

Sewra: Erê, serokê min. Xwedî azwerî û biîdîa me.

Serok: Tu dibêjî ev jîyan  rixmî hemû jîyanan ya herî bedew e?

Sewra: Bêguman! Hizra serketinê heye, lê ez dê tu carî dest jê bernedim.

Serok: Wê qutifîn nebe. Fikara serketinê heye, ger hûn hinekî giranîyê li ser xwe têknebin jî hûn dê di şexsê xwe da rê nedin têkçûna erzan.

Sewra: Rast e, Serokê min. Naxwazim carek din bi têkçûnên xwe derkevim pêşberî Serokatîya Partîyê.

Serok: Na, tu bi têkçûnan zêde derneket pêşberî min. Jixwe kesek nikare têkçûnan li min farz bike.

Sewra: Yanî ne farz kirin, lê dema kesayet xwe …

Serok: Dema Rêbertî kesayetekî datîne hember xwe, armanca xwe xala serkeftinê digire. Xala binkeftinê qet napejirîne. Gotina binkeftinê bi xwe napejirîne. Dikare daxwaza hîn zêde hêzbûnîyê bike, ne tenê dema li hember min daxwaza pêşketinê bike, dema min pişta xwe da we jî divê hûn pêkbînin. Xwe nexapînin. Ne tenê li pêş Rêbertî, li pişt Rêbertî jî soz bidin. Tu dê li paş min xurt bimînî, ne wisa? Li ser vê bingehê soz datînin, te pejirand?

Sewra: Min pejirand Serokê min.

Serok: Bes e?

Sewra: Bes e Serokê min.

Serok: Belê, îroj bi komek din ra jî me soz danî. Wer xuyaye ku ev koma me wê biçin qadên karên cuda. Dê têkevin hinekî kûrbûnîyê jî. Li ser vî bingehî dubare serkeftinê ji we hemûyan ra dixwazim.

**05ê çirîya pêşîn 1995**

**Hûn Dê Bi Nakokîyan Bêtir Mezin Bibin**

Rojbîn: Navê min Rojbîn e. Ji sala 1972, li Beyrûtê, ji dayîk bûme.

Serok: Tavilê nexetime Rojbîn. Çi bû? Tu seqetîyên te hene? Belê navê te Rojbîn e. Me nas kir. Berê jî te dewre dîtibû ne wisa?

…

Rojbîn: Piştra me barkir îskenderûnê. Min partî di zanîngehê da nas kir. Di sala 1993ê da tevlî bûm. Derbasî Botanê bûm. Li wir nêzî sal û nîvekê mam. Piştra hatim vê qadê.

Serok: Te dewre dît. Çûyî Lazikîye. Te çi wergirt?

Rojbîn: Berî her tiştî, ji ber ku min partî di hawîrdora zanîngehê da nas kiribû, ez difikirîm ku ketina min ya nav partîyê bi masîwarî (serserîkî) min xwe avêtîye.

Serok: Belê te xwe bi masîwarî avêt, hindek mabû tu bifetisî. Me tu girt anî vir.

Rojbîn: Erê. Ger li welat mabama, bi rastî wê wiha bûba.

Serok: A niha tu nefetisî. Hêdî hêdî hînî avjenîyê nebûyî?

Rojbîn: Hîn bûme Serokê min.

Serok: Em wê dixwazin. Anku te dikir di deryaya girseyî da bifetisî, tu hînî wê bûyî. Di deryaya rêxistinî da te dikir bifetisîya, tu hinekî fêrî wê jî bûyî.

Rojbîn: Erê Serokê min.

Serok: Wê demê nazîkirinan neke. A niha çawa yî?

Rojbîn: Haya min ji hinek tiştan çêbû.

Serok: Bêguman haya te jê çêbû. Ewqasî em te perwerde dikin.

Rojbîn: Raste Serokê min.

Serok: Ger me tu hînî tiştekî nekiribe, wê demê divê em xwe nebexşînin.

Rojbîn: Na Serokê min. Ez bawer im ku min wergirtine. Lê belê a niha …

Serok: Dizanim niha tu bi kelecanî Rojbîn. Dizanim ku tu gelekî nîyetpaqij î, gelekî fedakarî. Lê sîyaset tiştekî din e. Nêzîkatîyek fermî, polîtîk dixwaze, bi hestyarîyê nameşe. Tu di vî warî da hinekî zehmetîyan dikişînî.

Rojbîn: Rast e Serokê min. Di vê mijarê da hîna jî zehmetîyan dikişînim.

Serok: A niha soza derbaskirina wan divê tu bidî.

Rojbîn: Soz didim ku yê ji min were ez dê bikim.

Serok: Tu guman li ser nîyeta te ya paqij nîne. Lê belê divê were zanîn ku sîyaset jî hunerek e.

Rojbîn: Ev tişt li vir min hîn zêde nas kir Serokê min.

Serok: Dibe, wekî din, tu di vî dewreya dawî da fêrî çi bûyî?

Rojbîn: Dema ez hatim li vir pêvajoyek gelekî giran hebû.

Serok: Tu jî tirsiyayî?

Rojbîn: Bi rastî jî berî tirsê ez matmayî mam. Di serî da tiştên hatine jîyankirin, ji min ra hinekî kirêt dihat xuyakirin.

Serok: Kirêtîya çi? Ew hemû şerên polîtîk in.

Rojbîn: Serokê min ne bedewbûn. Nizanim, wê kêlîyê min wisa hîs kir.

Serok: Dîyar e ku ne bedew e, lê ji bo bedewîkirina wê divê şer were kirin.

Rojbîn: Piştra jî haybûm, min dît ku şer ji bo vê ye.

Serok: Nexweşî her tim dide kirêtkirin.

Rojbîn: Rast e Serokê min.

Serok: Lê belê hinek ji van nexweşîyan te da jî hene.

Rojbîn: Rast e Serokê min. Destpêkê min nizanî, piştra dît.

Serok: Di vî warî da wekî rêbaza serdema navîn em lanet nekin û nexin tirbê. Em nexweşîyan derxînin û derman bikin.

Rojbîn: Rast e, Serokê min.

Serok: An em te bikujin?

Rojbîn: Na serokê min.

Serok: Wê demê zêde aciz nebe. Bawerîya te hekîmîyeta me heye.

Rojbîn: Jixwe Rêbertî behsa koalîsyona tewanbaran kiribû. Wê demê min ferq kir. Bi rastî jî …

Serok: Ne wekî ku hûn dizanin ku bi rehetî em dimeşînin, berevajî em di nava şerekî mezin da ne, heta we dît ku şerê herî mezin em dimeşînin.

Rojbîn: Min ev jî ferq kir; sal û nîvekê di nava refên gerîlayan da mam, lê ewqasî ne giran bû. Li vê qadê zêde giran e.

Serok: Meha dawî hêjayî temenekî ye.

Rojbîn: Bi rastî jî dirûst e Serokê min.

Serok: Helbet. Em vala na xebitin. Te digot qey em hema wisa riprastin?

Rojbîn: Ji bo min razber bû. Hinekî zêdetir şênber bû.

Serok: Tabî girêdana wê bi hawîrdora ku tu lê mezinbûyî ra heye. Me ew hilweşand, baş e. A niha tu dê bi nakokîyan ra hîna zêdetir mezin bibî.

Rojbîn: Belê Serokê min. Ev nakokî me hinekî mezintir dike. Bi qasî ku em rast analîz bikin …

Serok: Yasaya pêşketinê ye, yekîtîya dîyalektîkê ye, anku yek ji nakokîyan yê din derbas dike.

Rojbîn: Rast e Serokê min.

Serok: A niha tu ket vê pêvajoyê. Ger hûn xwedî biryar bin dikarin li hemberî nakokîya ku divê binkeve jî divê biser bikeve, bibînin, ji hev derxînin.

Rojbîn: Erê Serokê min, ez jî tevlê dibim.

Serok: Çêbû, wekî din?

Rojbîn: A niha naxwazim tiştekî din  dîyar bikim.

Serok: Tu kêm zêde dizanî. Tiştekî ku di vê mijarê da bêjim tune ye. Daxwazek te ya derbarê Amanosê hebû.  Bi giştî biryara şandina koman ji bo Amanosê tune ye. Şandina komên jin ji bo wir wê hîna dereng çêbibe. Li ser wan deran em dê bi israr bisekinin. Lê çûyîn dê gelekî piştra be. Ger tu serkeftî bî, wek zanim tu pratîkê dixwazî, ne wisa?

Rojbîn: Pratîk girîngtir e.

Serok: Tabî, pratîk dê pêşîya te veke û kapasîteya te heye.

Rojbîn: Ez dê hewil bidim pêk bînim.

Serok: Tiştên ku tu ji bo hevalên xwe bidî gelek in.

Rojbîn: Tiştên ji min werê ez dê bikim Serokê min. Ez dê di vê mijarê da bi rastî jî dirûst bim.

Serok: Bibiryardarî, bibawerî, bi awayekî xurt tu dê bidî. Ji ber ku  ez dibêjim te wergirt.

Rojbîn: Erê, Serokê min.

Serok: Di gerîlayan da dibe, li her warî tu dikarî bidî, divê hinekî xwe bipêş bixînî. Ez bihêvî me. Ew hesreta te jî wê rojekê bicih were. Jixwe gerîla jî gav avêt wê derê.

Rojbîn: Rast e, Serokê min.

Serok: Ger komeka hemleyeka girîng pêwîst be, tu jî dê di nav da bî.

Rojbîn: Ger bikevimê tiştên ji min were ez dê bikim.

Serok: Lê şoreşa li wir jî serbikeve, dê li Amanosê jî ser bikeve.

Rojbîn: Têkildar in Serokê min.

Serok: Teqez! Di vê mijarê da xeman nexwe. Wekî din tu daxwazîyên te ji min hene?

Rojbîn: Na Serokê min. Ma wekî din ez dê çi bixwazim.

Serok: Te navê wê keçê jî girtî. Ew Rojbîna ku bi awayekî ne dîyar wenda kirin. Hertim pêdivîya lêpirsîna hesabê dihesim …

Rojbîn: Ez jî hewil didim hîs bikim Serokê min. Em dê hesabê wê bipirsin.

Serok: Ew keç jî li vir bû û bi rastî jî dirûst, jidil bû. Nemerdan esameya wê jî nehiştin, ji holê rakirin. Em dê rojekê heyfa wê hilînin.

Rojbîn: Lêpirsîn hatiye destpêkirin Serokê min.

Serok. Tabî! Hîn jî em dê bipirsin. Rehet be. Hinekî serwer be. Tûj be û tu dê bibî şahidê zayîna bi heybet ya jina azad. Di vir da jî rola xwe bigire. Lê bi keda xwe, bi serkeftinên xwe Rojbîn, çêbû?

Rojbîn: Dibe Serokê min.

Serok: Sozdayîn di vê çarçoveyê da ye?

Rojbîn: Di vê çarçoveyê da Serokê min.

Serok: Ev demeka dirêj e, em di nava sozgirtinê da ne. Niha dema pratîkê ye?

Rojbîn: Erê, Serokê min.

Serok: Baş e, serkeftinên mezin ji we ra dixwazim.

…

**04ê teşrîna pêşîn 1996**

## Nameya Rojbîna Ereb (Fatma Ozen) Ji Serokatîyê Ra

Ez Fatme Ozen, di sala 1993ê da tevlî PKKê bûm. Li Garê û Botanê ketim nav xebatên artêşê. Piştra şansa dîtina serokatîya tevahî mirovahîyê û di perwerdeya wî ra derbas bûm. Bi coşa ku min ji wî girtiye derbasî welat bûm. Nêzî 2 salan di nava xebatên qada Zagrosê da me.

### Serokê Min

Dema ez vê nameyê dinivîsîm, dixwazim her tiştî hîs bikim û binivîsim. Tiştên ku min nivîsandine jî hîs bikim. Wiha ku ez bixwe, wekî jinekê tiştên hîs dikim binivîsim. Hêvîya min ya herî mizin ew bû ku bigihînim wêrekîya wê, zimanê wê. Îro pir bi kelecan im. Pir kêfxweş im ku ez giham wê.

### Serokê Min

Êrîşên îro, ji bo serokatîyê wekî destpêka pêvajoyek nûtir e, di heman demê da jî roja derxistina hêza serokatîyê bi hemû îhtîşamîyê, bi hêza ku kes nikare bigihîje ye. Pozîsyonek, sekneka dîrokî hatîye bidestxistin  ku di her kêlîyekê da dikare bi awayekî afirînerî were nirxandin. Tu hêzên ku nikarin li hemberî êrîşên wisa bêperwa, dîn û har li ber xwe bidin. Mayîna we li ser pîyan û veguharandina ji şerekî birûmet ra, di heman demê da we hişt ku ew bikevin wê bîra ku wan kolabû.

Qet ne tesadûfîne, berevajî wê ew encamên sêwirandina kesayetîya ye, sêwirandina jîyanan e. Min biryar da ku ger carek be jî ez dixwazim kêlîyeka dîrokî binirxînim. Bi vî awahî destekekê bidim, ji hêla xwe ve ji pêvajoyê ra bibim bersîv. Îro di dema ku li ser serokatîya me êrîşên ewqasî kambax tên kirin, pejirandina wê wisa bêdeng mayîn û domdarkirin, di heman şaşîyên şer û jîyanê da, tê wateya fêmnekirina girîngîya wê kêlîyê ye. Ji ber wê jî ez bawer dikim ku îro nirxandina kêlîyê bi awayekî herî baş, sîstema desthiladarîya komara Tirkîyê ku emperyalîzm wekî çeka bingehîn li hemberî gelên Rojhilata Navîn bi kar tîne. Hîn zêdetir hatiye rêxistinkirin, di van pêvajoyan da, derbekirina wê bi navê gerîla û rawestandina êrîşên li ser serokatîya me ye. Her roj dema dibêjin: Me gerîla qedand, dora APO ye. Ne vala ye. Bi rastî jî ger îroj ewqasî ne bi me ra bi Serok APO ra mijûl dibin. Jêderka wê ji kêmasî û lewaztîyên me tê. Tê wateya ku me xwe negihandîye sîstema gerîla. Jîyana wê û afirînerîya wê ya bê sînor. Lê belê gerîla sîstemek, jîyanek e. Hunera hêdî hêdî xerakirina pergalên desthilatdar yên heyî û di nav da afirandina nû ye. Tevî vê rola gerîla ger ku îroj Serokatîya min di hedefê da ye, ez vê li xwe dipirsim. Pêngava ku Zîlanê afirand, divê bi pratîsyenîya Sema bihata domkirin. Lê alîyê ku

me nîvco hiştîye ev e. Ji ber ku me erkên xwe bicih neanîn, me hûn bi tenê hiştin û neçar mayî ku bi tena serê xwe, sîng li ber hemû êrîşan vekî. Bi navê xwe ez nema dikarim wekî temaşekar bimînim. Di pêvajoyek wisa da di tenêtîya Serokatîya me da, dixwazim li rex Serokatîya xwe bibim gerîlayeka şerker.

Li qadeka bi vî rengî ku her kes qaşo lê dijî, mafê jîyanê ji Serok Apo wergirtin çiqasî durist e. Nemaze, ger ku mafê jîyana vî Serokî, mafê jîyana gelekî be, mafê jîyana mirovatîyê be. Dema dixwazin ji wî bigirin, tê çi wateyê? Ez dixwazim bersivê bidim van êrîşan ku tu mirovekî durist nikare tehemûl bike. Nabe ku mafê jîyanê yê tu mirovî jê were girtin. Ez jî wekî mirovekî, wek ez dixwazim, ev mafê min yê xwezayî, bikar bînim û jîyana xwe bikar bînim. Bi vî awayî li gorî hêza xwe dixwazim li mafê jîyanê ya Serokatîya me xwedî derkevim. Bawer dikim ku ev mafê min ê jîyanê ya herî mezin e. Di dawîyê da, tişta herî zêde ez dame fikirandin nirxandina nêzîkatîyê ji jin ra ya ku min bi pêş xist, sedemeka bingehîn ya êrîşên ewqasî bê perwa ji alîyê serdestan ve ye. Di rastîyê da, ev êrîş li dijî hewildanên hişyarkirina mirovahîya Rojhilata Navîn e ku dergûşa mirovahîyê ye. Ji ber ku di serî da dê jin şîyar bibe û doza mafên xwe bike û wekî sîstemekî pêl bi pêl

belav bibe. Tu serdest nikare li pêşîya tevgereka jin ya wisa raweste. Lewma jî, ji ber hewildanên we yê rizgarkirina jinê, hêrsa hemû serdestên cîhanê kişand ser xwe. Ji ber ku serdestên cîhanê ketin ferqa ku wê her tiştên xwe wenda bikin, ketin nava liv û tevgerek wisa ku komple bipêş xistin û êrîş kirin. Her tiştî dipejirînin lê belê rizgarkirina jinê bi tu carî napejirînin. Ji ber ku qada kedxwarîya hezarê salan e. Lewma jî hûn kirin armanca bingehîn. Di esasê wê da, ew hêrs di kesayeta we da, li dijî azadbûna jinê ye. Jina ku ji jîyanê bi hêvî ye û xwedî gotin e. Ji ber vî jî ew hêrs pir kûr e. Bikok e û bi hêsanî nayê derbas kirin.

## Serokê Min

Tevî ku hemû serdest wekî ku tu wateyê nadin telepatîya navbera Serokatîya me û jinê, êrîşî wê têkilîyê dikin. Wekî ku di demên dawî da çêdibe her çiqasî berevajî dikin dixin rojevê jî, lê belê baş dizanin ku cewherê wê têklîyê çî ye. Ji ber ku li dijî sîstema xwe wekî metirsîyeka mezin dibînin. Lewma jî dixwazin ji holê rakin. Gelê dîtir jî tevlî xwe dikin û bi çavsorî êrîş dikin. Ji ber vê sîstema we ya li ser esasê jinê ku hûn dixwazin di Rojhilata Navîn da bi pêş bixin, ewqasî hûn kirine hedef û tevahîya Rojhilata Navîn kirine şirîkê wan êrîşan. Di heman demê da Serokatîya mezin ya derketina we ya çûna

Ewropa ra ku navenda daneheva çanda mirovahîyê ye, dê ev têkoşîn di asta navnetewî da deng vede. Hinekî têgihiştina van tiştan, îroj kelecanek mezin dide min. Wekî jinek, wekî yeka Rojhilata Navînî, hêza derketina li hemberî ev sîstemên paşdamayî ku bi israr li ser me dihatin ferzkirin ji we hîn bûm. Tevî ku perjewendîya herî zêde ya gelên Rojhilata Navîn ji vê Serokatîyê ye, neparastina wî bi awayekî xurt, pêşînegirtina êrîşên li ser wî, di esas da tê wateya dûrketina ji perjewendîyên xwe ye. Xwezî hêza min heba ji wan ra nîşan bide ku ew nêzîkatîya wan  gelek tiştan dide wendakirin. Ez wekî mîlîtaneka PKKê, wekî jineka ereb ya Rojhilata Navînî, ji ber ku Serokatîya mirovahîyê ye, bitaybet jî ya Rojhilata Navîn e û berî her tiştî jî Serokatîya jinê ye, ji Serokatîya ku di kesayeta jinê da Rojhilata Navîn dixwaze rizgar bike ra, dixwazim dilsozî û girêdana xwe bînim ziman.

## Serokê Min

Dema dixwazin we di tenêtîyê da bihêlin, dixwazim bibim hevalê we. Dema dixwazin we ji wê jina ku herî zêde  we ked dayî biqetînin, bibim hevalek we ya jin û dema dixwazin we ji Rojhilata Navîn ku ji bo mirovahîyê pir girîng e biqetînin, bibim leşkerek we ya Rojhilata Navînî. Bi bîr û bawerî û kelecana xwe dîyar dikim. Wekî leşkereka we ya jin ku we ew

daye qezenckirin, we hêz daye, ji mezelê derxistîye, a niha dixwazim ji bo jîyana nû ya ku hûn dixwazin ava bikin biryardarîya nemirîyê nîşan bidim. Jixwe ev jî ne mirin e; ji bo min hevdîtina bi Zîlan, Sema û Fikrî ra ye. Hevdîtina dîrokî ya bi Serokatî û jinan ra ye. Min dixwest tiştên hîn mezintir bikim, lê hêza min têra ewqasî dike. Ji ber ku bawer dikim ev doz teqez wê serbikeve.

Teqez dê azadî û serkeftin para mirovahîyê be. Ya jinê be anku dê ya we be.

Bijî Rêberê Me Yê Azadîyê Serok APO!

Bimire Hemû Pergalên Serdestîyê!

Bijî Sengera Me Ya Azadîyê YAJK!

Rojbîn (Fatma Ozen)

## Ji Bo Hêza YAJK û Ji Bo Tevahî Jinên  Ji Bo Azadîya Wê Têdikoşin

Jîyan bê jinê nabe. Bi afirandina jina yekem ra, yekem dîrok, yekem jîyan çêbû. Bi jinê ra, girêdana herî bedew bi xakê ra, jîyan bê çîn, hilberîna bê sînor û parvekirina bê sînor çêbû. Ji ber ku jin hilberînera kêfxweşîyê ye, kêfxweşî anî ser rûyê erdê. Ji ber di her qadê da, keda wê heye û zayîndar e bû cewherê dadwerîyê. Jinê parvekirina bêdawî, ji heskirina mîrovahîyê girt. Hemû cewherê wê tevahîya bedewîyan bû. Di roja îroyîn da jî jin bi wan hemûyan ra avêtine quncikên herî tarî yê dîrokê. Çi kambaxî heye tev xistine sitûyê jinê. Rewşeka weha derket holê ku her çû ji xwe xerîb ket û ji tiştên têkildarî xwe dûr ket. Ket rewşeka wisa ku ne dîyar e çawa dijî. Bêguman sedema vê seknê, sekna ku serdestan ava kirîye ye. Ji me ya herî baş, ya ku di xefletê da bû. Ji bo hişyar nebe gelek hewildan çêkirin. Tevî hemû polîtîkayên wan, bêyî ku ferq bikin, Serok APO em hişyar kirin. Hêza ziman, dil da me. Rastîya me bi me da nasîn. Dîroka me ya nenas, bi me da nasandin. Di navbera me û azadîyê da wekî ku nebe nabe, girêdanek ava kir. Li gel wê yekê, bi me ra wekî hevrê, hevrêtîya jin bi jin ra bipêş xist. Îro gihaye astekê ku kî çi dibêje bila bêje, xebateka ku mohra xwe li sedsalan bide heye.

Ne zehmet e fêmkirina asta gihaye. Yên ku ji bilî azadîyê ti çara wan nîne, yên ku ji bilî pêşketinê ti rêyên vegera wan nîne. Ez kelecaneka mezin dijîm ku di nav vî karî da me. Bi jinê ra me, dixwazim vê bi hev ra bûnê, heta hetayê bijîm.

Wekî îfadekirina tevahî jinên kurd, heta îfadekirina perjewendîya jinên cîhanê, ev nêrîna jinê û rêxistina wê asta ku PAJK gihaştîyê, her roj zêdetir berpirsyartîyek mezin û giran datîne ser milê me. Xwe rizgarkirina ji koletîya jinê, hêza şerkirinê li hemberî hemû serdestan, ji me tê xwestin.

Li hemberî sîstemên heyî, ji bo avakirina sîstema jinê, divê em hêza şer nîşan bidin. Ya herî girîng jî divê em pratîsyenîya wê, taktîksîyenîya wê nîşan bidin. Ji ber wê divêt bi hemû pirsgirêkên me yên jîyan û şer bi hev ra têkevin navhev. Ne bi wan ra rakêşkirin, pêwîst e ku em xwedî alternatîf û sebir bin. Di vî şerî da, em jin ne hêza yêdek in, em hêza bingehîn in. Lê belê di wendahîyên dawî yên Botan û Garê da hat dîyarkirin ku sedema teslîmkirina vînê, rakişandin ji vê ye. Li şûna ku li cihekî din li sedeman bigerin, divêt em di xwe da li zemînê wê bigerin. Heger em bi şêwazê xwe ne ji rastîyê ra, ji şaşîyê ra dibin zemîn, divêt em vê zemînê biçikînin. Ji ber ku hêvî ji serdestan nayê kirin, ew ji me ra nabin çareserî. Em wekî sîstema jinê ji wan ra alternatîf in. Ji wan ra tevgera nîşandana

rêya rast in. Em ne di ferqê da bin jî serveyîtîya me, nehestîyarîbûna me, zerarê didin xebatên dîrokî.

Ji bo mirovên cîhanê, jina PKKê, îroj di lêgerîna sîstemekê da ye. Di hewildana rizgarkirina jinên cîhanê da ye. Îdeolojîya wê ji alîyê Serok APO ve hatîye danîn. Ya li ser me dikeve, pêkanîna wê ya pratîkî ye. Ev tişt ne zehmet e, ya zehmet kolebûyîn e. Ji ber vî jî rizgarbûna ji vê rewşê ne xeyal e, rêyek vekirî hatiye dîyar kirin. Her çiqasî têgeha koletîyê ji bo jinê tê xebitandin jî lê mêr jî ne kêmtirî jina kole ye û rizgarkirina wî hîn zehmettir e. Koleyê pergala ku wî ava kirî ye. Ji ber wê jî ev rizgarkirin wekî ya jinê lezgîn e. Lê belê ew jî dîsa di azadîbûyîna jinê ra derbas dibe. Lewma jî ji bo xelaskirina mêr ji vê rewşê, divêt teqez bi awayekî lezgîn em azad bibin. Gotina Serok APO ji ber  ku jin bi rola xwe ranebe, mêr dev ji hegemonyaya xwe bernade, sekna mêr di roja me da û li hemberê wê perpirsîyartîyên jinê bi awayekî zelal datîne ber çavan.

Gerîla wekî tê xwestin bi erkên xwe ranabê û Serokatî bi tenê tê hiştin! Di vir da divê weka jin em kêmasîyên xwe, lewazbûnên xwe bibînin. Gerîlatî tevgereka bi jinê ra ye. Ji ber ku şêwazê gerîla ji jinê nêzîk e. Îro erka me ya herî mezin, tevgerkirina gerîla bi jinê ra, ji bo mijûlkirina dijmin bi xwe ra

daku Rêbertîya me ji tenêtîyê rizgar bibe. Armanca bingehîn ya hebûna me, ev mirovê giranbiha ku di tenêtîya dîroka me da ji me ra bû heval, rê nîşanî me da, em jî jê ra hêza hevaltîyê nîşan bidin.

## Ji Tevahî Hevalên Mêr Ra

Tevî tevahîya serdestîya we, divê hûn koletîya xwe bibînin. Vê pergalê ti tişt neda jin û mêran. Koletî dibe ku gelekî zehmet û kambax be. Lê belê hegemonya ji wê ne kêmtir e. Ti alîyên wê ji koletîyê bilindtir nîne. Israrkirina di wê da, ti bedewbûn tê da nîne. Wateya dîtina rizgarîyê di jinê da ji alîyê heval Fikrî ve mezin e. Şopdarîya wî tiştekî bi we nade wendakirin. Perjewendîyên zir yên takekesî, di demdirêjîyê da tiştekî ji mirov ra bidest naxin. Ji ber wê yekê jî ger îroj perjewendîyên we zirarê bibînin, ew zirarbûyîn ya perjewendîyên hegemonya ne. Di demdirêjîyê da yên qezenc bikin dîsa hûn in. Îro li hemberî polîtîkaya me ya mirovatîyê ewqasî tên kirin, divêt seknek û helwestek ji alîyê hem jin ve hem jî mêr were nîşandan. Divêt êrîşên li ser azadîya me werin dîtin û bertekên xwe pêş bixin. Ger ku îro qetandinek tê ferzkirin, ew ji bo ku em xwe bighînin biryar û helwesteka hevpar e.

## Ji Tevahî Hevalên Min Yên Jin Ra

Hemû hewildanên min ji bo têgihiştina asta YAJK û bûna bersiva wê ye. Nikarim bibêjim ku bi her alî ve têgihiştim. Nikarim bibêjim ku hêza min têrê dike. Lê belê asta ku hatiye wekî takekes gelekî min di kelecanê da dihêle. Ji bo wê jî teqez pêdivîya kirina tiştinan hîs dikim. Qet nikaribim tiştekî bikim jî wekî jinekê dixwazim xwe bikim mertal li hemberî êrîşên li ser Rêbertîya me. Nabêjim ku bi vê ez dê karibim gelek tiştan rizgar bikim, lê herî kêm, li gorî  fêmkirina xwe, dixwazim bibim xwedî helwestek. Ez bi vîna xwe çalakî dikim. Ez dê bi hemû bawerîya xwe ya bi bedewbûna jinê, sîstem û rêxistina wê YAJKê ra tevbigerim.

Bijî Serok APO!

Bijî YAJK!

Bimre Her Awayên Nêzîkatîyên Hegemonîk!

Rojbîn Amanos (Fatma Ozen)

## Ji Hemû Endamên Artêşê Ra

Tevî ewqas mirin, ewqas wendakirin û kuştina gel, ew şerê ku dilê ti mirovî nikare hilgire tê meşandin. Sibê dema li ser dika dîrokê ev şer were bibîranîn, wê hêrsa gel li hemberî yên şer bi rê ve birine gelekî mezin be. Tevî bangên Serok APO yên agirbestê jî bi hatina lîstikên sîyasî ra ev şer ji alîyê we ve di asta herî bilind da tê meşandin. Hêrsa me ne li hemberî we ye, li hemberî yên we bi rê ve dibin e. We didin meşandin û dibin sedema qirkirina gelekî ku di kesayeta wî gelî da mirovahîye qir dikin. Ev sîstem bi qasî ku li dijî me ye li dijî we ye jî.

Hûn wekî endamên artêşê divê baş bizanibin ku, her ku diçe hûn ji vîna xwe û rastîya mirovan têne qetandin, hêdî hêdî ji cewherê mirov dûr dikevin. Cihên li ser mezin bûne, rêxistin bûne û bi hev ra jîyane xaka me û we ye. Ger ku îro dixwazin me ji vir qut bikin, biavêjin û wê dixwazin bi destê we bikin. Ji bîr nekin ku ew metirsî ji bo we jî derbasdar e. Hûn dê yan bibin kopîyek ji hemû hegemonyan ra, yan jî wekî me tune bibin. Berî ku dereng bibe, pêwîst nîne ku hûn ji wan lîstokan ra bêjin bes e? Kî şer dixwaze? Kî terorîst e? Hêdî ne lazim e ku ev were fêmkirin? Ger yê şer dixwaze Serok APO ba, bi israr nedigot agirtbest. Ne pêwîst e ev were ramandin. Em wekî

mirovên kurd, wekî jinên kurd, van êrîşen we, em şermezar dikin û dibêjin, destdirêjî Serok APO nekin. Kîngê destdirêjîya li ser nirxên me yên azadîyê werin kirin, em amade ne, bersiva we bidin.

Di şert û mercên asayî da min nedixwest çalakîyek wisa bikim. Min ne dixwest mirovan bikujim. Beramberî mirovahîyê tijî hezkirin im. Lê belê wekî jinek li hemberî ewqas êrîşên ku hûn ferz dikin ra dibêjim hêdî pejirandin çênabe. Ez jî ji bo bêtehemûlîya xwe nîşan bidim û dilsozîya xwe bi Serok APO ra bînim ziman û wekî bersivdayîna ji êrîşên we ra, vê çalakîyê dikim. Bi hemû dilsozîya min ya bi jîyanê ra, ji bo jîyanek xweşikti,r xwe bi vî awayî tevlî vê jîyanê dikim.

Bijî Rêberê Me Yê Azadîyê Serok APO!

Bimire Mêtinkarîya Komara Tirkîyê!

**Ji Hemû Hevalên Partîyê Ra**

Ew navê ku di rêgezê da tawîz nedabû ye!

Di sêyemîn salvegera çalakîya mezin ku bi ruhê fedayî li hemberî  rastîya komployê li Geverê di 17ê çirîya paşîn 1999ê da hatiye kirin, li beramberî bîranîna heval Rojbîn bi hûrmet xwe ditewînin, carek din didin dîyarkirin ku fêmkirin û danefêmkirina ruhê wê ya jin, dirûstbûn, dilsozîya rasteqîn û milîtanîya wê wekî erkekî li ser milê me ye.

Dîroka komplogerîyê bi qasî dîroka serdestan ji sedsalan ta roja me didome. Li gorî rengê serdemê rengê xwe guhartîye. Dema dighîje sedsala 20em ku nikaribûn hêvîya mirovahîyê bitemirînin, li hemberî mirovahîyê di kesayeta Rêberê me yê netewî li dijî Serok APO daye destpêkirin. Dema ew dihat armanckirin, bi hêza ku ji dayîka pîroz girtîye xwe dayî istirandin, ji kûrahîya bi Rêberê me yê mezin ra girêdan ked û dil danî ye … Ku li hemberî dijmin bi çalakîya xwe hemû cewherê jinê qîrîyan şehîdên me  ku gîhan sira hevrêtîya rasteqînî û bi taybet heval Rojbîn ku em bi bîr tînin.

Rêbertîya partîya me dibêje: "Ji xwedîyên êşan û fedakarîya qehremanîyan ra ku di dîrokê da mînakên wan tune ye dilsozî û rêzgirtin, wekî ku xwe ji rastîya  hezar salên lanetkirî rizgarkirin û pîrozkirin e".  Wekî hevalên Berwar, Sema, Zîlan, Dîlan yekbûnîya bi yên tenêtîya xwedawendîyê dijîn ra  heval Rojbîn, di rûpela dîroka ku nû derdikeve da, wekî beybûna gundewarîyê ya Kevana zêrîn, zêde dibe , mezin dibe … Her li ser pîyaye û serîbilind e. Wekî ku a niha hesap dipirse ye. Ji ber ku di rastîya komploya hatîye pûçkirin da,  li dijî feraseta sîstema desthilatdar ku jin biçûk dikir, dikir meta, dikir sermaye, bû kombînasyona zanîn, jîyana birûmet, eşqa azadîyê û hezkirinê. Ger têghîştin, parvekirin û hezkirine, dema heval

Rojbîn bi hemû dirustîya xwe ve ji hevalên xwe ra vedike, hêza xwe ya têghîştinê di asta herî bilind da ber bi Rêbertîyê kir û her ku fêmkir bi zehmetîyê wê ra têkoşîn da ser milê xwe. Wekî Ronahîya Alman, Hêlîna Çerkez, Candaya Tirk, Rojbîna Ereb jî di îdeolojîya azadîya jinê da nasnameya xwe, rûmeta xwe, hebûna xwe dît … Ger pîvan, rêgez û îdîa gîrêdana bi armancê ye, ger pîvanên milîtanekî, ji bo gîhandina wan ji ti fedakarîyê nareve ye, ger berdêlên jîyana azad dide ber çavên xwe, navê wê yekê hevrê Rojbîn e.

Sîstema desthilatdarîya sedsalan, ku li ser civakên Rojhilata Navîn rastîya dejenerekirinê daye ferzkirin, her çiqasî jin di binî da mabe jî lê di cewherê xwe da, wekî sirekî veşartî ruhê neolîtîkê ya azad û wekhev ji wê hêz girt û bijarteya xwe ya jîyanê kir û encama wê bijarteyê bû ku çalakîyek wisa kir. Çawa ku xwedawendên neolîtîkê ji nav civaka ku tê da dijîyan derdiketin û bi wan ra jîyana xwe didomandin û erkên xwe yên xwedawendîyê didan meşandin, wê jî bi çalakîya xwe ya pîroz karîbû wê cewherê di xwe da biafirîne. Rêveçûna wê ji warê pîrozbahîyê ku hatiye lanetkirin, ber bi kevana zêrîn bû rêya wê.

Wekî tevahî şehîdên me, mezinahîya wê jî di nêzîkatîya ne seranser ya ji rastîya Rêbertîyê ra dihat. Ji ber wî, bû şervanek

ya têghîştinek baş, zehmetî kişand û zor da xwe. Ji ber ku ji têghîştinê ra têkoşîn divêt. Şert û mercên şer û hêzbûnê li dijî her tiştê şûndamayîyê û serdestîyê lipirsîngerî divêt û divêt nakokîyan nasbike. Heval Rojbîn di dem û cih da nakokî didîtin û çareser dikir. Bi hîşyarîbûnek wisa xwe ronî kir û ber bi rojê va ket rê.

Li hemberî guhertinên şert û mercan ji 3 salên çalakîyên bêhempa ku me li paş xwe hêştin ta îro, di cewher da, yên ku divên werin kirin û mînak bigrin heman yek in. Anku ji têghîştinê divê têkoşîn were kirin, ji bo lêpirsînerîyê û gihandina armancan jî bi coş, biryardarî û bi cewherê jinê û zelalîya wê, bi zanînê û di heman demê da girêdana bi îdeolojîya pêşengtîyê, ji her demê zêdetir berpirsyartî û peywîr daye ser milê jinê, tevlêbûnek bê hesab û xwe zorkirin, divêt di vê pêvajoyê da jî esas were girtin. Peywîra me ew e ku em cewherê rasteqîn ya fedaîtîyê wekî Mazlum, Zîlan, Şehrîstan, Fîkrî, Berwar, Sema, Kemal, Xeyrî bigrin û bijîn e. Tenê bi vî rengî em dikarin bibin tov di axa pîroz da. Tenê bi kirina vê yekê em dikarin bibin layîqî keda Rêbertîya xwe.

Rojbîn navê hêvrêtîya Rêbertî, kulîlkdana bedewbûna hevrêtîyê di cografîya me da ye. Ew fedayîya ku hewil da êşên gelê xwe di agirê pîroz yê Rojhilata Navîn da bikewîne ye.

Yê dikeve ser milê me têghîştîna wê, bohrandina kêmkurtîyên me yên di têkoşîna têghîştinê da û jîyandina hemû berxwedêrên fedayî, divê bibe rêgeza me ya jîyanê. Divêt armanca jêveger nabe di pîrozahîya wan da ji kirêtîya xwe paqijbûn, pêkanîna peywîrên demê, kûrbûn di zanîna jinbûnê da û destxistina azadîyê be.

Li ser vê esasê careka din li ber bîranîna Rojbîna ku mînaka giranbiha ya xwedayîn û fedakarîyê bû xwe ditewînin, ji wê û tevahî şehîdan ra soz didin ku em dê girêdana xwe ya bi wan ra bi jîyankirina wan bersîv bidin.

Şehîdên Me Pêşeroj, Îroj û Paşeroja Me Ne!
Bijî Fedayîyên Me Yên Jin ku Bûn Pêşeng!
Bijî PKK, PJA!
Biji Serok APO!
Silav û Rêzên Şoreşgerî
HPG, Biryargeha PJA
17ê çirîya paşîn 2001

**Xeta Şehîd Rojbîn Rastîya Jîyanî ya Hevrêtîya Bi Rêbertî Ra Ye**

Di pêvajoyek wisa nazîk da ku em gihiştinê, ji dîroka têkoşîna me bêguman jêderka hêz, hezkirin û girêdana bingehîn ya hevrêyên me, di serî da rastîya Rêbertîya me û şehîdên me yên pîroz in. Xwedî derketinek rast li xeta çalakî, berxwedêrî û bîranînên şehîdên me ku abîdeyên azadî û jîyanê ne û jîyankirina wan û birina ber bi paşerojê ve, wekî erkekî pîroz ya me ye. Pîvanên jêneveger yên girêdanê ew in ku wekî ku îbadetê dike, di rêya wan ronîkirî da, xwe paqijkirin, ji bo bicihanîna hemû erkdarîya mirovahîyê, bûna xwedî hewil û ked, bi wijdanîyek mezin û bi dirustbûn peywîr girtin, bê hesab û şik, pêşxistina rastîya têkoşîna me ye. Di dema ku salvegera lanetkirî ya komploya cotmehê ya navnetewî li pey xwe dihêlin da, di 5em salvegera çalakîya azadîyê, di 17ê çirîya paşîn 1998ê da, li hemberî komplo ya şehîda hêja Rojbîn bi hûrmetdarîyek bêdawî em bîr tînin.

Di pêvajoyek herî dijwar da ya dîroka têkoşîna me ku Rêbertî bi tenê nehêla, bi çalakîya xwe ya qehremanî rast, girêdana herî rast, herî cewherî, hevrêtîya paqij nîşan da; birûmetî, bi bêhesabî, hezkirina herî paqij nîşanda xwe gihand xwedawendên pîroz û bû domdarîya wan. Dema ku di serdema

herî krîtîk da ku komploya navnetewî dixwest dil û mêjîyê me tarî bike, di dema bi hesreta gihandina ronahîyek biçûk da, hevrê Rojbîn ku mîna Zîlan bi çalakîya xwe xwe kir parçeyek ji rojê û em gihandine ronahîyê, di pêvajoya ku em li hemberî komplo di xefletê da bûn mîna pira pîroz a di navbera Rêbertî û Partîyê da dilsozîya rêgezî ya hevrêtîya rast ava kir. Heval Rojbîn -keça ereb- di nav me da ya herî germ bû ku ji xakên hênik yên deryaya Spî bû. Wekî kombînasyona Toros û Zagrosan, di axa pîroz ya biratîya gelên ereb û kurd da, fîdana yekem bû ku zîl da. Wekî Kemal Pîran, Hêlînên Çerkez, Candayên Tirk, ji gelên Rojhilata Navîn, di nav me da bûn. Bi şoreşgerîya xwe ya biserûber û bê hesab, hevrêtîya wê ya germ û tevlêbûna wê ya zindî, jîyaneka mînak da nîşandan. Bêguman ew tişt bi mezinbûna armanc û hedefan dikarin werin kirin. Pîvana herî bingehîn ya şoreşgerîyê û milîtanîya rêxistinê bi qasî zanîn û asta pratîkbûnên wê, di heman demê da biwijdanîbûne jî. Fezîleta herî mezin e ku mirov li hemberî gel, têkoşîn, mirovahî û hemû nirxên hatine afirandin xwedî wijdan be. Di nava xwe da bi berdewamî pêşxistin lêpirsînkirina wijdanê, nîşandana dilnizmîya xwerexnekirinê ya li hemberî kêm û kurtîyan, çavkanîya bingehîn a derketinên xurt ên şoreşgerî ne. Bi vê wateyê hêla herî sereke ku di rastîya Şehîd

Rojbîn da derket ew bû ku lêpirsîna wijdanî ya kûr û rexnedayînek bê hesab bû. Ger ew taybetmendî li ber çavan werin girtin, dê çalakîya wê ya di pêvajoya komployê da, hîn watedar be. Ev rastî, dibe navê dîtir ya zelalbûna di armancê da, bi armanc ve kilîtkirin, dîsa dilsozîya bi armancê ve û yekbûnîya bi rastîya Rêbertîyê ra ye. Ji ber vê yekê, hevrê Şehîd Rojbîn ku weke rastîyeka şênber a bicihanîna rêgez û prensîbên hevaltîya bi Rêbertî ra tê nîşandan. Weke şoreşgerekî xwedî wijdan, karîbû bi rastîya komployê ra li dijî hemû kêm û kurtîyên di nava me da hatine jîyîn, derketina herî xurt nîşan bide.

Di dîroka têkoşîna azadîya jinê da jî 17ê çirîya paşîn xwedî cihekî pîroz e. Wekî keçek ereb heval Rojbîn rûmeta jinbûnîyê, sekna rûmetdar ya her tim di jîyana xwe da nîşan dida û li gorî çalakîya ku pêk anîye, bêguman divê bi kûrahî were şirovekirin. Ew jî alîyek din ya wê ye. Temsîltîya dilsozîya bi axê ra û welatparêzî, wekî pîvanên sereke yên Îdeolojîya Rizgarîya Jinê bi awayekî xurt îspat kir. Li hemberî rastîya paşverû ya feodalîya Rojhilata Navîn wekî keçek ereb îdîaya xwe azadîya bêdawî vegehurand çalakîyê, gihandina hêza şênberkirinê ew fedakarî, hêrsa li hember koletîyê nîşandan, helwestek bi tund nîşandan, pir bi wate ye.

Weke berdewamîya xeta Şehîd Bêrîtan û Zîlan jî bi çalakîya ku di serdemeka êrîşa herî berfireh da pêkanîna wê, weke praktîkvanekî xurt ê xeta parastina rewa û xeta leşkerî derdikeve pêşberî me. Di vê wateyê da, wek Tevgera Jinê dema ku me di sala 1998ê da gavên mezin ên partîbûyînê avêtin, dema me armanc kir ku em bibin partîyeka enternasyonal, derketina bi heybet ya keça Ereb Şehîd Hevrê Rojbîn, di partîbûna jinê da, lezdayînek girîng, di pêşketinê da derxist holê.

Rastîya Şehîd Rojbîn ku bi îdîaya xwe ya azadîyê û xeta çalakîyê temsîlîyeta îro ya çanda xwedawenda dayîkê ya çîyayên pîroz Zagrosan zindî kir û hema piştî wê Şehîd Berwar ku di pêvajoya komployê da, bi dilsozîya kûr a dilê jinê, rastîya hevaltîya bi Rêbertî ra nîşan da, dîsa ji bo bîranîna hevrêyên Şehîd Zîlan, Şehîd Bêrîtan, Şehîd Dîlan, Şehîd Şerîf û Şehîd Binewş bêguman girîng e. Hevrêyên me yên şehîd ku bi çalakîyên xwe îlham dan hev, gihîştin wê hêzê ku bibin ziman û çalakîya pêvajoyê. Divê bê zanîn ku kompolya navnetewî, di heman astê da li dijî pêşketina jina azad ku yekser girêdayîye bi rastîya Rêbertî ve, di beramberî vê da, bersiveka bi vî rengî ya ji rastîya jinê, ji nû ve destpêkirina çanda xwedawendîya dayîkê, li xaka me ya pîroz e. Helbet ew jî îfadeya derketineka

dîrokî ye, hem ji bo mirovahîyê û hem jî ji bo jinan. Mîna ku di jîyan, kesayetî û xeta çalakîyê ya hevrêya me Rojbîn da derket holê, di pêvajoyên herî zehmet û hesas da, bûyîna xwedî rastîya şexsîyeta wijdanî, berpirsyar û bêhesab, pêkanîna pratîkbûyîn û têgihiştina rêxistinbûyînê ya li gorî pêdivîyên pêvajoyê, bêguman ew îfadeya rasteqîn a dilsozîya bi rastîya Rêbertî ra ye.
Rastîya ku komploya navnetewî didin domkirin, weke taybetmendîyek pir zelal tê jîyankirin. Ew rewşa polîtîkayên tecrîdê ku li ser Rêbertîya me didin meşandin, di heman demê da ew polîtîkayên dane pêşxistin li dijî rêxistina me, divê bi çavekî biçûk lê nenêrin. Bi vê wateyê ji her demê zêdetir, rastîyên şehadet û çalakîyên ku di pêvajoyên girîng da derdikevin di asta xetê da divêt encamên wê werin cespandin. Ji ber vê yekê, di serdemeka ewçend hesas da, li dijî meylên nava me, hevrê Rojbîn rastîya Rêbertî û xeta çalakîyê ya li beramberî pêvajoyê, têghîştina wê watedar kirin û pejirandin û di pratîkê cespandin, di jîyan û kesayeta xwe da serdest kirin di 5. salvegera şehadeta wê da, divê jêneveger weke peywir were bicih anîn. Li gel vê rastîyê di mehên cotmeh û mijdarê da ku di pêvajoyên girîngin da, PJA di konfransa 1. ya HPG ji bo ku

jin wekî hêzek fedayî di binyada artêşa jinê da di astek herî bilind dibe zemînê biryardarîyê.

Ji bo hevrêtîya bi Rêbertî ra, em wekî lêgerînvanên edalet, hezkirin û azadîyê, di vê mijarê da bi biryardarîya ku em hemû alîyên kêm yên xwe derbas bikin careka din em tînin ziman, li ser vê bingehê di 5. salvegera şehîda me hevrê Rojbîn ku bi rastîya çalakî û kesayeta xwe ji me ra ronî dike, em bi rêzdarîyek mezin bi bîr tînin. Em biryardarîya xwe nû dikin ku di xeta çalakîya wê da, hê xurttir û bi îdîa ber bi paşerojê ve bimeşin .

Bijî Şehîdên Me yên Qehreman ku Pêşeroj û Paşeroja Me Afirandin!

Bijî KADEK û PJA, Garantîya Mirovahîya Pêşverû!

Bijî Hêvîya Me ya Azadîyê Serok APO!

Bimire Komploya Navnetewî û Tevahî Hêzên Paşverû û Hevkar!

Silav û rêzên şoreşgerî

## Qîrînek Azadîyê Ji Beyrûtê Ta Botanê; Rojbîna Ereb

Demhat Tolhildan

Hinek kêlî hene ku çarenûsa civakan didin dîyarkirin û ev kêlî tu carî nayên jibîrkirin. Dem radiweste, hiş û ruhê mirov dikeve rawestandinê, divê çi bibe an li benda ka wê çi bibe, ji nişka ve bûyerên ku mêjîyan dirawestînin derdikevin pêşberî me. Wekî berteka li her dera ku gelê kurd dijîya berîya 12 salan li hemberî pêvajoya komploya navnetewî ku li ser Rêberê Gelê Kurd Evdellah Ocalan hatiye meşandin, nîşandayî. Nayê jibîrkirin û wekî nîşandana girêdana gelekî bi rêberên xwe ra dest bi çalakîyên fedayî kir. Ta nefesa dawî dema ku canê xwe didan, ji bo doza azadîya xwe, bi sloganek hevpar digotin: "Hûn Nikarin Roja Me Tarî Bikin". Yek ji wan kesên ku tevlî karwanê çalakîyên "Hûn nikarin roja me tarî bikin" di nav refên gerîlayan da, Rojbîna Ereb (Fatma Ozen) ya ku di 17ê çirîya paşîn 1998ê li Geverê çalakîya fedayî kir bû.

Pirsa ku di mêjîyê mirov da dimîne, Rojbîn kî bû? Çawa çêbû ku çalakîyek wisa kir? Hele nîşandana ew wêrekîya ku bi çalakîyekê dawî li jîyana xwe bîne tiştekî çawa ye? Pirsên wisa li dû hev tên. Lê rastîyek heye tê zanîn, ew jî ku berdêla azadîyê çiqasî giranbiha ye.

Tişta ku li mirov tê bi rengê xwe jîyan kirine. Hinek dizanin ji bo jîyankirina li hemberî koledarîyê zehmetîyên tenêtîya mezin pejirandine hene. Ew in ku ji bo doza ku jê ra dibêjin azadî her awayên zehmetîyê, fedekarîyê ji xwe ra wekî mafê jîyanê bijartin e. Ew in ên ku weke fezîleta herî mezin dizanin ku di dema ew pêwîst dibînin da, ji bo doza xwe canê xwe feda bikin. Dîyardeya ku em jê ra dibêjin fedakarî, ji bo wan gihandina sira kêfxweşîyê ye. Ji ber ku bi coşeka mezin wê jîyanê dipejirînin. Ew xeleka herî bedew di zincîra dîyalektîka dîrokî da ne û nûnerên herî bilind yên dilsozîyê ne. Ew in ku ji bo pêdivîyên azadîyê yên gelê xwe, hevalên xwe, hêza afirandinê nîşan dane. Ger hest, ruh, manewîyet û hezkirina wê hêzê zêde bike, bi afirandinên xwe ra, dibin hêza wateyê.

## PKKê Bû Nasnameya Wê

Rojbîn ku ji sala 1993ê û vir ve, di nava refên gerîlayan da, di demên herî dijwar ên şer da derbas kir, gerîlatîyê mîna evînekê dijî. Ji derdorek ku ji her tiştî xerîb e, tê nav refên gerîlayan. Beyrûta ku lê ji dayîk bûye, ne dûrî şer e, lê belê şerê li ser çîyayên Kurdistanê hinek cudatir e ji bo wê. Keça malbateka ereb e Rojbîn. Ji ber sedemên ku şer li Rojhilata Navîn derxistine holê, bi malbata xwe ra neçar maye koçî Tirkîyeyê bike. Birayê wê jî bi awayekî aktîf ji bo rizgarîya Filistînê

têkoşîn kiribû. Dema li Îskederûnê dest bi jîyana xwe kirin, Rojbîn hîna 4 salî bû, lê her ku mezin dibû bîranînên Beyrûtê ji wê û ji  malbata wê dûr nakevin. Rojbîna ku di nav çanda civaka ereb da mezin bûye ku ji gelên herî kevnare di Rojhilata Navîn da ye. Hîna tevlîhevîya ku civak dijî çareser nekirîye. Dema ku sala çarem ya beşa karsazîyê di zanîngeha Andolu ya Eskîşehîrê dixwend, nasbûna wê bi PKKê ra çêdibe. Di PKK da bersîva gelek pirsgirêkên ku bi salan e ji rewşa kaotîk bingeh digire dibîne. Rojbîn alîyên enternasyonalîst yên PKKê dibîne û nêzîkatîyên îdeolojîk yên serokê gelê kurd Evdellah Ocalan ne tenê bi kurdan ra sinordar in hîs dike. Ji bo ku bersîva pirsên di derbarê jîyanê da bibîne û ji bo bigihije sira jîyanê, tevlî nava refên gerîlayan dibe. Êdî PKK ji bo Rojbîn rastî û heqîqet bixwe ye.

Di Mezepotamyayê da ku rastîya Rojhilata Navîn e, şêweyê jîyankirinê li dijî serdestan wekî têkoşîna gelên şerker, Rojbîn xwedî zanîne ku di nava şerê azadîya kurd da cih girt. Berîya her tiştî, nêzîkatîya ji mirov ra, di PKKê da dît. Wê xwest ji tenêtîya mezin ku kurd dijîn ra bibe hevkar. Haya wê jê heye ku têkoşîna PKK û seroketîya wê didin meşandin, Kurdistan borandîye, tevahî Rojhilata Navîn digire nava xwe. Ji gelekî

cûda ye, lê tevgera azadîya kurd, PKK, ji bo wê felsefeya jîyan û nasnameyê ye.

## Meşa Wê Ber Bi Azadîyê Ve Ye

Di cîhana me ya îroyîn da rastîya civak û mirov rewşeka ne dîyar dijîn,  Rojbînê yek ji wan e ku yên guh da PKKê ku wekî dengê banga azadîyê ye. Dema derbasî nava refên gerîla dibe, bi gavên yekem ra dibin gavên hebûnê, meşa wê ber bi azadîyê ve ye. Her ku

îdeolojîya Azadîya Jinê ya di PKKê da nas dike, hîn baştir hem cîhana nû û hem jî ya rabirdû fêm dike. Her ku bi PKKê ra jîyan kir, tiştên ku wekî jin nedîtibûn li hemberî ferzkirinên sîstema paşverû fêm dikir. Rastîya gotina serokê gelê kurd Evdellah Ocalan "Ger azadîya jinê pêk neyê azadîya civakê jî pêk nayê" bi kûrahî hîs dike û di nav refên gerîla da dijî. Weke layîqî wê ye bi salan li qadên Botan, Zagros û Behdînanê dijî. Di gerîlatîya xwe da jî gelek şopan dihêle. Hevalên wê ku bi hev ra li ser her rê û resmên çîyayan dimeşîyan, ji parvekirin, hevaltî, şervantî, dilsozî û ramanên wê yên kûr bandor dibûn. Dilsozî û hezkirina wê bi hevalên xwe ra di her warî da dida hîskirin. Ji yên ku salên herî zehmet di şer da jîyan kirîye, lê tu dema di kêlîyên herî zor da moralê xwe xirab nedikir. Kenê li ser rûyê wê qet  kêm nedibû. Coşa xwe, moralê xwe dida şer

jî. Çûna her çalakîyekê  wekî tevlî dîlanê dibe diçû. Ji bo Rojbîn, çîyayên Kurdistanê ku lê azadîyê hîs dike, bi qasî rastîya jîyanê dibe cihê ji nû ve jidayîkbûnê.

## Neketim Kurdîtîyê Ji Ber Ku Ez Kurd Im

Di PKKê da, rastîya ku herî zêde bandor li Rojbînê kirîye rastîya rêberê gelê kurd Evdellah Ocalan e. Bi taybet jî girîngîya ku daye îdeolojîya jinê ji alîyê rêberê gelê kurd ve tê bipêşxistin û dibe cudahîya herî bingehîn ya PKKê ji tevahî tevgerên şoreşgerî, ji Rojbîn ra jî wekî tevahî gerîlayên jin dibe xalek ji xalên girêdanê. Taybetmendîyên ku ji jîyankirina di nav civakek îslamî da mezinbûn, bi xwe ra hinek hişmendîyên bi pirsgirêk tîne. Rojbînê li gel çaresekirina wan bi Îdeolojîya Azadîya Jinê ya ku di PKKê da dixwest hîn zêde di warê analîzî da kûr bibe, wî tiştî dihêşt ku li beramberî jîyanê hîn zindî û bi kelecan be. Êdî ji bo wê azadî hîn nêztire û sira jîyanê hatîye çareserkirin. Di nav tevgera azadîya kurd da ye, lê rastîya civaka xwe ya ereb hîn baştir fêm dike. Fêm dike ku ferzkirina bi salan ya rastîya êl û malbat girêdana bi sîstemê ra ye. Rojbîn, piştî demekê ku di nav refên gerîlayan da ma, berê xwe dide Şamê. Di akademîyên perwerdeyê yên ku rêberê gelê kurd Evdellah Ocalan ava kirîye da salekê dimîne, tiştê bi xwe ve girêdayî çareser dike. Di gerîlatîyê da şer tenê di hêla leşkerî

da fêm dike, di akademîyên perwerdeyê da dibîne ku şer li dijî hişmendîya paşketî ye jî. Ango dibîne ku şer ji dîtina derveyî kûrtîr e. Lêgerîna mirovê wenda ye û PKKê têkoşîna dîtina wê ye.

Di perwerdeyên akademîyê da derxistina rastîya mirov di PKKê da nas dike û di dîyalog û axaftinên rêberê gelê kurd Evdellah Ocalan da fêm dike ku PKKê ne tevgerek gelêrî ya ji rêzê ye. Di perwerdeya akademîyê da, dîyaloga bi Rojbînê ra, rêberê gelê kurd jê ra wiha dibêje: “Em dikarin wekî bûyerek şoreşgerîkirina keçikeka ji çanda civaka ereb hatiye binêrin?... PKKbûyîn ne tiştekî xerab e. Lê belê xwekaşkirin neke. Erebekî baş çawa dibe, girîng e ew pirs. Lê ya herî girîngtir mirovekî baş çawa dibe, divê bê pirsîn? Ez pirsa kurdekî baş çawa dibe? Qet ji xwe napirsim. Li gorî min APO tenê mirovekî baş e… Bê guman ne ji ber ku kurdbûm ketim nav kurdîtîyê. Ji bo bibim mirovekî baş ketimê… Ger dixwaze wekî mîlîtan bimîne, divê xwe bide ber zehmetîyan. Hûn dê bêjin “Çima te barekî ewqas giran li me bar kir? “Min ew bar li we bar nekirîye. Encama biryardarîya daxwaza me ya ketina dîroka mirovahîyê ye. Ez tenê hesantir dikim, birastî ji we ra rêbertîyê dikim. Encamên vê biryarê divêt hûn îsbat bikin. Dema dibêje “An şer, an şer” divêt şer bizanibin; dema dibêje

“an serkeftin an serkeftin “ divê sekeftinê bizanibe, dema dibêje “an xweşik bibe an xweşik bibe “divê serkeftina wê bizanibe. Wekî din şirove ji wê biryarê ra nîne. Divê wê tiştî pir baş bizanibin.”

Jîyana wê ku bi gerîlayan û welat ve hatibû girêdan, ji bo Rojbînê bi perwerdeyên ku rêberê gelê kurd Evdellah Ocalan ra kok berda. Avadanîya wê ya kesayeta safî û paqij, wê ber bi dilsozîyeka ji dil ya armanca rizgarîya Rojhilata Navîn bi giştî û bitaybet jinên kurd ve dibe.

## Hûn Nikarin Roja Me Tarî Bikin

Navê Evdellah Ocalan ji bo hinekan navek e, lê ji bo gelê kurd û yên pêra hevaltîyê dikin ra azadî bi xwe ye. Qutbûna ji serok û hevalên xwe, tê wateya dawîya jîyanê. Ji bo wan zayîndarê jîyanek nû û ronîdarîya wê ye, ango Evdellah Ocalan rêberê gelê kurd, bibû “roja wan”. Yên gelek caran dixwestin wî tune bikin, carek din tevahî hêzên cîhanê girtin rex xwe, li hemberî yê di tenêtîya gelê xwe da şer dike xwestin `rojê` tune bikin. Pêvajoya ku 9ê çirîya pêşîn 1998ê dest pê kir, wê bibe hewildana tarîkirina rêya kesên ku di rêya azadîyê da dimeşin. Ya dixwestin tune bikin gelek bû û qutkirina rêya rêwîyên azadîyê bû. Dildarên azadîyê li hemberî komploya navnetewî ya ku pêş ket diqîrîyan, wê bê deng nemînin. Bi pêvajoya ku

rêberê gelê kurd Evdellah Ocalan derket Ewropayê ra, bi dehan şervanên azadîyê çalakîya “***Hûn nikarin roja me tarî bikin”*** bi pêş xistin. Di serî da li zîndanên Tirkîyeyê û li her derê ku kurd lê dijîn, çalakîyên fedayî û xwe şewitandin wekî nîşandana hêrs û dilsozîyê bûn. Di nava gerîlayan da jî banga çalakîyên`Hûn nikarin roja me tarî bikin` Rojbîn bû.

Ji Rojbînê ra bi rêbertîyê xwe ra heyîn, bêyî wî jîyankirin ji xwe ra xîyanet dîtin bibû rêgez. Li beramberî komploya navnetewî li hemberî sîstemê hêrsa xwe bi çalakîya xwe ya mezin dixwaze nîşan bide. Dema ku ji hevalên xwe ra dibêje: “Li dijî komploya navnetewî nikare bêdeng bimîne û dixwaze çalakîya xwe ya fedayî bike”, hevalên wê li pêşberî biryardarîya wê neçar dimînin ku qebûl bikin. Rojbîn ji bo ku çalakîya wê encam bigire, bi rojan prova dike. Hevalên wê bi matmayî li kelecan û bê sebrîya wê temaşe dikin. Di amadekirina plansazîya çalakîyê da, her tiştî ra mijûl dibe. Amadekirina teqemenîyên ku wê li bedena xwe bigerîne, yek û yek dişopîne. Gelek caran ketibû çalakîyên ku bi mirinê ra rû bi rû mabû, lê hem wê hem jî hevalên wê baş dizanîn vê carê veger tune ye. Rojbîna ku di zanebûna çalakîya dîrokî da bû, ji hevalên xwe ra digot: “Ji bilî qutbûna ji hevalan, ji vê jîyana xweşik, tiştekî ku ez wenda bikim tune ye!.” Li beramber

xemgînîya kûr ya hevalên wê, ew her  rû bi ken bû û her tim moral dida hevalên xwe.

## Dikeve Nav Yên ku Ji Nû Ve Dîrokê Dinivîsînin

Dema roja ku wê ji hevalên xwe qut bibe hat, Rojbîn hevalên xwe yên di rêza leşkerî da disekinîne, yek û yek hemêz dike. Cara dawî bi wan ra hestên hevaltîyê par ve dike. Ew, piştî rojên zor û zehmet ên gerîlatîyê ku bi salan di heman çeperan da bi hev ra têkoşîna azadîyê meşandibûn, dest dabûn  hev, ji hevalên xwe vediqetîya. Dema ji bo çûnê dikeve hereketê, hevalên wê bi hestên biêş û bi zehmetî ji wê ra tîlîlîyan dikin. Cara dawî li Rojbînê dinêrîyan, ji bo nîşandana dilsozîya xwe ya bêdawî. Ew ji zû da ketibû rêçikên zirav yên çîyayê Cilo. Her ku Rojbîn ji hevalên xwe dûr diket, bêdengîyek û xemgînîyek diket holê.

Rojbîn, li gel rêberekî, ji bo biryara xwe pêk bîne, digihije gundekî Geverê. Ji ber bûyerên ku diqewimîyan wê demê dijmin li Geverê jî  tevdîrên awerte yên ewlehîyê danîbûn. Ji ber ku fersenda tê xwestin nehatîbû  bidestxistin, rêberê wê soz dabû  Rojbînê wê çend rojan bimînin û wî vegerîne û ew  piştra dîsa anî cem hevalên wê. Şûnda vegerandin ji bo Rojbînê rewşeka nayê qebulkirin e. Her dem rûkenîya wê ji ber ne

pêkanînîya çalakîyê ketibû bêmoraltîyeka nayê tarîfkirin, bala hevalên wê dikşand. Dema digihije ba hevalên xwe, ji ber operasyon ku nû hatîye destpêkirin, herkes diçe herêmên bi ewleh, lê ew bi çend hevalên xwe û rêber ra diçin cihekî din. Di radyoyê da her kes li bendê bû ku operasyon biqede, lê nûçeya ku Rojbînê çalakî pêkhanîye dibhîsin. Di Dîroka 17ê çirîya pêşîn 1998ê tevlî karwanên ku ji nû ve dîrokê dinivîsînin dibe.

Rojbîn ji nav me ebedîyen qutbû, lê bi coş û morala girêdan û dilsozîya bi doza xwe ra çû Geverê.

Bi sedan jin mîna Rojbînê, Zîlan, Bêrîvan, Bêrîtan, Rahşan di nava Tevgera Azadîyê da li hemberî teslîmîyetê, îxanetê û tunekirinê, ala berxwedanê hilgirtin û di pêşîyê da meşîyan. Ger dayîna can be wekî yên berî xwe bêyî çavên xwe qurç bike ew can jî da. Li beramberî çalakîya Rojbînê tevahî çîyayên Kurdistanê bi rêzdarî dirawestin. Bi wêrekîya ku jîyana xwe ji heval û Rêberê xwe ra feda kir, hemû zindîyên li ser rûyê erdê bi windakirina keçeka ku serî li ber neheqîyê netewandîye serbilind in. Rojbîn pîrozîya axa Kenaan di kûrahîya Mezopotamyayê da vediguherîne jîyanê. Bi hişmendîya ku di her kêlîyê da divê bê kirin ra dibe pusuleya paşeroja gelan û hevala "Rojê" ya heta bi hetayê.

**Rêberên Gelan Kulîlkên ku di Dilê Gelan da Şîn Dibin In**

Kamuran Qendîl, 21ê çirîya paşîn 2003

Tîrêjên destpêkê yên roja ku ji lûtkeyên Çarçelayê ji nû ve derdiket, di nav ewran ra xwe berdida Gelîyê Serpelê. Li lûtkeyên Cîlo jî birûsk dibiriqîn û baranek nerm dihat xwarê. Bêhna axa şilbûyî wekî lewenterê her der tijî kiribû. Kevirên reş yên metalî, ji her demê bêhtir reş xuya dikirin û dibiriqîn. Em rastî xezeba perçeyek ewiran hatibûn. Gihayê heliz yê hişkbûyî, li ber bayê bi erdê ra kaş dibûn. Vê demê ba wekî ku dilan mistdida laş dipêça. Em dibûn şahîdê rojek ji rojên ku li Zagrosan çar demsal bi hev ra dijîyan. Li ser lûtkeyên Cîloyê dihirmijî berf dibarî, li jêrê baranên biharê dibarîya, li başûr germeka bijirandinê hebû, hemû ketibûn kêlîyekê. Di kûrahîya newalê da berfên sedsalan ku ketibûn ser hev, wekî çîyayekî cemedê li pêşîya me disekinî. Car caran perçeyên ku ji çîyayê cemedê qut dibûn wekî teqîna guleyên hawanan deng vedidan. Û bixof bû. Ji nişka ve qutbûna baranê bi xwe ra çêja payîzê dihanî. Bedewîya bi îhtîşam ya keskesorê ku li pişt baranê veşartî bû, li asoyan xuya dikir.

Hevalan bi dengê ava sûlavê ra rengê hev dihilbijartin. Me jî bi vexwarina kasek çayê hûndirê xwe germ dikir û plansazîya derketina peywîra êvarê dikir. Di bin şert û mercên giran da me

amedekarîya bi cihbûna zivistanê dikir. Em bi dev û diran dixebitîn. Me ev tişt rixmî çîyayên asê, derbaskirina rêyan zehmet dikir. Nêzîkbûna zivistanê, barîna baranê, karê me zêdetir zehmet dikir. Nedibû ku em xebatên xwe dereng bixin. Pêwîst bû em wekî mîrû bixebitin.

Komek heval ji bo birêxistinkirina kar,  amedekirina erzakên ku em dê bînin pêş da çûbûn. Ber bi êvarê ve me sewalên xwe yên bar komî hev kirin û em ketin rê. Tengava Karwan bilindahîya destpêkê ku em derbas bikin bû. Dema em gihan tengavê me sîng da ber bayên bakurî û me porê xwe bi wî şe kir. Bi zehmetî em dimeşîyan, me dixwest bi lez tengavê derbas bikin. Qutkirina ba ewqasî zehmet bû. Cilên me bi me ve zeliqî mabûn. Xwelîya ku ji erdê radibû bi bayê ra wekî şeqamekê li rûyê yên li paş me dihatin diket. Çav korîşkirî, dest wekî mertalekî li pêşîyê hatibû dirêjkirin. Wekî avgerekê kendavê ber bi xwe dikişand û meş her zehmettir dikir. Her ku ber bi jêr ve dadiket hêza bayê kêm dibû û nermtir dibû. Hema li jêra me gola Sergerê bi xuyandana xwe ya şînok gelekî xweş bû. Li ser rûyê avê ya dibirîqî ordekên şîn avjenî dikirin. Dema ku pêlên biçûk li gel tîrêjên rojê dighîştin hev û bû çirrûkên biriqandinê, li ber çavan vedikirin. Li ser rûyê avê ku dibirîqiya werdekan avjenî dikirin. Dema heval di şiverêyek zirav ra

dimeşîyan, ji bo dîtina koma ku hatiye pêşwazîya me, min di kurterêyekê ra ku sewal nikarin tê da bimeşin ra xwe berda.
Her ku çû ez nêzî golê dibûm bi meşa di nav zinaran ra. Dema qefleyên werdekan vê yekê dibînin baskên xwe lê didin û ji ser rûyê gola şîn, ber bi asîman ve firîyan û bidûr ketin. Li kendalên hemberê sîya wan dihat xuyakirin. Şiverê her ku diçû teng dibû, hin caran jî wekî ku wenda dibû bû. Ji bo ku wextê wenda nekim, min şiverê hêşt û yekser min xwe li nav erdan da. Pir neçû ez gihiştim serê ava ku wekî sûlavekê ji perava berfê diçû golê. Ji bo ku avê vexwim min her du enîşkên xwe dan ser keviran û min xwe xwarkir, têr av vexwar. Ji nişka ve ji ber sarbûna avê lêvên min tevizîne û di ruvîyê xwe da serma hîs kir. Rihetîyek mayxoş dabû laşê min yê westîyayî. Êşek sivik di serê min da diçû û dihat. Ev şansek herî mezin bû ji bo min ku ji van avên sar yên ji zozanan diherikin vexwim. Min bi destên xwe çokên xwe daweşandin û paşê rêya xwe domand. Min xwe li bilindahîya li pêş xwe xist derbaskir û dîsa giham rasteyeka din. Li vê rasteyê li perava golekê li gorî ya din hîn biçûktir û germtir bû meşîyam. Di rojek tenha da bi bayê hênik ra gav bi gav ber bi pêş ve diçûm. Di kûrahîya dilê min da û li ser lêvên min gotinên sitraneka ku wekî nameyekê ketibû ser bi tenê û bi tena serê xwe dipispisand. Min xwe ji rasteyê berdida

kendalekî bi kevir, di rewşeka min xwe tevlî gotinên sitranê kiribû ku haya min jê nebû. Ji ber êşandina ji êşa di lingê min ya romatîzmî da veciniqîm. Bi salan bi vê êşê ra jîyan dikim, dema dadikevim ez lingê xwe bêyî di kabokê da bişkînim û carna jî li ser lingekî hildipekim û wisa dimeşim. Bi sarbûna hewayê ra romatîzm hîn zêde har bibû û ez diêşandim. Ji bo ku lingên xwe hinek rihet bikim li ser kevirekî rûniştim. Ji alîkî ve bi destekî min kaboka xwe mist dida bi destê din jî ji bêrîka xwe kîsikê tûtûnê derdixist. Cixareyek sitûr min pêça û nefesên kûr dikişandin, paşê duman berdida derve. Li ber min jî gola sêyem ya herî mezin ya çîyayê Cîlo bi rengek şînekî reş dihat xuyakirin. Mîna abîdeyekê di nav çîyayên bê ser û bin da xuya dikir. Wekî her du kefên mêzînê her du gol disekinîn. Sergere û Gola Zeytûnê pir xweşik dihatin xuyakirin. Cihekî geşt û gûzarê bû. Wekî giravên di nav perçeyên kevirên ku ji çîyayên bilind qutbûne da bûn. Gîyayê sîrik ku li derdorê hatiye, çêj dida sifra me. Ji kevîyên ku berf vekişîya bû guldexwîn, berfîn wekî eserekî her der rengîn kiribûn. Gola ku di zivistanê da dicemidî ancax di nîvê havînê da vedibû. Tenê di heyvên havînê da mirovan dikarîyan biçin ser golê.

Dema min hinek mirov li ser golê dîtin ku digerîyan, min bi dûrbînê nêrî ku heval in. Min çeka xwe ya li ber zinaran hilgirt

û hêdî hêdî ketim rêya xwe. Dema ez ji wan nêzîk bûm, min dît ku li gel wan hevalên ku me di pêş da şandibûn, hinek hevalên jin jî hene. Tiştekî sosret bû. Divîyabû heval li cihê erzaqê bûna. Çi karê wan li vir heye? Wekî vê pirs di serê mi da çêbûn. Ji bo serdanê hatibûn. Lê na! Erê erê ancax ji ber serdanê dikarin werin. Li vir ji bilî hevalên jin ku dixebitîn herkesî ez dîtibûm û li alîyê min dinêrîn. Ew nêrandinên wan bixwaze nexwaze zextek li ser min çêdikir. Min dixwest rêya xwe bidomînim, lê ji ber şermê min nedikarî. Dema giham rex wan nefes binefesê mabûm. Wekî tişta herî zehmet bû. Meşa li hemberî girseyekî. Weke ku hemû çav li ser te ne û hemû liv û tevgerên te gav bi gav têne şopandin. Ji bo lewazîtîya xwe nîşan nedim baldar im ku min dikir bikevim. Dema min heval silav kirin, hinek hevalên jin jî min nas kirin.

Di wê kêlîyê da, heval Rojbîn ku bi dengê qelebalixê ferq kir, li paş xwe zivirî. Xwest bizanibe ka çi diqewime. Destên xwe li hev birin anîn, ji bo ku paqij bike çû ser golê. Piştî baş şûşt şûnda zivirî gel hevalan. Ev sîma ji min ne xerîb bû, wekî ku ez nas dikim bû. Her ku nêz bû dilê min lêdida nefesa min teng dibû. Di hûndirê min da pêlek kelecanê dest pê kir. Hest diketin pêşîya hişê min. Li ser rûyê min berkenîyek çêbû, çavên min vekirî diman. Şerm wekî nexweşîyekê giranîya xwe

li ser min çêdikir her ku nêz dibûm. Di hêla din da jî wekî tenhayek okyanûsek kûr bi dilekî zelalîya zarokekî dikenîyam. Bi çavên berkenî her nêzî me dibû. Ya dihat sîlûeta hevaleka ku bi salan di labîrentên ne dîyar da min wenda kiribû bû.

Hatina wê ya ber bi min ve birûkenî, wêrekî dida min. Hêdî ewbûna wê teqez dibû. Bi gavên piçûk ber wê ve çûm. Dilê min mezin bibû, bi qasî min ne dizanî ez dimeşim ketibûm xeyala kûrahîya demê û hemû bala xwe dabû ser mirova li pêşberî min. Belê ew e! Ew bi xwe ye. Ne xeyalek bû. Heya niha li kû bû? Çawa çêbû di demek ne li bendê, li cihekî ne li bendê derket pêşberî min. Çendî dem bû, me hev nedîtîye? Lê wekî ku doh bû her tişt tê bîra min, bibîr tînim. Pênc sal me li pey xwe hêştibûn. Wekî bîranînekê di ber çavên min bihorî. Ji bilî demê tiştek nehatibû guhertin. Lê niha di navbera me da çend gav hene. Weke rêyek bê dawî dihat xuyakirin. Mîna ku min dengê dilê xwe dibihîst, dilêmin wekî daholekê lêdida. Xwêdaneka sar ku ji westandinê û ji kelecanê bi destê xwe min paşkir.

Dûvra roja yekem ku me hev û du nas kir hat bîra min. Em bi hev ra tevlî partîyê bibûn. Ji berî min partî nas kiribû û pejirandibû. Bi eslê xwe ereb ji zanîngehê tevlê bibû, bi kesayeta xwe ya dilnizim û têgihiştî, di demeka kurt da hatibû

hezkirin. Min jê ra digot xwişkê. Bi sal jî sê-çar salan ji min mezintir bû. Dema em tevlî partîyê bûn ji wê hînbûm ku divê li şûna xwişkê bibêjim heval. Carina min ji bîr dikir digot xwişkê. Dûvra min lêborîn dixwest û digot heval. Carna jî di qirika min da dibû mîna girêkekê û dernediket ew gotin. Ew jî dikenîya. Min jî şerm dikir. Bi demê ra gelek tişt ji wê hîn bûm. Hesreta wê ya azadîyê bilind bû. Kevneşopîtî red dikir. Nediperjirand, serî hildida.

Pratîka yekem, em bi hev ra bûn. Ji çalakîyê ra, me amadekarî dikir. Bi sedan hevalan dîlan digerandin. Bi kelecana çûna çalakîyê. Kilam digotin, tîlîlîîî dikirin, li erdê toz radikirin û wekî mijekê  ber bi ezman ve hildikişîya. Mîna levbazîyekê ka kî wê kê biwestîne wisa dîlan digerîya.

Cara yekem ketim dîlanê. Lîstikvanekî nezan bûm. Her tim li paş dimam. Min lingê xwe li gorî wan dilivand, da ku hîn bibim. Lewma her tim di rêza dawî da dimam. Heya min bala xwe dida destê xwe, min lingên xwe ji bîr dikir, heya min bala xwe dida lingên xwe, min destên xwe ji bîr dikir. Min nedikarî lingê xwe li wan bigrim. Û her tim virda wêda dihejîyam. Mîna keştîyarekî ku vala vala bîra xwe dihejîne. Lê li gorî xwe min digot ez baş dilîzim. Dîlan her germ dibû. Min carekê dît yek ji pişt ve dixwaze têkeve destê min. Dema min serê xwe zivirand,

min dît heval Sewra ye. Min cih da û ketin destê hev. Bi hev ra me dîlan digerand. Li min dinêrî û dikenîya. Wê jî nû dixwest hîn bibe. Tu ferqa wê ji min nebû. Dema du acemî werin gel hev, lîstik ji hev dikeve. Li ba wê tiştekî normal bû, lê li ba min ji şermê sor û mor dibûm. Li ser acemîtîyê dema şermbûn jî ketê, hêdî hêza min nema ku di dîlanê da bimînim. Hema min dixwest ku ji dîlanê derbikevim. Her ku şerm dikim, her ku dîlanê xera dikim. Di navbera derkevim dernekevim da diçûm dihatim.

Li gorî kenveşopîya civakî, dema keçek di dîlanê da ket destê te, tu dîlanê berdî, wekî heqaret tête hesibandin. Ev fikirandin nedihêşt ku derkevim. Ez demekê bi fikirandina hinekî wext derbas bibe ez destûr bixwazim û wisa derkevim da bûm. Deh deqîqe derbasbûn, di nav xwîn û xwêdanê da mabûm. Hêdî nema dikarîm rakim. Nema hêza min têra rakirinek ji wê zêdetir dikir. Wekî ku fêmkiribû ku ez dixwazim derbikevim carna li min dinêrî.

Ji nişka ve gotunek ji devê min derket. Ger tu rê bidî ez dixwazim derkevim xwişkê. Mîna ku hûndirê min dixwend bi ken got dibe tu dikarî derkevî. Wê demê wekî ku ji ser min barek rabibû. Mîna çûkekî sivik bibûm. Li kêlekekê mam. Min xwêdana xwe zuha dikir. Ji dûr ve dema hevala Azîme dît ku

ez ji destê heval Sewra derketime gazî min kir. Bi awirên hişk û piro hildayî ji min pirskir? Çima ji destê Sewra derketî? Bi metirsî min got ji ber ku nikarim dîlanê bigirim derketim. Ne bersîvek ku wê qaneh bike bû. Dema dît ku tirsîyame, kenî û axaftina xwe domand; te şerm kir û wekî feodalekî nêz bûyî. Di heman demê da bi dîlangirtina bi jinekê ra ji te ra zehmet bû. Lê belê ew hevala te ye û hûn bi hev ra tevlê bibûn. Wê got: “Ew ne şerm e”! Tiştê hatiye qewimandin hîna jî min fêm nekiribû. Min ji xwe ra digot xwazî erd biqelêşe û ez têkevim. Min serê xwe xwar kirîye û hevala Azîme diaxife û guhdar dikim. Rexneya yekem min ji wê girtibû. Ji wê rojê û vir da tu carî bi tu awahî neketim tu dîlanan. Her dem ji dûr ve lê dinêrim. Carekî din şermbûnîyek wisa naxwazim bijîm. Piştî du salan li gel hev man ji hev qutbûn. Û a niha bi ken ber bi min ve tê. Bi awayekî şermokî sekna min ya kevin anî bîra min. Lê bi xwe demek dirêj derbas bibû, têgihiştî bûbûm û bibûm şeroşgerekî profesyonal. Bi her awahî min xwe amade dikir. Di jîyanê da pijîbûm û bi xwe bawer bûm. Ti astengîyên ku wêrekîya min bişkîne nebû, lê hevdîtina bi hevalek jin ez dabûm şermê. Min hîs kir ku di laşê min ra xwêdanên sar diherikin û hêdî hêdî dicemidîm. Ti nîşaneyên wêrekîyê li ser min nedihatin xuyakirin. Di kesayetîya wê da ez bi rastîyekê ra

rû bi rû mabûm û rastî hêla pîvanên feodalî hatibûm. Bêwêrekî û şermîya ku şaşîyan daye, ne ya rastîyan di min da dijîya. Di ser keviran ra  xwe avêtina wê dida xuyakirin ku wekî çûkekî basksivik dihat. Çirûska di çavên wê da û kenê li ser rûyê wê ruhekî ku ji laş veqetîya ye, ji hemû qirêjîyên dinyaya maddî paqij bûye, gihaştî aramî û fezîletê dida şirovekirin. Lê ez di rewşeka wisa da nikarim wê tiştî ferq bikim ji ber ku stûyê min xwar e. Bîryardarîya wê ez dipelixandim û diçû. Nola ku rastî bibûn esîrê wê. Destê ji min ra hatiye dirêjkirin min girt û silav kir. Piştî pirskirina hal-xatir wekî yeka ku ketibe şerkirinê rihet dibûm. Nêzîkatîyên wê yên rihet û serbest ez jî bi xwe ra rihet dikirim. Biçek be jî bû alîkar da ku şermîbûn ji ser min rabibe. Gelekî mezin bûme hema nema dikarî min nas bike dubare digot. Rixmî gelekî li min pirsyaye, li ser min xebera ku şehîd bûme bihîstibû. Bi awayekî baldar ez di bin çavan ra derbas kirim û bi ken û dilxweşî dîlangirtina min ji hevalên hawîrdorê ra got. Di her halê wê da dida dîyarkirin ku heman coş û kelecanê dijî. Ji hevalên jin ra hîna tu dibêjî xwişkê, bi awayekî henekî got. Hêdî sohbeta me xweş bibû dimeşîya. Bi gavikên biçûk em ketin hûndirê mangê. Dûvra ji mangê derket vegerîya bi destê wê da tebsîyek biçûk hebû. Li ser wê hinek xwarin û çend peyalên çayê hebûn. Gote min: “Te xwarin nexwarîye” û

xwarin danî pêşîya min. Ew jî bi min ra li ser sifrê rûnişt. Min spasîya wê kir û got: “Ez ne birçî me” û min xwarin xwarîye, lê ji ber birçîbûnê tu dibêjî qey hinek zikê min dikolin. Ez di ferqa ku divê bi lez bikim da bûm. Min gotê divê bi zêde dem neborînim û xwe bighînim hevalan. Wê jî got: “Piştî ewqasî emanê û me hev û du dît ti dê xwarinê nexwê û biçê, qet çênabe. Li ezmanan li te digerîyam min tu li erdê dît, ger em bi hev ra xwarinê nexwin te bernadim.” Heya wê rojê kêm caran bi hevalên jin ra min xwarin xwarîye. Her çiqasî zehmet be jî li hemberî van daxwazan berxwedanî bê feyde ye. Min dixwest bi çend kevçîyan xwe jê xelas bikim, lê her tim xwarin datanî ber min û wisa xuya dikir ku nikarim bi hêsanî xelas bibim.

Dem wekî avê diherikî. Ger bi destê min ba minê derzîya saetê bida sekinandin û dem rawestanda. Lê belê hêza karibim demê bisekinînim nebû bi min ra. Wê gote min: “Hîna ew fedîbûna te heye”. Min jî jê pirs kir tu nikare were bolûka me, got ez dê bihatama, lê niha hat rawestandin. Got: Ez dê ji bo xebatek cuda biçim, li vir ne mayînde me. Ji qotîyê cigarek pêça da ber min. Dûvra ji xwe ra pêça. Tu dibînî çawa baş dipêçim, ji min pirskir û domand; tê bîra te ew cixare dema em nû hatibûn an li qeleman an jî li darikan me dipêça û piştra me tûtûn berdidayê. Her çiqas hinek ji wan quldibûn hinek stûr û baş nedihatin

leziqandin, lê kişandina wan xweştir bû, bi kelecan bû. Destpêka her tiştî wisa xweş e. Destpêkirinên yekem, fêrbûnên yekem, naskirinên yekem hîn bikelecan û binirx bûn. Piştra normal dibe, dibe tiştekî ji rêzê. Li şûna wê hewesên cuda cih digirin. Ya girîng jî ew e, her rojek wekî destpêkek nû dîtin û divê ew roj baş were dagirtin. Li pêş me hîna gelek roj hene em dê bijîn. Divê bi her yekê ji wan ji ya din bi watedar be. Divê dem ji bo me pîroz be. Dibe ku em nikarin demê rawestînin lê watedarkirina wê di destê me da ye. Çîya nikarin bighêjin çîya, lê mirov dighîjin hev. Dîtina te li vir di hişê min ra hîç derbas nedibû. Lê ji vir û pê da em dê demek dirêj li gel hev bin digot. Dem dibihorî. Min katjimêra xwe meyzand ji bo rabûnê min destûr xwest. Dema min kêm ma û divê xwe bighînim hevalan. Min got ger hûn karibin werin bolûka me yan nikaribin ez dê carek din li vegerê di vir ra derbas bibim. Min jê ra got cihê seyrana we bedew e, hûn çêja devê xwe dizanin û min xatir xwest. Ji bo ku li vegerê rêya xwe bi wan bixim ez hişyar kirim. Her tişt ketibû demeka kurt. Got xwezî tu hîna zûtir hatiba. Ger min bizanîba ez dê zû bihatama, lê soz di vegerê da ez dê carek din werim.

Sed metre li pêşîya min hevalê Kendal hebû, çûm gel wî. Piştî ku li ser erkê nîqaş kir destê xwe danî ser milê min û got: “Tu

dizanî çima em li vir in”? Na nizanim! Ya din jî ma ne diviyabû hûn li pêş bana. Rast e diviyabû em li pêş bana, lê rewş hat guhertin. A niha em amadekarîya çalakîyê dikin û wê baş be ku vê yekê bizanibe. Me berê ji bo çalakîya fedayî nîqaş kiribû tu dizanê, a niha em plansazîya wê çalakîyê dikin. Ya wê çalakîyê bike jî hevaleka jin e. Navê wê çi ye, kijan bû? Navê wê Rojbîn e. Te nas kir? Na heya niha min navekî wisa nebihîstîye. Min nas nekir. Ew a ku kurtikekî kesk li xwe kirî, erê ew a, ev e.

Serê min tevlî hev bibû. Nêzî deh hevalên jin hebûn. Ji wana kijan bû. Min bîra xwe vegerand. Min dixwest bi bîr bînim. Min dikir nedikir nedihat bîra min. Navê Rojbîn ya kîjan hevalê be eceba, fikirîm, lê min dernexist. Lê pê dihesîyam ku tirsek ketîye nava min. Hêdî lerizînek ketibû destên min. Fikra min ji laşê min veqetîyabû û serê xwe rakiribû derketibû. Hêdî min erka xwe ji bîr kiribû. Kurmek ketibû nava min ji hûndir ve ez dixwarim. Gelo kî ye? Kî ye ev mirovê xwedî wêrekîyek ku karibe vê çalakîyê bike ku bi zanebûn canê xwe feda bike? Nayê bawerkirin! Bi rewşeka ku hişê min nedigirt ra rû bi rû mabûm.

Piştra fikirîm dema mirovek dibe perçe perçe dirhem dirhem û fikirandina bi wê çiqasî metirsîdar bû. Min xwe xist şûna wê.

Bi kêlîya ku ez dê bikim fikirîm. Ez wê hêzê di xwe da biafirînim. Dilê min rawestîya û nefesa min qut bû. Hêza min ya heyî jî min wenda kir. Di gelek telûkan ra derbas bibûm. Di her awayên çalakîyan da min cih girtibû. Min mirin dabû ber çavên xwe, lê ronîya di dawîya tunêlê da her tim wêrekî dida min. Her tim mirin û jîyan di hevsengîyekê da dimeşîyan. Her çiqas carna mirin hîn nêzîk bû jî lê şansê jîyanê ji binî da qut nedibû. Lê ev çalakîyek û hestek cuda bû. Ji sedî sed di xwe da mirin dihewand, şansa jîyanê tune bû. Mirin bi xwe veqetîna mirov ji jîyana bîyolojîk bû. Bi tu carî mirov nikare cesaretî wê bijêrekê bike. Ji bo di nava Partîyê da bê azadkirin û li ser bedena xwe ya mirî gel û neteweyekê biafirînin, dihat wateya ji nû ve jîyanê.

Tişta ku her kesî dixwest ev bû, lê tenê yên dikarîn di pratîkê da berdêlê bidin dighiştinê. Herkesî jî pêdivîyên wê nedikir. Piranîyên ku dikirin jî di geşedanan da bibûn pêlikek, lê di dîrokê da şop nedidanîn. Tenê bi awayekî çalakî diman. Şert û merc dem û cih ya şêweyê çalakîyê bingeha çalakîyên wisa ne, ez di zanîna wê da bûm.

Rêya ku têra dimeşîyam weke ku ne li ser lingên xwe, li ser hestên xwe birêve diçûm. Dilê min bibû deryaya hestan. Min dixwest ew şev bibe kêlîyek û biqede. Her tim ji ber

westandinê û bêxewîyê bêhal diketim. Lê ev şev cuda bû, ne westîyayî bûm. Xew nediket çavên min. Di serê min da gelek hest lihev digerîyan. Gelek pirs bê bersiv mabûn. Ew kî bû? Ji hevalan qetîyam û di pêşî da dimeşîyam. Ji demên kêm bû ku li pêş dimeşim. Fîzîka min giran bibû. Di meşa lez da min zehmetî dikişand. Û her li dawî dimam. Êşa di lingên min da hêdî min hîs nedikir. Sitêrkan şeva tarî xemilandibû. Kadiz dirêj dibû û diçû. Şivîla zirav di nav gîhayên zer ra dizivirî. Çîyayên ku ji dûr ve wekî sîyî dihatin xuyakirin digihîştin sitêrkan. Bi vîze vîza bayê ra min rê distand. Şewqa ronîyên Geverê xwe dida Mergezerê. Di rêveçûnê da ronî dida me. Ji bo em pêşîya xwe bibînin hêsantir dikir. Peywira me bi serkeftî derbas bibû û em dizivirîn. Dikir nedikir ji van hestan xelas nedibûm. Xwêdana ku ji min diherîkî, ez bêhal dihiştim. Hêdî hêdî diwestîyam. Ey xweda çîye tawana me? Ji xwe ra digot. Di vegotina wê çalakîyê da ez jî amade bûm. Li hemberî israrîya wan her du hevalên jin rêvebirî bêçare mabû. Her yeka ji wan dixwest berîya ya din biçe ser çalakîya xwe. Belê yek ji wan hevala Rojbîn bû. Yê din jî ku min gelekî hewil dida hîn bibim, lê piştra hîn bûm ku hevala Berwar bû. Min bixwe ji xwe ra digot: Xwezî tevlî wê vegotinê nebibûma. Ji bo kêlîyekê be jî min nefesa xwe girt. Bi dengê ohh min xwe avêt

derva. Piştra fikirîm ku mirov hevalê xwe yê ji her tiştî bihatir bişîne mirinê! Hestek bi êş e. Di gewrîya min da bibû girêk û bê nefes dihiştim. Hêdî ji vê zêdetir min nedikarî rabikira. Ji birûyên min êstirek bi ser rûyê min da herîkî. Çima ewqasî zehmetî dijîyam, jêderka xwe ji ku digirt, rixmî ku mirovê ku diçe min ne li ciyekî dîtiye û ne jî nas dikim. Tiştê ku me bi hev ra girêdida ruhek e û kanîya wî ruhî jî di Apocîtîyê da diherike. Carek be jî min şansa dîtina Serok negirtîye û bi ruhê wî em dijîyan. Min silûetê hevala Rojbîn li ber çavên xwe zindî kir. Wekî miroveka zindî nedibû, wekî melekeka ku divê jê ra were îbadetkirin dihat. Te digot qey mirovek wisa nejîyaye. Rê nediqedîya. Li ber destê sibehê me sitêrka şivanan li pey xwe hêşt û em dimeşîyan. Bi dema berbangê ra em gihîştin girdeka Zeytînîyê.

Bi rêya cihazê gazî min dikirin. Digotin bi lez divê tu werî ser golê. Hevalan di rêya xwe ra domandin, lê dîsa ez ji rê derketim û min berê xwe da golê. Ji bo gihandina ser golê hîna çend deqe hebûn. Bê guman dema bigihîjim ser golê, tiştê yekem bikim ew bû ku ka ew kesa xwedî kurtikê kesk kî bû?

Tavê hêdî ji pişt çîyan serê xwe nîşan dida. Dengê refên kewên ku derketibûn ser zinaran, bêhna kulîlkên ku nû vedibûn ez mest kiribûm. Hêdî ji westandinê bêhal mabûm. Rûyê min zer

bibû û çavên min ketibûn kortê. Taqeta ku gavekê biavêjin nema bû. Serê min li ber min, bi awayekî gêjgêjok dimeşîyam. Carna wekî ku bikevim bi min dihat, carna jî li ser dev diketim. Wisa çend deqîqeyan dilebitî dimam. Bê sekin 14 demjimêr in ez dimeşîyam û tim li ser pîyan bûm. A niha ez gihabûm binîya golê, di rewşek normal da 5 deqîqe meş e, lê bi vî halî li ber min bilindahîyek 20 deqîqe mabû. Hêdî lingên min nikarin min hilgirin. Li ber avê sekinîm, şîşê pet min tijî av kir û xwê û xwêya tirş ku li hemberî her îhtîmalê timî bi xwe ra radikim, tevlî ava şîşe kir. Hindik be jî hinekî tansîyona min bilind kir û erka xwê bicih anî, hêz da min. Wekî bêrekê be, min bi serê çeka xwe girt, danî ser milê xwe û min rêya xwe domand. Axxx ew bilindahîyên dawî yên li ber nukteyên me! Ne ku nayên derbas kirin, belê têne derbaskirin, lê bi zehmetîyeka mezin. Ji ber wê min  dikir offf û offf. Bi hêdî hêdî bi bêhnvedanên kurt, giham ser gir. Rasteyeka biçûk, piştra digihîjim ba hevalan. Ji bo ku bi vê rewşa xwe ya perîşan neçim ba hevalan, hema li wir min xwe baş birêk û pêk kir û bi ava cemidî weke bûzê ye, min rûyê xwe şûşt, bi gavên qewîn meşîyam.

Ji bo ku xwe bidin ber tavê, heval derketibûn ser zinaran, lewra yekser çûm gel wan. Di alîyekî da bi hevalê Kendal ra nîqaş

dikir, di alîyê din da jî ji bo dîtina hevala kurtikkesk, min çavên xwe li der û dorê digerand. Li wir tenê hevalên mêr hebûn. Hevalên jin jî di mangayê da taştê dixwarin. Dema bihîstin ez hatime, hevalek jin gazî min kir da ku bi wan ra taştê bixwim. Min gotê ez dê werim, piştî min tekmîla peywîrê da, derbasî gel hevalên jin bûm. Dema bi hevalê Kendal ra ber bi mangayê dimeşîyam, min dît ku ji ber meşa dirêj û bê xewîyê ez helikandime, westandin ji birçîbûnê zêdetir bandor li min kiribû. Berî her tiştî min dixwest xew bikim daku karibim xwe lihev bidim. Min dizanî bi zikê birçî nikarim wê bikim. Hin tiştan bixwim û piştra xwe li cihekî dirêj bikim. Ew bû xwesteka min ya herî pêwîst. Her çiqasî min dixwest westandina xwe dîyar nekim jî lê di her halê min da dîyar dibû. Dema em gihan ber derîyê mangayê hevalê Kendal destûr xwest û em man li benda bersivê. Dema gotin: “Kerem bikin, heval” Kendal li pêş, ez jî li dû wî, em ketin mangayê. Dema em derbasî mangayê bûn, tiştê destpêkê bala min kişand hevala ku bi kurtikê kesk bû. Li min nêrî û kenîya û dema got quwet be, di dil û mejîyê min da wekî birûskek deng veda. Nava min xwîn digirî. Porê serê min qij bibû, çavên min derketibûn derve, hêdî min nedikarî bi tiştekî bifikirim. Di ling, kabokên min da derman nemabû, hêza ku ez li ser pîya dihiştim

nemabû, matmayî mabûm ji axaftinê qut bibûm, tenê min dixwest tiştên dibin fêm bikim. Ji nişka ve min hîs kir ku dîtinên min hemû şaş in. Tiştên min dîtibûn xeyal in yan wekî perdeyek ji mijê ye. Nabe ku rast be. Min şaş dîtibû. Yan jî min wisa dixwest. Daxwaza min, ji bo dilxweşîya min bû. Lê rastî li ber çavên min wekî xeyalekî disekinî. Êşên ku di qirika min da bûne girêk min dadiqultandin û bi nefesên kin diavêtin derve. Min gelekî dixwest ku kesek ji min ra bêje: Tiştên ku tu dibînî şaş in, ne rastî ne. Behaneyeka ku xwe pê bixapînim digerîyam. Dîsa min dixwest ew behaneya min bibe rastîyek. Bi dubarekirina quwet be ancex bi xwe hesîyam û min karîbû bersiv bida. Hîna jî dinêrî û dikenîya. Di nava kurtikê kesk da her dîtina ronîya çavên hevala Sewra nedihat hilgirtin. Lê navê wê ne Rojbîn bû! Wekî ez dizanim navê wê Sewra û me jê ra digot Sewra Ereb. Dibe ku kurtikê kesk ji hinekan sitandibe. Digot bi ser westandinê da çaya germ baş e, çaydanê ji bo ku germ bimînê li ser tûpê rakir û pîyale dadigirtin. Porê xwe li pişt kom kiribû û destên xwe vemilandibûn. Dema got bila şekirê we çawa be, hêdî min qebul nekir û gotê: Ez dê bi xwe şekir têximê, ji fedîbûnê, lê vala bû. Wê dixwest şekir têxe. Ku me bikşînê nava sohbetê, pirs pirs dikir. Lê bi bersîvên kurt min dixwest ji pirsan birevim. Dema hevalek jin gote min ku tu

heval Rojbîn ji berê da nas dikî? Heval Rojbîn got: “Em bi hev ra mane, du salan em bi hev ra man, lê wê demê biçûk bû a niha mezin bûye, hema min dikir nasnekim. Lê alîyekî wî heye qet nehatîye guhartin, wê demê jî wisa bû. Wer tê xuyakirin ku navê xwe guhartîye kirîye Rojbîn û ew kurtikê kesk yê wê ye, ne ji kesekî girtîye. Ji kêfxweşîyê dibû çar koşe. Wekî wê biçe cejnê bi kelecan, bitelaş û bêsebir bû. Li hemberî wê rewşê dîsa matmayî mabûm. Mirovê diçe mirinê divê bi fikar be, hinekî bi metirsî be û wê hestê dijî. Lê ev tabloya li ber me ne tabloya mirovê ku diçe mirinê bû. Li şûna wê ez ditirsîyam. Wekî ku ez wan hestan dijîyam. Ez diçûm mirinê. Rojbîn, di nava rojê da, dibezîya hemû karan, westandin çîye nedizanî. Di wê rewşê da jî bi hêza xwe ya henekîyê, dixwest heval bikenin. Û her tim dikir. Wê biryara xwe dabû, di biryara xwe da zelal û kêfxweş bû. Carna diçû gel hevalê ku teqemenîyê amade dike û alîkarîya wî dikir. Rojbînê teqemenî wekî pitikekî dikir destê xwe, hildigirt. Di çenteyê pitikan da bi cih dike, bal dikşand ser alîyê wê yên kêm û girîngî dida şikilê wê. Diçe cem hevalan. Bi nêrîn û helwestên tijî hezkirin û bêrîkirin ku heval di kîjan koşeyên dilê xwe veşartine. Hûndirê min dikelî. Ji bo ku her kêlîyekê ji wê rojê binirxîne û bi wate bike, xwarin çêdikir, çay çêdikir û bi hevalan ra nîqaşên germ dikir. Her gotinek wekî

şîretekê bi baldarî guhdar dikir. Min jî her guhdar dikir. Min axaftinên wê wekî avê vedixwar û di bîra xwe da tomar dikir. Lê wê dixwest roja xwe ya dawî ya bi hevalan ra têxe salan, her tişt dikir daku kêlî bi kêlî bijî. Lez dikir, wekî ku di randevuya firokikê da bû. Ji bo wê her tişt bi wate bû. Di wate û bêrîkirina roja dawî da bû. Bi carekê jî gotina mirinê ji devê wê derneket. Em dê hev û du bibînin, dîsa em dê werin gel hev, çalakîya ku ez dê bikim ne ji bo mirinê ye, ji nû ve jîyan e, ji nû ve zayîn e. Vê carê ez dê azad werim dinê. Tiştekî ku were wendakirin tune ye. Lê wê dîrok were bidestxistin. Gihandina kêfxweşî û fezîleta mirovbûnê ye. Li hevalan dinêrî wekî vexwarinê vedixwar. Têr nedibû. Wekî ku bi hinekan ra di levbazîyê da bû. Divê lez bikim. Divê ez çalakîyê berîya wê bikim.

Ew a ku qal dikir navek bû, sirek bû. Ew navê bi dizî bû ji berî yên pêwendîdar kesekî nedizanî.

Li ser zinarên dûr rûnîştibûm û min li wê temaşe dikir. Yêlekê zer daxistibû ser rextê li nava wê û virda wirda dilivîya. Heval mûdahele dikin, lê hevalan guhdar nake. Dem nemaye, gelek tiştên ku dixwest bike û pê fikirîyabû dikir. Ji kurdekî zêdetir kurd bû, wekî tîp jî gelekî dişibihî kurdan, paqij, dilsoz û xwedî jîrbûnek kûr bû.

Dem piştî nîvro bû. Di destê wê da wênekêş û gazî tevahî hevalan kir. Min tenê ji dûr ve li wan dimeyzand, ez ketibûm şîna ku di dilê min yê xwîn digirî da. Hestên tewanbarîyê ez ji hûndir ve diqedandim. Xwezî min nasnekiriba, xwezî em bi hev ra nemabana, min nedîtiba! Her ku min rûyê wê didît ji hûndirê xwe ve dimirim. Bi dizî min çend rondik barandin, daku kesek hîs neke bi desmalê dimaland. A niha wê ji nav me bifire here û carekî din venagere, bi destên xwe ez dê wê birêbikim, wekî çalakîyekî normal nêz bibim. Nema dikarim vî tiştî hilgirim. Xwezî karibim bi dizî birevim bêyî ku kes zanibe yan jî xwe têxim pala zinarekî li gorî dilê xwe bigirîm, êşa dilê xwe derxînim û bi rondikên çavan bimalim.

Cara yekem bû ji ber ku dijîyam poşmam dibûm. Bi qasî wê jî di bin hestên deyndarîyê da bêhal, bêçare min xwe didît. Dumanê cixareya pêçayî, min dixwest li tevahî organên xwe belav bikim, min dikişand. Ji dûr ve heval Rojbîn bang kir û got: “Heval Welat!” Wê got: “Were, em bi hev ra wêne bigirin.” Bi awayekî bê dil û westiyayî rabûm ber bi wê da meşîyam. Makîna da destê hevala Sakîne û got tu ji destê min xelas nebî. Bangî hevala Bêrîvan jî kir û got: “Em dê bi hev ra wêneyekî bigirin.” Min got: “Na.” Lê ez guhdar nekirim û bi

zorê destê min girt û birim. Hêdî ji wê zêdetir min nedikarî dilê wê bişkînim.

Di jîyana xwe da cara yekem bû ku bi hevalek jin ra wêne digrim. Ji bo min yek ji yên pêşîn bû. Rengê min çûbû, zer bibûm. Derbasî pêş kamîrê bûn, di kêlîya ku wêne were girtin da got: “Hey qurnaz hey! Qaşo bi me ra dikişînê, lê tu li alîyekî sekinî ye! Tu dîsa dixwazê bi erzanî ji nav derkevî. Ez qet li ser wê dimînim.” Lê ez bi bêdengîyekê li alîyekî mam û wisa kişandina wêne razî bibûm, lê belê mûdaxeleya wê ez matmayî kirim. Hele binêre li vî! Ji min ra got ka were di nav da bisekine. Divê tu di nîvekê da bisekinî. Ez  kişandim nav û digot tu feodal î tu.  Min jî got vê carê ketim destê we, lê wê carek din çênebe û derbasî nav wan bûm. Piştî ku wêne girtin dîsa bi hev ra ji alîyên cuda û dîmenên cuda wêne hatin kişandin.

Ji gel me çû binêre ka teqemenî hatiye amadekirin yan na. Teqemenî kir destê xwe, lê mêze dike, kontrol dike, danî erdê û wê çawa biteqîne fêr dibû.  Piştî demek kurt hêdî her tişt amade bibû, dema çûnê hatibû.

Hêvîkirina bi êş û kelecan, ew roj ya ku min nedixwest biqede bi lez û bez bidawî bibû. Yên dibin û yên wê bibin hebûn û min bawer nedikir û nedixwest bawer bikim. Ew hat gel min û got:

“Dizanim tu xemgîn dibî yan jî êşê dikşînî, dibe ku tu naxwazî ez herim. Em bi hev ra tevlê bûn û a niha tu min oxir dikî, ez bama jî min dê heman hestê bijîyam. Dibe ku dilê te bi min dişewite. Lê dixwazim tu vî tiştî bizanibî ku ji bo min ev çalakî ne mirin e, ji nû ve jîyankirin e. Bi heval Zîlanê bifikire. Bi heval Bêrîtanê bifikire. Dixwazim bibim wek wan. Bûna milîtanekî Serok APO bi rûmetî jîyankirin û mirin, tiştê herî bedew e. Qet xemgîn nebe, hîna gelek roj hene em dê parve bikin. Ger ez nebim jî wekî du kesên ku di rêyekê da ne bi hev ra ne em. Her rojekê bi fîzîkî em dê ji hev veqetin. Lê ramana ku em diparêzin û ruhê me girtî me dike yek. Bi hêvîya vê rojê her jîyam. Ji bo min wekî mafekî ye, di heman demê da wekî deynekî ye, divê wekî peywirekê bicih bînim. Vî tiştî jî baş bizanibe ku, ez dê biser bixim. Bi Serokatî bawer be û di rêya ku wî xêz kirî da bimeşe. Jin dê xurt bibe, bi vê yekê bawer be û hewil bide fêm bike. Em hemû ji bo vê yekê dijîn û ji bo wê jî em dê bimrin. Li her derê êrîş hene. Ta kengî em dê ji berpirsyartîyê birevin! Ew êrîş encamên kêmahîyên me ne. Divê em xwe bidin bin bar, ji alîyekî ve bigirin. Ger erka min kirina vê çalakîye ye, ez dê vê bikim.”

Dema despêkê hat gel min, min dixwest jê ra bêjim neçe, neke û dev jê berde. Lê li hemberî sekn û dilsozîya wê, min cesareta

xwe wenda kir ku jê ra bêjim. Min ji xwe fedî kir û bûm heyrana wêrekîya wê. Heya doh jina ku min lewaz, kêm didît, a niha dike here çalakîyekê ku ez tu demê nikarim cesaret bi çalakîyeka wisa bikim. Serî bilind û ji xwe bawer û bi biryarek birûmetî. Ji min ra û ji rabirdûyê ra meydan dixwîne û şîret dikir. Dema ku ez wê nas dikim heta niha, her bi xwe bawer bû. Li hemberî şaşîyan disekine û tiştên difikire dixe pratîkê. Yeka enternasyonalîst bû û wê kesayeta xwe bê kêmahî temsîl dikir. Bi helwestên xwe yên xwedî fikir û têgihiştî dihêşt ku were hezkirin, were guhdarkirin û ew jî ji wê ra dibû derfeta pêşketinê.

Min jî ew bersivand û jê ra got: "Heval hêdî di jîyana xwe da ez dê werim guhertin. Tu tiştek wekî berê namîne." Min jê ra got: "Ez dê xwe ji nêzîkatîyên şaş û kêm yên li hemberî jinê rizgar bikim û ez soza wê didim te." Birastî jî hestên ku ez dijîyam di hûndirê xwe da û kêmahîyên ku min jîyan dikir li hemberî wê rewşê, ez ber bi guhartinên bingehîn ve dibirim.

Dîsa wê got ku: "Tenê tiştekî ku ez dê wenda bikim heye. Ew jî qutbûna ji hevalên min e, yê din vê jîyana xweşîk e. Lê ji bo min yekbûnîya herî bilind wê ji vir û wê da dest pê bike." Dikenîya, dilîst dixwest moralê bide hevalan. Di dilê herkesî da êşek giran hebû. Berîya ku Rojbîn biçe, em tev ketibûn

îçtîmayê. Em di rêzekê da bûn, ji bo xatir xwestinê, em li benda wê bûn.

Li ser cilên leşkerî, zerkemberek girêdabû. Bi hevalên jin ra cara dawî di xatirxwestinê da, ew hemû hemêz dikir. Berdida carek din hemêz dikir. Bi kenê di rûyê wê da, bi ronîya di çavên wê da, daxwazîya bêsînor û nefreta li dijî dijmin bi hev ra dihat dîtin. Di dema xatirxwestinê da çavên hevalan tijî rondik bibûn, di nav niqilîskê da çavên xwe dimalandin. Nêrîna li wê hêdî ewqasî zehmet bû ku nema dihat tehemûlkirin. Di dema em di êşa oxirkirina ebedî ya hevala xwe da digevizîn, ew bi bi dozê ra, bi girêdana xwe ya bêdawî, wekî qet ji me qut nabe, bi coş û xiroş bû.

Wê kêlîkê çîya ker bûn. Çûkan li ser zinaran sitranên şînê dixwendin. Golê bi pêlên hêdî, li peravê dida. Li çîyayên bûzê kîyamet rabibû, perçeyên qeşayê ji zinaran diketin. Deng bi newalê diket. Çîyayê Cîlo yê bilind secde dikir. Bahozan alî diguherand û xeber didan Geverê. Li asîman refên qulingan rêz digirtin. Destdayîna dawî, oxirkirina dawî bi tilîlîlîyan dixemilî, hemû çepik ji bo wê bûn.

Wê digot: Em dê hev û du bibînin, em dê hev û du bibînin, wisa gotina xwe her dubare dikir. Ji kûrahîya xwe keserek

kişand, ji hemû hevalan ra destê xwe li ba kir û ket şiverê û meşîya çû.
Tevahî keviran rê nîşan dida, kulîlkan situ xwar kir. Di takê xwe da dihejîyan.
Rojbînê dema ku dimeşîya, ji nişkê ve li paş xwe zivirî û dest liba kir. Wê demê ez di nîvê dilê xwe da birîndar bûm. Heya wê demê min bi zehmetî xwe digirt, lê rondikên wekî lehî ji çavên min herikîn, êdî min nedikarî pêşî lê bigrim. Di nav girînîyê da taqeta li ser pîyan bimînim nemabû. Min xwe berda ser zinarekî û bi destên xwe çavên xwe girtin. Min porê xwe tevlîhev kir. Min dît refek ji kevokan li kendalên hemberê me ne nîşt. Bazek li ser wan digerîya, kerî ji nişka ve daket, ji nûva firîya. Kevokek spî ji kerîyî qetîya, baskên xwe li hev da û ber bi rojhilat ve firîya. Roja ku diçû ava, tîrêjên wê, li ser baskên kevokê dibiriqîn. Di dawîyê da, di valahîya bêdawî da, kevok wenda bû. Bi çavên şilokî li pey yê diçû dinêrim, wisa jî mam sekinî.
Mijê çar alîyên me pêça bû. Hêdî min nedidît. Ji alîyekî ve wekî yekî biyanî dûr gelekî dûr qet min nas nedikir, ji alîyekî din ve jî hevaleka ji hevalên di jîyana min da ku herî zêde min jê hezdikir bû. Ji wan hevalan kî qut bûba, heman êş û hestan

dijî. Wekî organên di canê min da ku kîjan biêşe heman hîsê çêdike.
Hêdî dema vegera cihê xwe hatibû. Diviyabû em biçin. Dema min dît ku heval bi kelegirî û xemgînî hatin ba min, min çavên xwe malandin, daku nizanibin ez jî digirîm. Hevalên din jî heman tiştî fikirî bûn. Belkû ew ji min bêhtir ji vê rewşê bibandor bibûn, zehmetî dikişandin. Ji bo ku têra xwe bigirîn, dilê xwe rihet bikin, bi awayekî navber, di rêyên cuda ra, derbasî nuqteyê dibûn. Her difikirîm xwezî şûnda vegere û wê çalakîyê neke. Di destê min da tenê bendewarîya roja çalakîyê mabû. Li nêzî nuqteyê, me dest û rûyên xwe şûştin û me hev û du hişyar kir ku kesek li ser mijarê neaxife. Di vê hêlê da divê her kes baldar be. Dema em gihan nava hevalan, bi cihanîna rola ku her tişt normal e û jîyan di xwezaya xwe da diherike, gelekî zehmet bû. Me ne dikarîya êşa di dilê xwe da, wekî kenînên li ser rûyê xwe nîşan bidin.
Nûçeyên BBC yên êvarê, her tim dişopînim, qet bernadim. Ka agahîyek, nûçeyek heye an na. Di wê navberê da, ji ber zextên Tirkîyeyê, dewleta Sûrîyeyê gelekî zehmetî dikişand. Ji bo esaretkirina Serok APO, hewildanên xwe zêde dikirin. Hêdî di manşêtan da digotin: Li ber derîyê şer in. Li beramberî wê li ser partîya me ku bi çalakîyan bersîv dida, gelek zext hebûn.

Ne tenê ji hêla Tirkîyeyê ve, ji hêla gelek dewletên dîtir ve jî wekî plangerîyekê, bi hev ra dimeşandin. Li hemberî Tirkîyeyê ku leşkerên xwe anîne ser sînor û bi awayekî psîkolojîk bi dewletên dîtir ra nêzaktîyên tehdîdkar dikirin.

Em ketibûn têkoşîna berxwedanîya tevahî. Ji ber çalakîyên berfereh, di şêwayê çalakîyên me da hêdî xetimînek hebû, me nedikarî wê xetimînê derbas bikin. Li hemberî wê jêneger bû ku şêweyekî nû yê şer derkeve holê. Yek ji xwedîyê wê şêweyê nû, me oxir kiribû. Di şevan da dema dihat bîra min, xewa min nedihat, min nedikarî razêm.

Di sibeha rojekê da, dema li ser naylonên me baran barî, em ji xew rabûm. Darên şewatê nedihat dîtin, gevenên ku berê me dişewitandin şil bibûn, nema vêdiketin û dûman derdixist. Wekî çareya dawî min betanî li xwe pêça. Jîyan wekî ku rawestîya bû, her tişt hatibû xeniqandin. Ji destê min bihata, min dixwest ji vir dûr bikevim û carek din venegerim. Her tiştî bêhna min teng dikir. Ber bi nîvrojê hewa vebû, baran hêdî sekinî bû. Kefxweşîya ewran hîna jî hebû. Di cihazên me da deng zelal nedihat, parazît hebû, ji ber vê jî hevalê Kendal, ji kendalan ber bi lûtkeyê ve diçû. Gihabû cihê ku karibe bi rihetî girêdanê çêbike û deng zelal bibû. Lê deng ji hêla me ve nedihat bihîstin ku ewqasî dûrketibû. Girêdan qedîya bû.

Hevalê Kendal ber bi me ve dihat û rengê wî vebibû. Kenê li ser rûyê wî û vebiriqîna di çavên wî da, nîşaneyên ku nûçeyên baş hene bû. Gazî min kir û got ku: “Heval Rojbîn dizîvire, bi qasî katjimêrekê wê li gel me be.”
Min, wê demê bê îradeya xwe, bi qêrînekê kêfxweşîya xwe nîşan da. Min çeka xwe avêt milê xwe û bi hevalê Kendal ra çûm pêşwazîya wê. Wekî her bendewarê vê kêlîyê, hestek wisa di hûndirê me da çêbû. Wekî ku bendewarîya hevalekî me, min wendakirîye, lê gerîyame, lê min nedîti bû.
Jixwe sê roj di navberê ra derbas bibûn. Xwestek, dilvînîya kêlîyekê zûtir dîtina wê, ez bêsebir kiribûm. Rixmî her tiştî carek din em dê hev û du bibînin. Û carek din li ser vê bingehê, ji hev neqetin. Heskirin, kêfxweşî dilê min tijî kiribû û dida rûyê min. Em hinekî din pêş ve biçin, hindik mabû ku em bighînin dartenga Karwanê.
Rast e, em dimeşîyan, lê em bi rê nedihesîyan. Ji nişka ve di fitlonekê da, em rastî hev hatin. Nefesa min teng bû, min fedî nekiriba, ez dê bezîbama, ew hemêz bikira û bigota: Xwîşka min tu bixêr hatî. Lê min xwe girt û bi merhebayek germ pêva tiştek nebû. Westîyabû, bêteqet bû û wisa giran dimeşîya.
Dema giha gel me, me merheba kir. Di her helwestên wê da bê moralî diyar dibû. Ji axaftinê, şirovekirinê jî direvîya. Bi destên

xwe rûyê xwe digirt û porê xwe tevlêhev dikir. Li ser rûyê wê bixwaze nexwaze hewayê şermbûnîyê dîyar dibû. Çavên wê tijî bibûn, ji bo negirî xwe bi zehmetî digirt. Lêva xwe gez dikir. Çi dibe bila bibe, ez dê vê çalakîyê bikim. Kesek nikare min jê vegerîne. Hem ji xwe hem jî ji milîsê ku divîyaba ew bibira, lê nebir dixeyîdî. Di destê wê da çenteyê wê yê reş î sivik, avêtibû ser milê xwe, serê wê li ber wê, ji psîkolojîya tewanbarîyê xelas nedibû. Berpirsê her tiştî xwe didît, lewma jî bê moral dima, vê bêmoralîyê, ew gelekî diwestand. Di çavên wê da dinya wekî perdeyek reş bû, ji bo wê her kêlîyek, her nefesek jîyanê wekî êşkence bû. Bi temamî xwe kiribû bin bandora çalakîyê, nedikarî tiştekî din ji wê pê ve bifikire.

Ji ber rewşa wê, em jî xemgîn dibûn. Me dixwest ji bo ku moralê bi wê din, ji wê rewşê xelas bikin, me her tişt dikir. Tiştên me digotin guhdar nedikir. Kêlîyekî zûtir dixwest vegere û çalakîya xwe bike. Di encama nîqaşên têkîldarî rewşê, bi heval Bager ra ku wî ew biribû, çûn mala milîs û ew çend caran ji bo rewşê fêm bike hatiye şandin. Ji bo cihê çalakîyê lê belê ji ber lêgerînên zêde li ser nuqteyên kontrolê hat dîtin ku zehmet e. Lewma jî hat sekinandin. Dema hevalan jê ra rewş got, ku divê bimîne heta wextek guncaw, qebul nekir û bombeya xwe derxist û got ez venagerim. Ji bo çalakîyê bike, li ber xwe dida.

Heval neçar man û gotin: Ka rojekê bimîne heta carek din em milîs bişînin û rewşê keşif bikin. Wisa soz dan ku hinekî sakîn bibû. Lê encamên keşfê heman wekî berê derket, divîyaba çendekê bimîne. Li ser wê esasê hat axaftin û îqnakirin ku wê carek din bişînin çalakîyê. Wê demê qebul kir ku bi me ra vegere.

Wê dîsa vegere, her tişt bi dawî nebûye. Kêfxweşîya me ya ji ber vegera wê, bi bêmoralîyê wê ra dişkîya. Hêdî me nedizanî ka em bikenin an bigirîn. Di navberê da mabûn. Piştî wê bi rojekê ji ber operasyonên dijmin ku nêzî cihê me dibûn, em vekişîyan gundê Zoma Cafer Mate. Ji bo ku em bi wan ra nekevin şerekî. Ji ber lezbûnê, me nikaribû agahî bidest bixin ku ka kî wê li ku bi cih bibe. Lewma bi rê ve heya cihekî em bi hev ra meşîyan. Bi bawerîya ku em dê carek din hev û du bibînin, me xatir ji hev nexwest û ji hev veqetîn. Her çawa be dê operasyon çend rojan dom bike û di rojên operasyonê da jixwe  naçe çalakîyê. Dema em dadiketin Mateyê, ew jî li lûtkeyên Cîlo dikirin xwe ber bi Mateyê ve berdin. Lê kar wekî ku me plankirî û fikiriyabû nemeşîya. Leşkerên ku derketibûn operasyonê, wê şevê bi şûn da vekişîyabûn. Dema hevalan ew tişt nas kirin, heya sibehê dimînin û hevala Rojbîn berî ku tarîbûn çêbibe dişînin çalakîyê. Hêdî nema dikarin li hemberî

daxwazên wê rawestin. Hinek kar bi lezgînî hatibû kirin. Lê ez di nava hêvîya ku wê vegerê û em hev û du bibînin da mabûm. Hevalên ku dihatin, min li wan dinêrî û pirsa wê dikir. Lê sê roj çêbibûn ku ew çûbû. Koma heval Kendal çima nehatiye? Qey dîsa li benda hevalên ku dê biçin çalakîyê mabûn? Belê wê biçe, kesek nikare wê rawestîne. Ger bixwazim nexwazim min dê erê bikira. Piştra wê di jîyana min da wekî bîranînekê, wekî deynekî ku nikarim bidim bima. Bi êşa wê jîyan bikira. Wê bi biryardarîya mezin ew çalakî dixwest. Jîyan ku ji bo herkesî pîroz bû, li ba wê bê wate bû. Li derveyî jîyanê li tiştekî din digerîya. Wê di xwe da hêza xwedewandeka ku ji xwelîya xwe jîyanek azad ava dike, ji ber jîyan ku xwe bi azadî tê da îfade neke nedigot jîyan. Yeka ku di hundirê xwe da wê cesaretê, kelecanê dijî hêza me nedikarî bide rawestandin.

Çavên min li ser karwanê hevalên ku ji derîyê Cîloyê ber bi jêr dihatin ma. Min kevirek da bin dûrbînê û ew rawestand. Bixwazî nexwazî, guman ketibû serê min. Ewa tê ew e? Belê ez difikirîm ku ew e. Min dema demdirêj dinêrîya, li ber çavên min reş dibû, nema dikarî bidîta. Hindek mabû, komê xwe gihandibû gel me, ez hîna di cihê xwe da mabûm, nedilivîyam. Komê yek bi yek nas dikim. Min ew nedît. Min digot dibe ku li paş ma ye, wê were gelekî mam li bendê. Bi qêrînekê min

dixwest bêjim naaa! Lê di hundirê min da ma û bi dizî girîyam. Li axa ku em ji hevqetîyabûn me ew wenda kiribû. Ketibû nav bayên Cîlo û pê ra çûbû. Lê ez bi awayek bêçare vegerîyam nuqteyê.

Dema çûm ba hevalê Kendal bi ken got: “Meraq neke me ew neşand çalakîyê. Derbasî hêla Çarçêla bû. Ji wir ew xwestin. Dixwest were vir lê bi lez divê biçûya û silavên wê ji te ra hebûn.” Bi rastî min dixwest bawer bikim û gotinên min dixwestin ew bûn. Lê gotinên berê hatibûn amadekirin ji bo min dilxweş bikin bûn. Hêvî dikirin ku ez ji wan gotinan bawer bikim. Min ew tişt dizanî lewra min jî wekî ku bawer kirîye tevgerîyam. Lê hundirê min hatibû daxkirin, xwîn digirîya. Min ji xwe ra got bila wisa be. Carna diket xewnên min, dibû kabûs. Xewên  min direvandin. Carna jî li ber çavên min zindî dibû, şîret didan. Cara yekem bû min hîs kir ku di derbarê jinê da   şaş nêz bûme. Min pêdivîya bibim hevalekî baş, xwe guherînê dixwest. Min soz da xwe.

Di nûçeyên BCC yên êvarê da girtina Serok APO li Îtalyayê wekî guleyekî ket dilê min. Her kes şoq bibû, di cihê xwe da mabû cemidî. Li hemberî dijmin gotinên bi nefret, daxwaza di dijmin da xwe teqandin, ji her demê zêdetir bilind bûbû. Hinekan destên wan di nav porê wan da, porê xwe hildikirin,

hinekan çavên xwe bi destê xwe girtibûn digirîyan, hinekan jî çavên xwe girtibûn bi pêhnan li keviran dixistin û lanet dikirin. Bêyî ku bê hîskirin dihatin gel hev, dibûn yek laş. Ruhê yekgirtinê, dilsozî û lîstina kartê dawî ku bibin bombe û di dijmin da teqandin, daxwaza me ya herî mezin bû.

Nûçeyan her dihatin. Ji Amedê Namik Durukan radigihand; nûçeya ku li Geverê di çalakîya fedayî da 4 leşker hatin kuştin û 7 jî birîndar bûne da bi tîlîlî û qêrînan hat pêşwazî kirin. Silogan bilind dibûn. Hevala Rojbîn peywîra xwe biserkeftî bicih anîbû. Berî herkesî tevgerîyabû, bêyî dem derbas bike pêk anîbû. Perspektîf û taktîkên demê di asoyê hatibû dîyarkirin. Bingeha ruhê fedayî bû. Bingeh dirûst hatibû danîn.

Em êşa herî mezin dijîyan. Li pêşîya rojên ku em nizanin dê çawa derbas bibin, wekî kabûsekî diman. Wekî ku dizanî em dê êşek wisa bijîn hîskiribû, ji bo wê yekê jî wê hevalê ewqasî îsrar dikir. Metirsîya teslîmkirina Rêbertî ji bo Tirkîyeyê ketibû pêş her tiştî. Herikîna gel li Romaya  deryayeka ku pêldayî, ber bahozê ketibû dida nîşandan. Amede bû ku her tiştî daqurtîne. Têkoşîna me ya rizgarîya netewî ketibû qonaxek nû, bibû destpêka pêvajoyek nû. Şêwazê têkoşînê, taktîka demê bi ruhê fedayî têkoşînkirin bû. Heval Rojbîn bibû yek ji wan pêşengan. Li gel vê yekê jî ji ber nasname û kesayeta wê ya enternasyonal

dida dîyarkirin ku ev têkoşîn ne tenê ya kurdan e, têkoşîna hemû gelên bindest yên cîhanê ye. Dibû pirek di têkilîya ereb û kurdan da. Ji her tiştî girîngtir jî bibû milîtanek û kesayeta têkoşîna fikir û îdeolojîya ku pê bawer kiribû. Bi kesayeta xwe ya fedayî bibû bersîv ji pêvajoyên herî zehmet ra. Ji dilbû û ewqasî ji jîyanê hez dikir ku di oxira wê da dikare bimire, bi sekna xwe ya dilsoz mînakek bû.
Wê digot: “Dixwazim bibim şervaneka jîr û jêhatî, ya ramana ku pê bawer dikim”. Di nav cilên sivîl da dilebitî. Li xwe dinêrî û li me dinêrî dibû hîkhîka wê. Digot: “Ev çi cil in!” Qundireya pehnî bilind dikir lingên xwe dimeşîya diceriband, mîna ku bikeve dibû. Digot: “Di nav van cilan da, xwe ecêb dibînim. Ji bo bighînim armancê çi were xwestin ez dê bikim.” Digot: “Ez dê wekî sivîl biçim, lê wekî leşkerekî bimrim.” Jina ku dibe leşker dilê wê dibe deryaya hezkirinê. Rêbertî her dem ew tişt pêk dianî. Ew îsbata gotina wî bû. ``ya şer dike bedew dibe, ya bedew dibe tête hezkirin``. Bi Rêbetî ra hevaltî, di yekbûna bi ruhê hevala Rojbîn ra, di yekbûna bi cewherê jin ra derbas dibe. Jîyan bixwe jî kêlîyek e. Jîyana kêlîyê meşa di rêya ku heval Rojbîn nîşandayî ra ye.

## Afirînerê Mirovatî, Şaristanî, Jîyan û Xwezayê

### Dayîka Xaka Pîroz

Li ser navê hevalên wê yên têkoşînê: Dîcle Andok

We gelek gel anîn, mezin kirin û xwedî kirin ji dîrokê ra kirin dîyarî. Hinekan kok berdan, hinek jî mirin, dîsa vegerîyan paşila te. Fikirîn ku ketine cihekî ne dîyar, lê belê xwe sipartibûn kokên dîrokê. Bi hesreta ku carek din ji dayîk bibe û ji nû ve şîn bibe. Te gelek keç, kur dan xwezaya bêser û bêbin. Lê belê hinekan temenê xwe temam nekirin, dîsa vegerîyan dayîka xwe, hinek jî ji ber tundî û hovîtîya serdestîyê vegerîyan kokên xwe. Lê ew bi tena serê xwe venegerîyan, wan xwe kirin tovê jîyana ku ji nû ve şîn dibe. Bûn hêvî, bûn hesret, bûn lêgerîn û bûn sembola azadîyê ku bê wê jîyan nameşe.

### Belê Dayîka Kevnar!

A niha navekî ji te dipirsim û li wî digerim; ji ber ku dixwazim wî bijîm. Tijîbûn bi dilpakîyên wî, bi eşqên wî û bi hêvîyên wî. Li şehîdekî digerim. Şehîd yên ku xwe ji bo azadîyê û jîyanê feda dikin û dibin navê jîyana nû. Rêgeza me ya bingehîn bi wan ra jîyankirin û her gav bi wan ra bûyîn e. Bi çend rêzikan be jî bi wan ra bûyîn tê çi wateyê? Nivîsandina wê bi wate ye.

Bi qasî fêm dikim û karim binivîsim dixwazim qêrînî hemû dilan bikim.

Min hertim dixwest hevala Rojbîn û şehîdên me binivîsim. Lê min di xwe da ew hêz nedidît an jî nikarî cesaret bikira. Min hîs dikir ku li hemberî mezinbûyîna wan, wateya wan ya bilind, rastîya wan ya xurt, ez çi bêjim yan çi hevokê binivîsim her wê bê wate be. Pê hesîyam ku ew ramandina wisa ya fikirandina seranser e û ti kûrahîya wan tune ye. Di me da û di xwe da min dît ku; li hemberî mezînahîya wan ku her em kûr dikolin tê dîtin ku em nikarin bighînin mezinahîya wan. Lewma jî dikevin nav rewşa bêîfadebûyînê. Ji ber ku bi gelemperî em dişibihin hev, lê bawer dikim ku di dilê wan yê paqij da ew tişt jî tê wateyekê. Li gorî wan bûyîna ya herî bilind bi wateya ku tiştekî ku aîdî xwe nehêlin. Her ku ew ji xwe didin, tevlêdikin, didin helandin, jêdikin namînin weke Rojbîn, Berwar, Şehristan, Dîlan, Sema û Zîlan, bi qasî ku kesek nikare bêje ya min e, ji min ra ye, yên herkesî ne. Mejîyê di mirov da hilweşîya di rastîya wan ya pîroz da nîşaneyek çêbû, her wiha ew bûn hebûna me ya jîyanî, ya hebûneyî yê.

## Dayîka Pîroz!

Tu ji me çêtir dizanî, yên ku bi koman dan vê dîrokê hene. Jixwe ew nikarin bighînin paya mezinahîyê, ji ber şert û

mercên ew tê da hatine dinê ku wan bandor dike an jî ji herikîna xwezayî ya jîyanê, rastîyên cuda hene ku wan ber bi wê yekê ve dibe. Lêgerîn, redkirin, xeyal, hêvî, eşq, hezkirin, hêrs û ew jîyan bi xwe ya ku dixwazin kole bikin. Ew hemû bi xwe ra dihêle ku ji derveyî jîyanê, lê di naveroka wê da cih girtinê tîne. Lê belê çawa? Rastîyeka ku çi pê ra ye dikişîne, bi şertê ku bêyî wê nebe nabe. Yên ku dîrokê bi rê ve birine, bûne ronî di dilê xwe da bi milyonan hilgirtin e. Bi tenê tên xuyankirin lê piranîyê di xwe da hildigrin. Ji ber vê yekê em dibînin ku yên herî dûr ji hev dûr xuya dikin, bi qasî ku xuya dikin ne dûr in, lê dilsozîyên herî nêz û kûr hildigirin. Wisa ku pêxembertî di lûtkeya tenêtîyê da ye, lê bawerî, hêvîya ku wan belav kirî, wekî fenomenek civakî-dîrokî piştî sedsalan jî dijîn. Mirovên lewaz û bêhêz bi tenêtîya xwe, dibin wekî perçeyek bar li ser civak û serdema tê da dijîn, lê pêxember dibin hemû ku wê kêlîyê radikin.

Yên ku dizanin tevlî wê hêza tenêtîya mezin bibin, ji bo xwe yekane rê dibînin hene. Ew in ku di oxira doza ku jê ra dibêjin azadî da dikarin her cûre êşê, fedakarîyê ji xwe ra wekî mafê jîyanê hilbijêrin. Fenomenê ku em jê ra dibêjin fedakarî ji bo wan gihandina sira kêfxweşîyê ye. Ji ber ku wî karî bi kelecanek jîyanê ya mezin û bi redkirinê dikin. Ew xeleka herî

bedew ya zincîra dîyaletîkê ya dîrokê, nûnerên herî bi heybet yên dilsozîyê ne. Ew yên ku ji bo pêkanîna pêdivîyên azadîya heval û gelê xwe, hêza afirînerîyê nîşan didin in. Nemaze dema hest, ruh, manewîyat û eşqa wê hêz dide civakê, ew dibin hêza wateyê bi afirînerîyên xwe.

Ey dayîka pîroz! Ez ji keç û lawên te yên pîroz, li yekî digerim! Ew, zelalîya herî paqij, herî safî ya deryaya azadîyê bû. Di sedsala 20em da, bipiçûkkirinê, bi mêrokirinê civak dihatin xistin. Her kes ber bi bêdîyarîyê ve diçû, ew bû yeka ku guh da banga azadîyê. Bi hatina xwe ve, bi gavên destpêkê bûn gavên hebûnîyê, meşa wê ber bi azadîbûnê bû û bi fedayîtîyê jî giha pîrozîyê. Çalakîya wê bû navê pêwîstîya di şertê cih û war da divê were kirin e. Di mejî û dilan da bû asoya qêrînekê berxwedana li dijî tunekirin û tunebûnê. Ew  li hemberî êrîşa komploya navnetewî, li dijî koma desthilatdar ku dixwestin roja me tarî bikin bû îfadeya lezê. Ew bû yek ji milîtanên pîroz ya `karwanê şêst û şeş`an ku ji keça yazdeh salî ta jina şêst salî pêk dihat. Dayîka kevnar, Rojhilata Navîn, keça te, keçeka ereb bû.

Şehîd heval Rojbîn, di sala 1973ê da, li Beyrûtê hat dinyayê. Her çiqasî ku sedemên wê nizanibim jî, malbetê ewder berdan û hatibûn li axa Anatolyayê û jîyan dikirin. Di navika Rojhilata

Navîn da, çavên xwe li dinyayê vekir. Li Anatolyaya ku bi xwezaya xwe dewlemend, lê di hêla civakî da teng, zûha û mat da jîyan naskir. Hem şert û mercên madî yên baş ên malbata wê, hem jî ezperestîya pergala kapîtalîst a ku diket nava takekesî, ji bo wê bû bijarteyek. Her çiqasî vebijêrkeka hesan be jî, jîyanek zîndanî li ser hesanîyê bû. Lê belê bi wê ra bû bûyerek ku kesayetîya wê, nasnameya wê, jintîya wê, azadîya wê  ra rê li ber parastina wan vedike. Ji bo wê redkirina  wan hemûyan tenê bi vebijêrkeka têkoşîna zehmet, jîyana pîroz ya nû ra pêkan bû. Belê, wê vebijartina xwe ya zehmet kir, lê dîsa li alîyê xwedîbûna nasname, xwezayîya xwe girt. Di rastîya êxistinê ya bi sedêsalane ku pergala desthilatdar li ser civakên Rojhilata Navîn daye kirin, her çiqasî ku jin di binî da ma be jî lê di cewherê xwe da wekî sirekê ruhê azadî û wekhevî ya neolîtîkê veşartîye, jê hêz girt û ew vebijêrka xwe kir. Ji ber vê yekê, ya ku di wê da dijîya daxwaza, hewesa gavavêtina jîyana nû ku dîsa neolîtîka bi sosyalîzma zanistî ra derketîye holê bû. Çawa ku di neolîtîkê da xwedawendên jin di nav civaka tê da dijîyan û bi wan ra jîyana xwe didomandin û erkên xwedawendîyê dikirin, wê jî bi çalakîya pîroz ji cewherê xwe afirandin. Rêwîtîya wê meşa ji welatê pîroz yê hatiye lanetkirin ber bi Kevana Zêrîn ve bû.

Warê bûyîna hemû şaristanîya ye Kevana Zêrîn. Axa bi bereket timî xelatkirina azadî, jîyan û çand ji zarokên xwe ra qet jêvenegerî ye. Sîma wê ya herî bedew welatê Botan, Zagros e. Axa ku Rojbînan û şehîdên me yên din bi xwe tevlê kirinê azadî peyda kirin. Mem û Zînê jî te afirand. Bi vê zanabûnê heval Rojbîn li ser vê axê dikeve nava têkoşîna azadîyê, destpêkê li Botanê tevlî gerîla dibe. Ji bo wê salên destpêkê salên naskirina azadîyê, rastîya welat û germahîya şer bû. Yê li ser wê dihat xuyakirin germahî û kelecanîya naskirina nû bû. Di bin polîtîkayên bêkesayetîtî, bênasnametîtî û zextên giran yên rêjîmê daye meşandin, ji bo wê PKK û gerîlayên wê bêhnkişandina azad ya yekemîn, kelecanî, kêyfxweşî bû û ji vê jîyanê hez dikir. Tiştê ku ew bi jîyanê ra dikir yek reflêksa dewlemendîya Rojhilata Navîn bû. Ma ti zehmetî nedikişandin? Kêmasî, şaşîyên wê tunebûn? Helbet hebûn. Her çiqasî ji bo armancekê hatibû jî lê bi xwe ra bandorên ku jîyana pergalê li ser dabûn çêkirin jî anîbûn. Di konferansa yekem ya YAJKê ya eyaleta Zagrosê di meha Nîsana 1998 da, ji gotinên ku di wir da gotinê ra hîn zelaltir ti îfade tune ye. Wê wisa digot: “Min mêrantîya ku sîstema desthilatdarîya mêr di min da dayî çêkirin hîna nekuştîye, bi wê ra jîyankirinê tercih dikim, ji ber wê jî nikarim azadîyê bigrim. Bi dîtina wî li xwe dinêrim,

şêwaz û terzê ku di min da dayî çêkirin, di têklîyê da me. Ji ber wê jî bi hemzayendên xwe ra nikarim yekbûnîyê çêbikim. Rastîya ku min di xwe da dîtîye, di me hemûyan da, bi awayên cuda heye, lê di cewher da yek in. Ew taybetmendî di hemû dan û sitandin, axaftin, nêrîn û kenên me da xwe derdixe holê." Her ku ne wekî tiştên ku ji devê wê derketibin jî, di rexnedayîna xwe da ev tişt anîn ziman. Wê bi têgîna `mêr di me da` ji bo me hemûyan weke meseleya pirs û analîzê kete rojeva me. Dîtina vê yekê, ji bo jinê ji hemû şaneyên ku serdestîyê di nava wê da dane afirandin rizgar bibe, şîyarbûneka mezin bû. Wê ew şîyarbûn jîyand û meşa xwe wisa sepand. Di destpêkê da zarokatî, pakî, zindîbûyîna wê û bi vekirî îfadekirina tiştên dibîne rastî reaksîyona pîvanên feodaltîyê hat. Nedihişt ku ew rast were fêmkirin. Lê ji ber ku ew ne tenê bi xwe ra mijûl dibû, her tim bi jîyan, rêxistin û bi hevalên xwe ra mijûl dibû. Li cihê ku lê dima her tim dibû navenda baldarîyê, wê rê dida ku bibe hêza bandorkirinê li wir. Birastî jî bi terzê fikirên wê yên dewlemend, hawîrdora ku lê dima vediguharand cihekî konsantrasyonek herikbar, cesaret û bawerî dida derdora xwe ku xwe îfade bikin. Ji bo dûristîyê, dilbûnîyê wê xwe zêde nediwestand, ji ber ku ew di xwezaya xwe da wisa jidil bû. Roj bi rojê ew hîna têdigihişt, bi jinbûna

xwe ya xwezayî dijîya, di kesayeta xwe da cih nedida tiştên çêkirî, xwedî avadanek xwezayî bû. Xwe ne dispêrandin rihetbûna nixumandî ya ku feodalîzmê di ramanên civaka kurd û ereb da avakirî, rûmetîya ku jinê di xwe da bilind dikir, heya dawî bi xweyîbûnîya xwe dijîya. Her ku diket zanebûnîya ku hezkirin ked e, di xwe da cewherê jina kedkar ya neolîtîkê derdixist pêş. Dema diket ferqa mezinbûnîya keda ku divê bi giştî ji bo mirov û bi taybet ji bo jinê were dayîn li ser xwe kûr dixebitî. Ketibû ferqa keda ku Serokatîya me ji bo mirov û bi taybet ji bo jinê dide ji bo bedewbûnîya afirandina paşerojê. Ji bo bibe berhema pêkhatîya ked-hezkirin ya ku Rêbertîya me danîye, diket nav têkoşîna kedkarîyê.

Di nîvê 1995ê ta dawîya 1996ê, li qada Serokatîyê ma. Di çend perwerdeyên cuda yên Serokatîyê ra derbas bû. Ji ber ku keça axayekî bû, ji bo Rêbertî bû rasthatinek balkêş, lê dema di kesayeta wê da cewherekî kûr dît, hîn zêdetir girîngî da perwerdekirina wê. Wekî her hevaleka jin ku di wê perwerdeyê ra derbas bûye, di wir da bi awayekî berbiçav hêza ji nû ve afirandinê dît û jîya. Jîyana xwe bi jîyana gerîla û welat ve girêda. Li wir kok berdan erdê. Avadanîya wê ya paqij û zelal hişt ku bi armanca jinan bi giştî Rojhilata Navîn û bi taybet kurd ya azadîbûyînê  ra dilsozîyek ji dil bijî. Nêrîna `Bi

Serokatîyê ra hebûnî, bêyî wî jîyan, xîyanet ji xwe ra ye` bû rêgeza wê. Li beramberî komploya navnetewî, hêrsa xwe ya li dijî dijmin bi çalakîya xwe ya mezin nîşan da. Ger fedayîbûn bi armanca azadîyê afirandina jîyanê di xwe da ye, ji bo jîyana Rêbertî ku bi jîyana gel ra bûye yek vebijêrtina mirinê wekî gelekan hevala Rojbîn jî ket nav wan yên ku ji xwe ra fazîlet dibînin. Di 17ê çirîya paşîn 1998ê da, li Geverê, bi çalakîya fedayî, li dijî leşkerên tirk, gîha şehadetê.

Wê, pîrozahîya axa Kenan di kûrahîya Mezopotamyayê da veguherand jîyanê. Bû cihêtnameya (pusula) paşeroja me ku divê di her kêlîyê da bizanebûn em berpirsyartîyên xwe pêk bînin.

Belê dayîka kevnar! Me ew bi rewşeka herî baş şand hemêza te, lê em dizanin zîlên herî baş di hemêza te da derdikevin. Em soz didin te ku em dê her roj xwe ji wan zîlan biafirînin û ji bo ku em layiqî wan bin em dê têbikoşin.

## Hevaltîya Rast Ya Bi Roja Azadîyê Ra

Mizgîn Agirî, 2009

Berî her tiştî tevahî hevalên Şehîdên Şoreşê bi rêzdarî bibîr tînim.

Ji bo Şehîd Rojbîn Ereb (Fatma Özen) bi eslê xwe ji navçeya Îskenderonê ya girêdayî bajarê Hatayê ye. Navê wê berê di nav

Partîyê da Sewra bû. Sala 1993ê tevlî refên PKKê dibe û li qada Botanê dimîne. Peyra derbasî Qada Rêbertî dibe. Qasî me zanibû Rêber Apo navê wê kirîye Rojbîn. Li wê derê 2-3 sal di perwerdeyê da dimîne. Pêyra derbasî Zagrosê dibe. Çirîya paşîn 1998ê, bi dirûşmeya "Hûn Nikarin Roja Me Tarî Bikin" çalakîya fedayîtî li Geverê kiribû.

Min heval Şehîd Rojbîn dawîya sala 1997ê nas kir. Em hêza Gelîyê Zapê bûn. Em di nava operasyonê da paş ve kişîyan û hatin Avaşînê. Ji bo erkekî em bi çend hevalan ra çûn qada Herkîyê. Hevalên li wê derê jî ji operasyonê nû derketibûn. Cara yekem li wê derê min Şehîd Rojbîn dît. Dema min di nav hevalan da Şehîd Rojbîn dît, herî destpêkê tişta bala min kişand coş û kelecana wê bû. Min gotina "hevalên jin" cara yekem ji devê wê bihîst. Ji ber ku heta wê demê me tenê "hevalên bayan" bihîstibû. Şehîd Rojbîn dema wê gotina hevalên jin digot; gelek xwezayî û ji dil dianî ziman.

Piştî wê, duyem dîtina min, piştî operasyona Xakurkê ku em paş ve kişîyabûn Dola Xedarê bû. Operasyona li ser Xakurkê bi hevkarîya T.C. û pêşmergeyên PDK çêbûbû. Berî operasyonê hevalên ku ji alîyê fîzîkî ve zehmetî dikişandin, wekî yekîneyekî hatibûn rêxistinkirin û derbasî rojhilatê Kurdistanê, Hecî Umran bibûn. Şehîd Rojbîn jî wekî fermandarê wê

yekîneyê bû. Em di operasyonê da gelek westîyabûn û li ser me, şehadetên hevalan pir bandor kiribû. Dema paşvekişandinê em çûn cem wê yekîneyê ku Dola Xedarê dima. Şehîd Rojbîn û yekîneya wê, bi moralekî bilind em pêşwazî kirin. Li gorî derfetan hevalan cîyê xwe dan me. Xwarina xwe, bi me ra, parve kirin. Bi her awayî xizmeta hevalan kirin. Demsal di carekî da zivirîbû li ser zivistanê. Hem bi encama êrîşên dijmin, hem jî ji sedema berfê, aqubeta gelek hevalan nedihat zanîn. Di nav wê rewşa giran da, Şehîd Rojbîn û yekîneya wê, tiştên ji destê wan dihat kirin. Li bejahîyê tenê darên bîyê hebûn. Darên ter bûn, lê neçarî me ew dişewitandin. Anku mercên heyî gelek giran bûn. Şehîd Rojbîn, ji bo me, bi xwe ra yekîneya xwe jî xistibû nav tevgerê.

Piştî wê operasyonê Rêber Apoyî dest li rewşê werda. Em wekî hevalên jin, zivistana 1997-98ê li sînorê sîyasî yên başûr û rojhilatê Kurdistanê, di qada Dola Xedarê da bi cih bûn. Nêzî 30 heval şehîd ketibûn, an jî aqubeta wan nedihat zanîn. Di nav atmosferekî giran da em nêzî 200 hevalên jin, wekî du tabûr hatibûn rêxistinkirin. Bi perspektîfên Rêbertî, me xwe komî ser hev û du kir. Me ciyên taximan û ciyê dibistanê û ragihandinê çêkir.

Şehîd Rojbîn wekî fermandarîya yekîneyekî erkdar bû. Rêbertî ji her tiştê me agahdar bû. Heta du caran jî bi telefonê xîtabê hevalan kiribû. Li Zagrosê, piştî piratîkekî zehmet, kombûna ewqas hevalên jin, bi perspektîfên Rêbertî, hêzekî mezin derdixist holê. Min wê demê muhabereya cîhaza mezin mêze dikir û talîmatên Rêbertî ji bo hevalan werdigerand.

Şehîd Rojbîn wekî me got erka fermandarîya yekîneyekî dimeşand. Lê belê di dema tevgerkirinê da, di ciyê pêwîst da, her du tabûrên hevalên jin jî rêxistin dikir. Ji bo wê, erkên fermî zêdetir, beramberî tevahî hevalan, xwe berpirsîyar dîtin derbasdar bû. Jixwe dema rêvebirî çûbûn tevlî konferansa gîştî ya Zagrosê bibûn, Şehîd Rojbîn hemû hevalan ra eleqedar dibû. Wekî kesayet, sekna wê, tiştê ku derdiket pêş, coş û moralê wê a şoreşa Kurdistanê bû. Wekî jinekê ji netewa gelê ereb bû. Lê tevahî gel û jin, di dilê xwe da dihewand. Di wê wateyê da, girêdanekî bêdawî, bi xeta Rêber Apo ra dijîya. Di her zemînê rêxistinî û perwerdeyê da, xeta Rêber Apo û Şehîd Zîlan (Zeynep Kınacı) diparast. Di warê bîrdozîyê da gelek kûr bû. Derbarê piratîk an jî analîzên kesayetan da, tespîtên radîkal dikir û bêtirs û bêhesab rexne dikir. Zivistana 1997-98ê, Konferansa YAJKê ya Jinên Zagrosê ya yekemîn çêbû. 8ê adarê 1998ê çalakîya Şehîd Sema Yuce, li zindana bajarê tirkan

Çanakkaleyê çêbibû. Ew çalakî beramberî dengê lingên komploya navdewletî û kesayetên tesfîyekarên beramberî Serokatîya Partî hatibû lidarxistin. Serokatîya Partî bi telefonê li ser wê mijarê û tekoşîna azadîya jinê jî nirxandin kiribû. Serok Apo wiha digot: “Pêwîst e hûn wekî jin wate bidin çalakîya Sema Yuce. Nameya wê bixwînin. Di bîrdozîya Rizgarîya Jinê da kûr bibin. Jîyana civakî yekem car li quntara Toros û Zagrosan dest pê kirîye û lazime hûn jî wekî jin pêşengtîya civakê bi wê zanebûnê bikin’’. Ji wan nirxandinên Rêber Apo me gelek hêz girt.

Heval hemû bê hesab tevlî konferansê dibûn. Lê bi taybetî tevlîbûna Şehîd Rojbîn ji konferansê ra gelek giranbûha bû. Bala tevahî hevalan dikişand. Bi taybet jî li ser mijarên pîvanên birdozîya jinê. Mijarên jîyanî bigire heta şêweyê rêvebirî û rêbazên ku tê bikaranîn, şêweyê şer ji lêpirsînê derbas dikir, dinirxand. Ger di navbera rêvebirîyê da hevgirtinên bê pîvan hebe tu carî qebûl nedikir. Di pîvanên hevaltî û fermandarîyê da bi israr bû. Helbet carna ji alîyê hinekan da nedihat fêhmkirin lê belê Şehîd Rojbîn bi ramanên Rêber Apo dahurandinên gelek kûr dikir û wekî şervanekî heqîqetê tevdigerîya. Di wateyekî da wekî hêzekî birdozî bû. Cudahî

nedixist navbera hevalan. Pirsgirêkên her cûreyî tevahî hevalan ra karibû nîqaş bike.
Hevaltîya Şehîd Rojbîn jî ser esasê pîvanên azadîyê bû. Dayîn û sitandina wê hertim yê beramberî xwe, ji bo kişandina nava rastîyan bû. Bi hezkirinekî mezin nêzî hevalan dibû û her tim qezenckirina kesayetan esas digirt. Mînak: Hinek heval hebûn, di tevlîbûna jîyanê da zehmetî dikişandin. Şehîd Rojbîn ji bo guhertina wan hevalan bi israr eleqeder dibû. Bi saetan karibû wan hevalan guhdarî bike û nîqaş bike. Bê alî û bi edalet nêzî mirovan dibû. Yekî bixwesta Şehîd Rojbîn ra hevaltîyek rast bimeşanda, lazim bû şerê çînî û zayendî hildaba ber çavan. Ji ber ku têkoşîna rêgezên jîyanê dida. Di wî milî da gelek bawerî dida mirovan. Yanî hem tekoşîna hişmendîyê dikir, hem jî di her şertî da cem hevalê xwe bû. Mirov dixwest her tim bi wê ra hevaltî bike. Hezkirina Şehîd Rojbîn bi cinsê (zayend) xwe ra gelek zêde bû. Her tim digot: “Serokatîya Partîyê digot: `Ji cinsê we hevaleka lewaztîya wê hebe jî wê esas bigirin û biparêzin`! Tu carî pala xwe nedin desthilatdarîya zilaman’’. Şehîd Rojbîn jî ser wî esasî nêzî hevalên jin dibû.
Dema heval çûbûn konferansê, gîştî ez jî wek wergêr çûbûm tabûra wan. Serê salê bû. Ji bo moral bide hevalan taxim bi taxim zîyaret dikir û pêşbirkên peyv û têgînan çêdikir.

Armanca wan pêşbirkan jî hem coşekî çêbibe, hem jî hişê pratîkî pêş bikeve bû. Piştî pêşbirkan wê carê ji taximê derdiket mermî diavêt. Yanî ciyê ku Şehîd Rojbîn amade ba, misoger bû karekî ramanî û tevgerî çêbikira. Rêbazên wê zengîn bûn. Heyecana jîyanê bi coşekî zaroktî dijîya. Bê dudilî dijîya û dixwest heman tiştî bi hevalên xwe ra jî bijî.

Carekê di cîhazê mezin da ji bo Şehîd Rojbîn û du hevalên din, ferman hat dayîn ku biçin tabûrên hevalên xort û asta nîqaşên hevalên jin bi wan ra parve bikin. Şehîd Rojbîn destpêkê bê xwestek bû. Lê piştî ku qaneh bû bi du hevalên din ra çûn kampa hevalên xort. Piştî 4-5 rojên din zivirîn. Vêca bi heyecan tiştên ku jîyan kiribûn vedigot. Birastî jî biteredud çûbûn, lê belê di perwerdeyê da her ku nîqaş çêdibe hevalên xort jî radibin kesayeta xwe analîz dikin. Hinek heval dixwazin bi tena xwe bi hevalên jin ra galgalê bikin. Şehîd Rojbîn pir moral girtibû û çavdêrîyên xwe bi heyecan parve dikir.

Şehîd Rojbîn hest û heyecana xwe xwezayî dijîya. Kefîya xwe wekî erebên bedû girê dida. Dema kêfxweş bibûya hema tevî hevalên cem xwe dîlan digirt. Lê ger ji tiştekî aciz bibûya jî rûyê wê da dihat fêhmkirin. Piştî demekî kurt dihat û nîqaş dikir. Dîsa bi hevalên ji rojavayê Kurdistanê ra, carna bi zimanê erebî dipeyivî. Gelek kêfa hevalan dihat. Çi kar kiriba

gelek cidî dikir. Mînak: Dema ku hevalan damayê sînîyan dilîstin gelek bala xwe dida ser. Hem qezenckirin esas digirt hem jî hevaltî diparast. Yanî bi kelecan dilîst.
Di kesayeta Şehîd Rojbîn da nêzikatîyên demokratîk hebûn. Tu kar piçûk nedidît. Ji çêkirina çayekî bigire, heta xizmeta hevaltîyê, her awayî xwe tevlî dikir û nirx dida. Li Dola Xedarê me di rêvebirîyê da lîsteya erkdaran çêkiribû. Ya ku li gorî lîsteyê çû tenê Şehîd Rojbîn bû. Ber bi erkdarîya xwe da dihat û dest bi kar dikir. Sobe pêdixist, ji dîwaran av bihata wê avê diavêt, paqijîya cih dikir û hwd.
Li kampa Dola Xedarê jî Şehîd Rojbîn, Şehîd Berwar ra me bi hev ra carna hinek nîvîs dinivîsand. Hîn wê demê dahûrandina wan li ser bîrdozîya Serok Apo gelek kûr bû. Jixwe me dema nivîsek binîvîsanda, di destên her du hevalan da pirtûkên Serokatî hebû. Di nav jîyanê da jî ji xwe wisa bû. Ew têkilîyên her du fedayîyan di pratîkê da jî xwe dida der. Di heman hizir û ramanê da bûyîn heta biryara fedayîtî girtinê jî berdewam kir.
Şehîd Rojbîn carna hinek bîranînên xwe ya pêkenoka civakî jî parve dikir. Bîranînekî bi gotina Şehîd Rojbîn dixwazim bînim ser ziman. Wê ji me ra digot: “Li Îskenderonê carekî birayê min bi tîma futbolê ra gogê dilîst. Ez jî di nav temaşevanan da bûm. Ji nişka ve, di nav lîstikê da yekî ger (çelme) avêt lingê

birayê min û birayê min ket erdê. Min tehemûl nekir û bezîyam nav qada futbolê. Ketim pey wî xortê ku birayê min xistîye erdê. Xort dît ku ez ketim pey wî û têgihişt ku ez dê tiştekî bînim serê wî, ew bezîya û ez jî pey wî me. Lîstîkvan jî ketin pey me û peyra temaşevan jî daketin saheyê. Ew hemû pey min dibezin. Anku welwele çêbû. Min dixwest tola birayê xwe rakim. Heta demekê lîstika futbolê sabote bû.'' Şehîd Rojbîn dema ev bîranîn digot, heval hemû ew dîmen xeyal dikirin û dikenîyan.

Şehîd Rojbîn gîştî xweza, tevahîya lawiran hez dikir. Lê êdî ji damarê erebbûnê dihat yan tiştekî din nizanim, zêdetir hesp hez dikir. Bîranîneka wê, di derbarê hespan da hebû. Wê digot: ''Carekê ez li Îskenderonê di kolanekî da dimeşîyam. Ez li ber erebeyekî hespan derbas dibûm. Ez tam ber hespê derbasdibûm, çavê min ket çavê hespê. Me hev û du mêze kir. Di carekî da hesp, wekî xwepêşandanên sîrkan çogekî xwe işkand, serê xwe li ber min ve tewand. Ez gelek bandor bûm. Ji ber wekî rêzdarîya xwe îfade kir.''

Dema Şehîd Rojbîn qala wê bîranînê kir, ez gelek bandor bûm. Xuya bu ew hesp ji bo hêza manewî Şehîd Rojbîn hîs kiribû. Piştra min jî wekî bîranîn wêneyekî hespan lasqe kir û dîyarî Şehîd Rojbîn kir. Wê dema wêneyê hespê dît gelek hestyar bû.

Em 21ê adara 1998ê, ji kampa zivistanê derketin. Berf hinek cihan helîya bû, hinek cihan jî belekên berfê hebûn. Em bi heyecan û moralekî derketin piratîkê û ber bi Xakurkê, Şêhîdan ve dimeşîyan. Wê demê, carna Şehîd Dîlan (Ya ku li Osmanîye/Edene çalakîya fedayîtî kiribû) û ez dimeşîyan. Şehîd Dîlan herdem bêdeng û kamil bû. Li her derî bi sedan xalxalokên hêvîyan hebûn. Lingê me tevahîyan şil bibûn. Lê bi sohbetên hevaltî û bi vîn em dimeşîyan. Di meşê da carna bi Şehîd Rojbîn ra jî sohbetê me çêdibû. Me berê xwe dabû hevrazîyekî çîya. Mijar vebû, min jê pirs kir: "Kurdistan ji bo te tê çi wateyê?" Ji ber ku ew ereb bû, min ev pirs jê kir. Şehîd Rojbîn pişta xwe zivirand min û got: "Kurdistan welatê min e". Ji wê bersîvê ez gelek bandor bûm. Min dîsa pirs kir: "Tu çawa nêzî gelê xwe yê ereb dibî, çawa digirî dest?" Şehîd Rojbîn wiha got: "Yê ku gelê min yê ereb bi min da nas kirin û da hez kirin Rêbertî bû. Wî ez perwerde kirim". Ez ji wê bersîva Şehîd Rojbîn gelek bandor bûm.

Em destpêkê çûn milê qada Xakurkê. Demsal bihar bû. Her der hêdî şîn dibû. Avên berfê diherikîn dolikên piçûk. Heyecana piratîkê li ser tevahî hevalan hebû. Zivistanekî dijwar hatibû derbas kirin. Lê mirov dikare bêje Serokatî perwerdeya me meşandibû. Mîsyonekî gelek mezin dabû ser milê hevalên jin

yên Zagrosê. Şehîd Rojbîn fermandara taximekî bû. Li cihê xwe nedisekinî. Dixwest zuka biherike qada piratîkê. Tempoya wê pir xurt bû. Piştî demekî em derbasî Qada Şêhîdan bûn. Yekîneya ku Şehîd Rojbîn tê da bû, dê li Şemzînanê piratîk bikira. Heyecana piratîkê di hemû tevgera wê da dîyar bû. Carekî bi fermandarîya yekîneyê ve biçûyana keşfa qereqolekî tirkan. Hinek heval hîn xwarin nexwaribûn. Şehîd Rojbîn biheyecan çû ser kevirekî mezin rûnişt û li benda hevalan ma. Hingî ecele dikir hevalan nizanibûn wê xwarinê çawa bixwin. Anku ew keşîf ji bo wê wekî çalakîyekî bû. Di her karê xwe da wekî ku rewş awarte be dijîya.

Şehîd Berwar fermandara mangayê û cîgira Şehîd Rojbîn bû. Dayîn û sitandina wan bi hev ra gelek bi aheng bû û di warê hevaltîyê da mînak bû.

Şehîd Rojbîn di taxima xwe da hertim heval bi coş tevlî jîyanê dikir. Zanibû ku jîyaneka rast wê çalakîyeka rast bîne. Heval di mangeyên çadirên bi naylon da diman. Bayekî dijwar ya zozanan dihat. Di nav wan mercan da tiştê ku mirov li ser pîyan dihêle jî moralê hevaltîyê bû. Şehîd Rojbîn jî jîyan bi rengîn dikir. Ji milekî ve keşfa dijmin dikir, ji milê din ve jî erzak peyda dikir. Tevî van moral jî dida hevalan. Ew û Şehîd

Berwar bi yekgirtî kar dikirin. Hevaltîya wan bi rastî jî mînak bû.

Diviyabû Şehîd Rojbîn tevgerek çêkiriba. Carna digot: “Ka em kampanyaya cixareberdanê dest pê bikin.” Hinek heval di berdana cixareyê da serkeftî nedibûn û careka din cixare dikişandin, lê di encamê da ceribandinek dijîyan. Di taximê da, hêza rêxistinkirina Şehîd Rojbîn xuya bû. Wekî berê jî me qal kiribû, Şehîd Rojbîn, hevalên ku zehmetî dikişandin, bi Şehîd Berwar ra, di hevbeşîyê da, bi wan ra eleqeder dibû. Dema rewşa hevalan mêze dikir, pêwîstîya kîjan hevalan çi hebû di cih da fêhm dikir. Bi hatina wê ve li taximê misoger guhertunek çêdibû. Şehîd Rojbîn qasî ku li hember koletîya jinê têdikoşîya, ewqas jî li beramberî desthilatdarîya zilamê jî têdikoşîya. Felsefeya wê ya jîyanê, xeta azadîya Serok Apo bû. Di wan deman da jî tekoşîna cinsî gelek dijwar bû. Rêbazên gelek çors serwer bûn. Desthilatdarîya zilam di alîyê hinek hevalên xort da, di asta jor da bû. Şehîd Rojbîn milîtan û fermandareka bihêz bû. Ji ber wê jî dibû armanca rexneyan. Lê belê asta fêhmkirina Şehîd Rojbîn dihişt ku rastîyan ji hev derxe û têkoşîna xeta azadîyê dida û tu caran beramberî paşverûtîyan serê xwe neditewand. Her tim li ser hişmendîya azadîya jinê dihizirî.

Şehîd Rojbîn, beramberî rexneyan gelek dilnizm bû. Dema rexne dihat, bi awayekî dilnizm mêze dikir, anku refleksekî negatîf nîşan nedida. Lê belê di dema rexneyan da, şopa kevneşopîbûyînê bidîta û desthilatdarîya zilamtî hîs kiriba, gelek hêrs dibû û seknekî radîkal nîşan dida. Di van milan da, tirs yan jî xofekî nedijîya. Ji ber ku pîvanên wê her tim Rastîya Serokatî bû.

Ez wê biharê derbasî qada Herkî ya Zagrosê bûm. Êdî min û Şehîd Rojbîn me hev û du nedît. Lê belê me ji hev û du agahî digirt. Ber bi dawîya sala 1998ê, êdî li ser Rêber Apo komploya navdewletî ketibû merîyetê. Rêber Apo berî ku derbasî Ewropayê bibe, di civîneka hevalên rêvebirîya jinê ya eyaleta Zagrosê da, bi telefonê peyivî bû. Di gotinên xwe da qala komployê kiribû û gotibû: “Dibe ku ev cara dawî be ku em bi hev ra diaxivin.” Ew rewş li ser hevalan gelek bandor kir. Şehîd Rojbîn û Şehîd Berwar, ji bo êrîşên li ser Rêbertî bidin sekinandin, biryara çalakîya fedayîtîyê dabûn. Wê demê bi dirûşmeya “Hûn Nikarin Roja Me Tarî Bikin” çalakî hebûn. Di serî da li zindanên bakurê Kurdistanê û Tirkîyeyê, çalakîyên xweşewitandinê hebûn. Dema me derbasbûna Rêber Apo li Ewropayê bihîst, tirsekî mezin kete dilê me. Lê di milekî da jî me digot: “Ger Serokatî çû Ewropayê, misoger e ku dê

çareserîyekî ji pirsgirêka kurd ra bibîne.” Li çîya jî çalakîyên gerîlayan li ser vî bingehî çêdibûn. Yekîneya me jî di 27ê çirîya paşîn 1998î da li qada Herkîyê helîkopterekî artêşa tirk anîbû xwarê.

Şehîd Rojbîn û Şehîd Berwar, berî herkesî ew xeterîyên li ser Rêber Apo dîtibûn û biryara çalakîya fedayîtî dabûn. Li ser wî esasî raporên xwe yên dahûrandinê jî nivîsandibûn. Her du hevalên fedayî jî li kêleka Gola Çarçelayê hest û ramanên xwe, dilsozîya xwe ya xeta Serokatî ra di moralekî da anîbûn ziman. Bi hev ra stran jî gotibûn. Me peyra ew şirîta ku hatibû tomar kirin guhdar kir. Hîn dîmenên Şehîd Rojbîn li kêleka Gola Çarçelayê kişandine jî hene. Di wan dîmenan da jî tê dîtin ku çiqasî bi moral û bi biryar e.

Dema Şehîd Rojbîn ji bo çalakîya fedayîtî diçe navçeya Geverê ya Çolemêrgê, destpêkê çalakî ser nakeve. Paşê dizivire Çarçelayê. Li gorî hevalan qal dikir, ji bo çalakîya xwe ser bixe gelek bi israr bû. Jixwe cara duyem dema diçe çalekîyê, di nav konvoyekî leşkerên tirk da çalakîya fedayîtî dike. Ev çalakî gelek bibandor bû.

Dema tekmîla çalakîya Şehîd Rojbîn di cîhazê mezin da hate dayîn, em li qada Herkîyê bûn. Hevaleka jin -ku gelek ciwan bû- ya bi navê Bêrîvan Şemzînan bezîya hat û bi dengekî bilind

qîr da û got: “Hevaaal! Hevaleka bayan li Geverê çalakîyeka fedayîtî kirîye”. Dema me navê hevala jin wekî Şehîd Rojbîn bihîst, me hem moral hem jî êşekî hevaltî di dilê xwe da hîs kir. Jixwe me girêdana Şehîd Rojbîn ji Rêber Apo ra zanibû. Ji ber ku bêdudilî çûbû ser dijmin. Çalakîya Şehîd Rojbîn li ser dijmin gelek bandor kir. Di heman demê da di nav hevalan da jî bawerî û girêdaneka mezin çêkir.

Ew hevala ku agahîya çalakîya Şehîd Rojbîn ji me ra anî, ji piçûkatîya xwe ve tevlî Partîyê bibû û 5 sal bû di civînan da tu carî nepeyivî bû. Piştî ku çalakîya Şehîd Rojbîn bihîst wê got: “Êdî ez dê di tevahî civînan da bipeyivim. Ji ber ku hevalên bayan (jin) ji bo me xwe diteqînin.” Birastî jî pey wê çalakîyê ra, ew hevala jin, êdî di tevahî kombûnên fermî da dipeyivî.

Di heman demê da, Şehîd Berwar, li bajarê Wanê, Şehîd Binevş Amed jî li navçeya Lîce ya Amedê, çalakîyên fedayîtî kirin. Ew zincîrên çalakîyên fedayîyan dorpêça li der û dora Rêber Apo şikandinê armanc dikir. Di vê wateyê da gihiştin armanca xwe. Jixwe dema em ketin kampa zivistanê, Rêber Apo li Romayê bû û bi hevalên jin ra, li ser çalakîya Şehîd Rojbîn û Şehîd Berwar nirxandin kir. Di nirxandinan da got: “Ez çalakîyên bi wî rêbazî napejirînim. Ji bo min çalakîyên wisa nekin. Lê belê çalakîyên bi vî awayî di dîrokê da cihên

wan gelek giranbûha ye. Çawa ku jîyana civakê li quntarên Toros û Zagrosan pêk hatiye, çalakîya Şehîd Rojbîn û Şehîd Berwar jî wekî serkêşîya jinê, tê wateya avakirina jîyana civaka azad. Pêwîst e em wana wekî pîvana jîyana azad bigirin dest."
Di dengê Rêber Apo da, hem serbilindî hem jî êş hebû. Ew nirxandinên Rêber Apo li ser me gelek bandor kir. Nêzî du pelan nirxandin kiribû.

Piştî Şehîd Rojbîn çalakîya xwe kir, di serî da li Geverê, di gelek warên Kurdistanê da, navê wê li zarokan kirin. Di nav gerîla da gelek gerîlayan navê xwe kirin Rojbîn. Şehîd Rojbîn bû pirek, di navbera gelê kurd û gelê ereb da. Nakokîyên di navbera gelan da hatine avakirin li ser esasê heqîqetê ji holê rakir. Wê wekî jineka Rojhilata Navîn, bi xwîna xwe, bi ruhê xwe yê canbexş çalakî kir. Hevaltîya rast ya bi Rêber Apo ra nîşan da. Girêdana xwe ya xeta azadîya jinê, çalakîyeka wekî Zîlan, bi tîpên zêrîn, di dîrokê da nivîsand. Gotin û piratîk kir yek. Jixwe bi nivîskî hem ji Serok Apo ra, hem ji hevalên jin ra hem jî ji gelan ra nirxandinên dîrokî li duv xwe hişt.

Ew komploya li ser Rêber Apo hatibû çêkirin ku di serî da ji alîyê Amerîka, İngîltere û İsraîlê an ku gîştî 35 dewletan cihê xwe di nav da girtibûn; yek jî bi wê çalakîya Şehîd Rojbîn hat

vala derxistin. Ji bo biratîya gelan bû meşaleyek ku hertim ronahîyê dide.

Em jî wekî hevalên wê yên dozê, bi naskirina Şehîd Rojbîn gelek serbilind in. Bi wî wesîleyê hezkirin û baldarîya me bi gelên ereb ra gelek çêbû. Di haveyna PKKê da, çawa ku bi Hakî Karer û Kemal Pîr ra ruhê enternasyonal ava bûye, bi tevlîbûn û şehadeta Şehîd Rojbîn, ew ruh rayê xwe di nav tevahîya gelan da belav kir. Mirov li ser jîyan û têkoşîna Şehîd Rojbîn roman jî binivîse, filîm jî bikişîne kêm dimîne. Yê esas mirov Şehîd Rojbîn wekî fermandareka bêtirs, şoreşgereka wêrek, sînoran nas nake, hevala heqîqetê ya Rêber APO, jineka azadîxwaz, hezkirîya gelê xwe û tevahî gelan bibîne û di têkoşîna azadîyê da bide jîyankirin. Şehîd Rojbîn wekî navê xwe bû hevala ROJ ê.

Di kesayeta Şehîd Rojbîn da, hevalên wekî Şehîd Berwar Çelê, Şehîd Şaristan Cîzre, Şehîd Dîlan Wan (bi wê ra Dola Xedarê da mabûn) û dîsa Şehîd Binevş Amed bi rêzdarî bibîr tînim û girêdana xwe îfade dikim.

Nasnav: Sewra, Rojbîn

Nav û Paşnav: Fatma Ozen

Cih û Dîroka Jidayîkbûnê: Beyrût, Libnan, 1972

Asta Perwerdeyê: Zanîngeh terikandîye

Dîroka Tevlîbûna Têkoşînê: 1993, Botan

Dîrok û Cihê Şehadetê: 17ê çirîya paşîn 1998, Gever, Çalakîya fedayî.

1 SAVRA

2 Fatma Özen

3 Farho

4 Handiye

5 Harabi - Kayatepe köyü - Savur - Mardin - 1971

6 Nişanlı

7 Anadolu Ün. Kütahya İktisadi ve İdari Bilimler Fak. İşletme bölümünden ter

8 İşletmeci

9 Türkçe

10 Temmuz - 1993

11 -

12 İstanbul

13 IV. Bölge - Savaşçı

14 -

15 -

16 Kleş

17 Dumlupınar mah. 205 sk. No: 3/A İSKENDERUN

18

Durumuna ilişkin niteliğidir. Katılımı net ve dürüsttür. Siyasi gelişmeye açıktır. Zaman zaman öğrenci üslubunu gösteriyor. Yaşamda zorlanm fiziki olarakta iyidir.

Hareketli - pratik birliklerde yer alabilir.

1- Kod Adı: Sevra.
2- Adı Soyadı: Fatma Özen
3- Baba Adı: Perhan
4- Ana Adı: Hamide,
5- D. Yeri ve Tarihi: İskenderun – 1976
6- Medeni Hali: Nişanlı.
7- Öğrenim Durumu: Anadolu Üniversitesi, İşletme Fak. 4. sınıf terk.
8- Bildiği Yabancı Dilleri: Türkçe, Kürtçe
9- Meslek: Muhasebeci.
10- Partiye Katılış Tarihi: Temmuz – 93.
11- Görev Yaptığı Alanlar: Garisa.
12- En Son Geldiği Bölge: Garisa.
13- Şu Anda Bulunduğu Bölge ve Konumu: IV. Bölge – Savaşçı.
14- Aldığı Cezaları –
15- Aldığı Mükafatları: –
16- En İyi Kullandığı Silahlar: Kleş
17- Adresi: Dumlupınar Mah. 209. Sokak No: 3/A İskenderun
18-

Aralık 1994, Bozleştiri raporu istendi: Gerekçe: Bazı arkadaşlar arasın[da] bayan-erkek ilişkisi konusunda asılsız iddialarda bulunmak[tan]

BÖLGEDEN AYRILDI – Hastaneye Gitti






ŞEHİT ZEYNEP



















